# RAMANÊN DİLÊ MİN

**Berîvan Hergulê**
**(Tûrkan Aydın)**

**Weşanên Akademiya Zanistên Civakî ya A. Ocalan**

**Çap: Tebax 2004**
**Çapxana: Çapxaneya Ronahî**

# NAVAROK

Rojbûna Te Pîroz Be Serokê Min.........................
Jiyana Keskesora Me..........................................
Fêmkirina 15 Sibatê Fêmkirin Dîrokê Ye............
Tawanbar Kê Ye?..................................................
Jin Û Berdel.........................................................
Mifteya Çareseriyê…..........................................
Gunehê Wê Ewe Ku Li Rastiya Xwe Geriyabû.....
Berxwedaniya Çar Egîdan..................................
Keçê Delal.............................................................
Xeleka Rasteqîn Ya Adarê...................................
Kîmyasal Û Helepçeyên Nû Nayê Xwestin............
Hevaltiya Gerîla......................................................
Dîroka Haran Û Dayîka Ûveyş..............................
Em Tîrêjên Azadiyê Hembêz Bikin.......................
Hêvî Xweşiya Jiyanê Ye.........................................
Kulîlka Aştiyê, Sema............................................
Ji Bo Dayîkên Meyên Kurd Û Tirk.......................
Evina Jinê Heskirina Mirovati Yê Ye.................
Şehît Çavkaniya Tirêjên Rojê Ne.........................
Bi Nasnameya Azad Re Tevlibûn Û Xweyi Derketina Zimanê Xwe Ye.....................................
Akademiya Zanistên Civakî Hat Îlan Kirin.........
Sibata Reş Û Tarî..................................................

Şervanê Azadiyê...................................................
Werin Xwe Bi Ava Çavkaniya Gula Rengîn Bişon..
Pêşxistina Wêjeya Kurdî Pêwîste.......................
8 ê Adarê Bi Rengê Jinê Bi Xemilînin...................
Çemkên Namusê....................................................
Rola Ciwana Çi Ye?..............................................
Hestên Gerîla........................................................
Rasteqîn Dilê Ciwanan De Veşartiye..................
Komkujiya Halepçe.............................................
Rewşa Jinê Hîndîstanê.........................................
Em Tîrêjên Azadiyê Hembêz Bikin.....................
Keda Jinê...............................................................
Berxwedana Jinê...................................................
Stêrka Sibehê.........................................................
Civaka Demokratik-Ekolojîk................................
Tawanbar Li Kû Derê Ne?....................................
Di Hêviya Jiyanê De Di Dil...................................
Kêfxweşiya Zimanê Kurdî....................................
Zarok Çavkaniya Jiyanê Ne..................................
Xwedavenda Zîlan Sembola Berxwedaniye Yê.....
Keçe Serok Apo....................................................
Zilan Çavkaniya Tîrêjên Rojê Ye.......................
Bila Êdî Hevditin Were Çekirin..........................

## ROJBÛNA TE PÎROZ BE SEROKê MİN

**"Em hesreta çavê tenê û li benda tenê serokê min"**

Bi dilekî xemgîn û xoşewist ji dil û can te hembêz dikim û bi dilekî hemdem silavên xwe ez bi rê dikim. Di zivistana giran de, reşahiya di şevên tarîde hewar û qêrin laşên min parçe parçe dike. Ew roja 15 reşemiya reş û tarî dile min birîn dike. Dilê min mîna birîna zarokekê xwîn jê diherike. Xeyal û hestên min ên ku di dilên min de mane, ezê bînim zimên,di bin sîwana azadiya jinê ya ku te bexşandî de. Îro ev xeyal û ramanên min dîsa bi te re dijîn. Bi pênûsa xwe di nava rûpelên dîrokê re, bi te re dijîm. Hestên xwe çawa bînim zimên ez nizanim, ji kîjan alî ve dest bavêjim pênûsa xwe û li ser rûpelekî spî binivîsim hestên xwe. bi zelaliya hestên ji kaniya dilê min jê si-

lavên azadiyê diherike. Bi hêlma azadiya te, bi awayekî rast, tu sînorên qirêj nas nake û dibe kelem li ber kevneperstan. Ev êşa pênc hezar salên, dilê me tarî dike. Ew kaniya dilnimziya dilê te, mîna dilopekî av-dibe dermanê azadiyê di dilê me de.

Li benda wê rojê me ku te ji tariya 15'ê reşe-meiyê ya beztreş derbikevî. Tavekirina te gelekî zeh-met e. Ji ber ku birîna silê min jan dide. Ev zehmetî dilê min dişkikîne û nikarim te binîm zimên. Her dem daxwaza te ew bû ku tu pergaleke bû ava bikî û bi zanyarî û bi dilpakî jiyana pîroz biafirînî. Girêdan û hezkirina jiyana te mîna kulîlkan, bi rengê biharê bû.

Nirxandina te wekî daristaneke hêşîn û mîna xezaleke dil pak û kevokên azad dewlemend bû. Ew şaristaniya ku hatiyedizin, te ji nû ve derxist holê. Bi bextiyariyeke mezin rola jinê di dîrokê de veşart û li ser cewhera keda jinê rûniştin. Lê belê îro, te SEROKÊ min ew dîroka jinê ya ku hatiye dizîn bi nêzîkatêdayîna rasteqîn diyar kir.

Te bi çavkaniya rojê xemilandiye evîn. Tu her dem roniya çavê me yî û evîna dilê me yî. Em her tim bi te re ne, di dema xweşî, dijwariyênherî jandar de jî. Îro bi sed milyona mirov bi re ne. Bîst û çar sêtan be te re ne û jiyanê be te re parve dikin SEROKÊ  min! bi tola sed Salî emê kîn û nefretên qirêj, bi rengên te zelal û ronî bikin. Emê hewl bidin ku aştiya rengîn bi pêş bikeve.

Her çiqas îro tu ne bi me re yî, lê tu di dilê me de mîna keskesora bi regê azadiyê xemiliyî. Kûrbûna te di dilê me de dibe sedema bihezbûna me, em

dixwazin ku li ser rastiyan ber bi azadiyê ve bimeşin. Bi taybetî jî li ser dîroka jinê. Ji ber ku jin kulîlkên bihara sed sala 21'ê ne. Ew nêrînên te dibin hêza meşa jinê ya ber bi azadiyê ve. Ez jî evîndara tîrêjên wê rojê me. Roja ku min bi dilê xoşewîst, tu hembêz kirî û di gewriya min de asê dima hestên min û çavên min tijî dibûn û rondikên min dibarîn. Di ezmanan de tijî ewr dibin, mîna çavên min. Ji ber ku ez nikarim qebûl bikim ku rewa te ya di nava çar dîwaran de. Ew rewş dibe sedema ku êş û janê me kûr bibin. Tu sedema vejîna azadiya me yî. Te rengê me eşkere kir. We rengên xwezaya rasteqîn. Tu bûyî xeyaladilên keçên azadîxwaz.

4'ê avrala 1949'an rojbûna SEROK APO ye. Ew roj pîroz û vejînê şewqa dilê hemû mirovahiyê ye. Wê roja pîroz gul û kulîlkên rengîn di zinaran de dibişkivin. Mîna gula berberojan ji çavên me de mîna ronahî dibiriqe. Mizgîniya te li ser zimanê gelan belav bû. Ew şahiyê li ser rûyê kurdan bûbû evîna gerdûnê. Ew evîna dilê te bûbû çavkaniya jiyana dilan. Em bi hesreta çavên te ne û li benda te ne SEROKÊ min! ji vir heta Îmraliyê careke din silavên xwe dilgermî dişînin û hêvîdarin ku wekî berê em bi hev re bin, di nava gulên rengîn de.

Min bibexşîne Serokê min, ji ber ku hest û ramanên min têrê naki ku ez te vebêjim. Wekî te ji min re di got: "Tu dikarî bibî keçeke azad, hêviyên te hene û tu dikarî bi ser bekevî" li ser vê ramanê be dilsozî ezê bi te re bimeşim Serokê min.!

## JİYANA KESKESORA ME

Tirejên rojê di nava çilê zivistana sar û cemidî de xwe li ser berfa spî diveda. Bayê wê seqemê ku li me dipêça, çend ristên tîna germa agirê sobê ku me li derdora wê, xwe kiribû xeleke. Em heft heval bû ku mîna heft tîrêjê hîna ji paxilê rojê venebibûn, mîna heft dil bi dilekî bûn, li ser axa çiyayên bi rûmet dijiyan. Bi pîrozbahiya axê re me jî ew pîroz dikir, ne tenê bedewbûna beden, lê ya dil û mêjî bû. Lorîn û nalîna keçên berê me dabû rûmeta azadiyê, di nava wê xeleka xwe de û bibû mîna nêrgizeke ku bîn dabû gelan. Xweşikbûna Serok APO dengveda bû di rûye me de. Yê ku bû rêberê zanebûn û ronahiya me, bû kilîta deriyê azadiya mirovahiyê, çavên me ronahî kir, dilê me geş kir, ji bo derdan bûbû derman û bibû mamosteyê dîrokanas yê jiyanê.

Li derdora agirê, em pir kûr di ramana xwe de ji xwe çûbûn, germbûna dil û agirê me bûn cêwik. Her

hevalek ji me ji deverekî cuda bû. Ango, mîna keskesorê bi heft rengên xwe, em li gel hev bûn, ji bo armanca azadiyê. Bîstekekî din hevala Warşîn bi rûyekî geş li me nêrî û bî çend gotînên xwe hest û fikren xwe kire gotin lî ser ziman: "Hatin û dizîn xeml û rewşa jinê û di rêya vê afirandina jina azad de ku Kurdekî azad jî biafîrîne. Bi vî rengê pêşveçûna şaristaniyeke hemdem dide nîşandan." Pîştî ve axaftinê hevala Warşîn serê xwe bi ber xwe detewand. Bi axaftina hevala Warşîn re hevala Ronak jî li kêleka wê jî xwe çûbû, bîraninên wan, rojên li gel Serok APO derbas kiribûn… Hevala Sterk got; "Jibîrnekin, dîroka windayî bi motîfên sed salan hatiye neqişkirin, li ser asîmanan û axa Mezobotamya."

Hêdî hêdî melûliya rûye me dibû keneke sivik li ser lêvên me. Pêre pêre rûyê hevala Mîtan li ken wenda dibû lê got: "Hevalno, ev heşt heftene ku nehiştine malbat û parêzer wî bibînin, ev rewş li tu dîrok û welatê nehatiye dîtin." Çavên hevala Mîtan tijî rondik bûn, nema dikaribû bipeyive. Hevala Berfîn ku rûye wê mîna berfa spî ye, sere xwe rakir jorê û got: "Serok dixwaze, koletiya ruhê sîstemê ronahî bike. Eger ronahî kir, wê rastiya qirêjbûna wan derkeve holê. Ji bo vê jî nahêlin hevdîtin were çêkirin."

Ji derve ve dengê çûkan weke melodiyeke xezîn dihate guhên mê û mîş mişa ava berfa diheliya zelal û geş, bêdengiya me diqelaşt. Ji nişkave hevala Xunav got: "Bêguman, bawerî û hêviya me bihêz e ji bo azadiya Serok, her çiqasî ku rewşa Tirkiyê tarî be jî." Heya dawiya axaftinên hevalan, hevala Ronak pir bi hest

xuya dikir. Û weke ku dixwest bîstikekî ji dîmenên vê kevalê bidawî bîne, got: "Qedexekirina hevdîtina ji milê Tirkiyê tê wateya ku dixwaze bingehê şer û tundiyê pêşbixîne, lê Tirkiyê wisa bike wê ya xwe bi destên xwe bavêje nava agir." Bi hejandina serê xwe, me jî piştgiriya xwe da nîşandan.

Hevpeyvîna me pir bihest bû, ji ber ku ev heft heval jî li gel Serok APO mane, ji rewşa ku heyî razî nebûn û bi hêviya carekedin, di nav bexça ronahiya wî de, di bin keskesoreke rengîn, nîşana biryardariya xwe nû kirin.

Ji bo jinên cihanê jî, pêwîstê ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd û azadbûna Serokatî destên hev bigirin û bimeşin.

**12-Adar-2003**

## FÊMKİRİNA 15 SİBATÊ FÊMKİRİN DÎROKÊ YE.

Em dikevin salvegera çaremîn salvegera qompilaya navnetîwî, qompiloya ku li hember serokatî hatî pêşxistin, ji bo fêmkirina wê bi giştî derketina şeklê wê dîsa pêwîste...dinav kurdan de dîroka qompiloyê de çavkaniya wê derdixe zanabûnê. Bi derketina vê rastiyê re di dîrokê de qompilyê yekemîn ku ji aliyê dewleta Sumer (rahîb) yên ku çavkamiya wê hatiye pêşxistin û di vê wateyê de qompilaya yekemîn li hemberî kurdan hatiye pêşxistin. Di van perestgehên hanede herî giring ya bi serkeftî sîstema mêtîngehe ye. Yê ku dozek li hemberî mirovatiyê qebolkirî ew bi xweye. Mîtolojiya rahîbên Sumeran daye avakirin dibe ku di serê mirovan wekî desmalekî de hatiye pêçandin qompiloyek bivî awaye. Di nava perestgehan de mirovan mîna aletekî hatiye şixulandin. Xuda, padîşah xwe mîna xuda li ser rûyê dinyayê mirovan bi

mirovan daye pejirandin. Mîna temsîciyekî bi gotinên xwe dane qabukirin û xwe di mejiyê mirovan de avakirine.

Di dîrokê de li ser mirovan de, pir zêde xeterî çêkirine û ji aliyê çînên li ser  wan hatine pêkanîn. Di perstgehên Sumeran de di bin navê xudan de li ser mirovan xwe kirin xudayên dûyemin. Xwekirin xuda û padîşhên jorê. Xwe wisa kirin kî tikes nikaribe destê xwe bidê wan. Xwe mîna îlahî dan naskirin. Li ser ramanên mirovan desthilatî dan avakirin. Di destpêkê de qompilyên çep û rast hate pêşxistin.

Qompiloya yekmîn  ku li hemberî kurdan hate kirin... Emkîdûyê ku rêberê gelê xwe û li hemberî Hovava yê ku qompiloyê dijwar pêşxist. Di encama qompiloyê de Hovava tê dîl girtin û Gilgamê di xwaze bixe îşbîrlikçeyê xwe. Encex yê ku buyî îşbîrkçyê kurdan Enkîduye. Ji bona kurdan pêvajoyek bi xwîn despêdike. Divê encamê de û di van xalan de dinava kurdan de zemînê îşbîrlîkçî û qompilogeriyê tê pêşxistin. Berambiriya dinyayê û mirovatiyê de û di gelbuyinê de di avakirina şaristaniyê de yekemin daye avakirin û bi dest xistiye. Rola kurdan di vî warî de, ji bo xwe  ji bo gelê di jî misyonekî girîng leyistine.

Di vî wateyê de derî ji jiyana civakî re  vekiriye. Mirov dikare bibêje, dinav civaka kurde pirsgirêkên xurt û veşartî hatiye pêşxistin. Tiştê me berê girtî yê ji bo pêşerojekî xurt gereke em bidin meşandin.

Gelê kurd herdem dinav qompiloyê de avakirina wê û pêşxistina wê re girê dayiye. Herdem gelê

kurd dinava rewşekê cuda de maye. Û li gorî wê rast nirxandin nekirine. Herdem dinav weqasî zorî û zehmetiyên jiyanê de derbasbûne. Lê pişxwe mirasek xurt û bi wate nehiştiye. Kurdên ku çînê desthilat yan qompilo û mêtingeh buyerekî di vî awayî pêşxistine. Kurdên bi vî rengî li hundirde li hemberî gelê xwe herwaha li hemberî hêzên derve di tikileyên xwede tên xapandin.

Rewşekî wisa derbas nekiriye... Herdem ji bo rastiya wê bite veşartin hertim dinava hewldanên mezindene... Sistemê serdest, ji ber ku qarekterê çînê desthilat, naskiriye, ji bona berjewendiyê xwe di Rojhilata Navinde hatiye şixulandin. Divê wateyê de kurdê dinava netêwandin de hiştiye ku zemînekî qompiloyê were vekirin. Ji bona vê gelê Kurd bedelê xwe giran daye. Di dawî de li ser gel û keseyata Serok APO dinava netewde qompilo hat sipartin.

Di dîroka mirovatiyê de qompiloya mîna 15 Sibatê hatiye çêkirin û qompiloyekî rêş û tarî nehatiye dîtin. Dema Serok APO teslîm radarî Kenya û Tirkiyê kirin, tevgera azadiya gelê kurd ku axwestin ji holê rakin, bi pêşxistina wê qompiloyê re, dîsanê sistema desthilatdar û kurdê netewperest cih giritine. Her çiqas qompilo hatibe pêşxistin jî lê serok APO li hemberî vê qompiloyê stratejiya demokratîk û aşitiyene rolekî girîng leyistiye. Dinav netewperestên kurdan de çemkên wan jî bêtesir û vala derxistiye. Serok APO di pêşxistina stratejiya nû de, ne tenê şoreşa azadiya gelê kurde de sinor nemaye. Ji bo tevayê mirovatiyê cewherê adelet û aşitiyê daye avakirin. Di şerê neras-

tiyê de herdem rastî xurttir bûye û dîsa şaşî herdem bê qowet maye. Û herçiqasî jî hêzên desthilatdar wê xurt bide nîşandan jî lê dîsa di cewherê xwede bê quwete. Hezbûna xwe bi qompiloya navnetewî re daye nîşandan.

Serok APO li pêşxistina stratejiya nû de qompiloyê vala derxisti bû. Serdema şaristaniya nû, serdema şaristaniya demokratîk di parêznamaya xwe de pir bi balkêşî daniye holê. Di halkirina pirsgiraka kurd de tewere (eksen) di dest girtiye. Divê watayade li li hemberî hebûna gelan û canda wî re rêzdayin û disa gelê din herwiha hevpar bi vî rengî nêzîkatiyên taybetmendiyên serdema yê herî serekene. Di çareserkirina pirsireka kurdan de. Di çerçeva hevparkirina gelen de yekitî, azadî esas girtin ji bo çarêserkirina gelan gereke. Bi curbûna raman de û bi kêyxweşiya pêxistin mirovatiyê de, bi hevre bûna gelan dewlemend bûna di çalekiyên xwe îfadekirin pêwîste. Ji bo bingehê pêşeroja welatparêziya meye... Dîsa esas girtina gelê rewşenbîrê demoqratîk û dîsa şoreşa demokratîk pêşxistina wê gereke. Ev jî tê wê wateyê gel hemû qompiloyên bi vî awayî vala derxistine.

Weke ku serok APO daye xulakirin **“ev qompiloya hatî pêşxistin ne tenê li ser min bû. Li ser gelê rojhilata Navîn jî hatibû pêkanin.”** Ev sedem tê wê wateyê ku helkirina qompiloya 15 sibatê gereke. Qomloya 15 sibatê têwê wateyê ku tariyêk cih û qompiloyên rojên ronahiyê derdixe holê. Bivê zanebûnê nêzikê vê rojê bibin...Kurd, Tirk hemû mirovan din yên di şaristaniya demokratîkte bigêhin hev.

## 10-Sibat-2002

## TAWANBAR KÊ YE?

Di Başur de ji bilî pirsgirêka aborî, pirsgirêkên çandî, civakî û sincî hîn bi zêdetir derdikeve pêş. Belam emperyalîzm, polîtîkayê xwe yê serdest û gemar li başur bi awayekî kitekit dide meşandin. Wan ji esil û koka wan dûr dixe. Jiyanekî bêkok û hevkarî dixwe para gelê Başur. Her wiha leystikên desthilatdaran li ser gelê başur gelek bi kûr û dîrokî ye. Yê ku mirov diêşîne ew e ku gelê başûr bi gelek awayan hatine vê leystikê û kurditiya xwe, dîsa esil û felsên xwe qurbana van polîtîkayên qirêj kirine. Ji Cewherê xwe dûr ketine, zarok û ciwan bi cewherê xwe yê esil mezin nebûne. Ji bo vê yekê jî berê xwe her tim dane mîratên kevnarê û bermayî ya desthilatdaran. Tiştên baş û pêşketî ji bo xwe layîq nedîtin û her tim paş pêvajo û heyaman mayîn di jiyana gelê başûr de bi awayekî berbiçav xuya ye. Ew, ji bona desthilatdaran wekî tiştekî ku li gorî dilê xwe bidin bi kar anîn in. Ev nêzîkatiyên serdestiyê û rê û rêbazên wan hiştiye ku Kurd hertim li paş pêşketinan bimînin. Her wiha zanebûna

gelê başur jî pir kêm e. Zanebûn, xwe nedayîna şixulandinê û naskirina xwe û koka xwe ye. Dîsa bûyîna xwediyê îradeyekî xurt e. Lê belê, rasteqîna jiyana gelê başur, hebûna jiyanekî çewtê van pîvanan dide diyar kirin. Lewra jî ev polîtîka û rewş hiştine ku başur her tim bibe çavkaniya girekor û pirsigirêkan.

Rastiya KDP û YNKê de mirov van rasteqînan pir bi hêsanî dikare bibîne. Ew ji bilî ku sûd û feydeyê gelê xwe bifikrin, zêdetir dibin amûra meşandina polîtîkayên serdestan a qirêj û gemar. Ji bo wan tiştê herî girîng, berjewendî û sûdên kesayetî ye. Helbet ev ne nêzîkatiyekî pêşengtî û berpirsiyartiye. Mirov nirx û rûmetên gelê xwe pêşkeşê desthilatdaran bike helbet ev nêzîkatî û hewildanekî îxanetî û hevkartiyekî qirêj e. Lewra ev nêzîkatî hem ji bo gel tu sûd û feydeyan nayne, hem jî ji bo gel nabe pirekî jiyana demokratîk û aramiyê. Her wiha ev nêzîkatî û polîtîkayên bin bondara desthilatdaran nahêle ku di civakê de guhertinek bingehîn were çêkirin. Her diçe pirsgirêkên hindur xurt dike. Buhran, qeyran û neçareseriyê kûrtir dike. Neçarserkirina van pirsgirêkan û nederbaskirina van nêzîkatiyên îxanetî dihêle ku di nav civakê de di her alî de jiyanekî trajîk were jiyandin. Têkiliyên civakî û malbatî bi van trajediyan ve her diçe ber bi tarîtî û lanetî ve diçe. Zilam, hîn bêhtir di nav taybetmendiyên ne însanî de xwe winda dike. Jin jî, ji ber ku tu merc û zirûfên jiyanê nabîne, mirinên trajîk ji bo xwe wekî çareseriyek dibîne. Her wiha her roj mirov gelek trajedî û bûyerên ku mirovan direcifîne, dibîse û dihise.

Ger pirsgirêka civakê nayê çareserkirin, wê civak bêhenase bimîne û xwe di nava van pirsgirêkan de bifetisîne. Ev fetisandin û bi bêdengiya xwe re bûyîna hevkara vê jiyana lanet wê di nava civakê de hîn zêdetir bûyer û hevkartiyên mêrkujbûyînê kûr bike. Civak û di nav têkiliyên malbatê de tirs, fetisandin û mêrkujî wê bibe xewna bi xof û kabûsan. Mejî û însanetî di rewşekî wiha de winda dibe. Lewra dema mirov li bûyerên ku qewimîne mêze dike, rastiya van gotinan hîn bi awayekî rasteqînî diyar dibe. Zilam ji aliyê serdestan ve tê perçixandin, jin bi giştî ji aliyê serdestan ve û di nav malê de jî bi taybetî ji aliyê zilam ve tê perçixandin, -ku perçixandina jinê bi awayî dibe du qat- zarok, pîr û kal jî bi giştî hem ji aliyê serdestan, ji aliyê, zilam û jina ku di bin perçixandina du qat de serûbin bûye ve tên perçixandin. Di her hêlî de ev jiyana ku tijê koletî û bindestiye helbet di nav civakê de aramî nahêle. Ger pêşeng jî, ji bona meşandina polîtîkayên serdestan hemû gel û welatê xwe bike qurban û pey jiyanekî dîperst be, rewşa wê gelê jî wê ne tu hal û rewş be.

Di jiyan û rewşekî wisa de viyan û nirxên mirovbûyînê ji holê rabûye. Di aliyêkî de zilam di bin pergala zilam de kole ye, di alîkî de jî jin hem ji aliyê pergala zilam a bêwicdan û lanet de kole ye, hem jî di aliyê zilamê kole ve koleyê koleyan e. Jiyana jinê her tim lêdan û îşkence ye. Ev lêdan, îşkence û di her hêlî kolebûn ji jinê re rêka jiyandinê nahêle û cîhan jê re teng dike. Jina ku di nava çar diwara mala xwe de girtî mayî jixwe ji tu reng û xweşiya cîhana nabîne, ev ne-

bes e di nava vê çar diwarê de jî îşkence û lêdan para wê dikeve. Ew qanûnên ehleqê, pîvan û kaîdeyên eşirtî, feodaltî dîsa ew jiyana ku di bin bandora jiyana serdestî ve di nav civakê de hatiye rûnişkandin ji bo civakê jehriya herî xeternak e. Qey ev pîvan û qanûn nînin ku dihêle zilam bibe kole, jin jî bibe koleyê koleyan? Qey ev pîvan û qanûn nînin ku zilam dixe nav şayîş û gûmanên rojene bi vî awayî wê bêîrade û hêz dihêle, her wiha jinê jî wekî neînsanekî dide nîşandan? Ev rastiyek e, ger mirovek serdest be û biperçixîne ew jî wekî mirovê ku tê perçixandin bêîrade û hêz e. Lewra ew jî, kole û dîlê hestên xwe yê serdest e.

Dîsa dema ku mirov bi awayekî adwerî binêre yê herî zêde di nava vê pergala zilam de ê ku bindestiya bêaman û pêkutiya herî zêde jiyan dikin jinin. Ne di nav civakê de, ne jî di nav malbata xwe de ji xwe re merc û zirûfên hênase girtin û jiyandinê nabîne. Rêka xwe bişewitandinê yan jî xwe daliqandinê de dibîne. Azadî û ji vê jiyana bi îşkence xilasbûnê her tim xewn û xeyala wê ya mezin e. Belam jinê başur dema ku Tevgera Jinê Azad (PJA) û tevgera demokratîkbûyînê nas dike her wiha şerê xwe yê bêçaretî werdigerîne çareseriyê. Di van tevgerên têkoşînî de hêvî û mabestên xwe dibîne. Dest ji jiyana xwe yê bêvebijark berdide. Çiya û şerê azadiyê ji bo xwe ji mirinê û ji îşkencê xilasbûn dibîne. Dema rêka çiya nabîne û nikare xwe bigihijîne vebijarka xwe rêka mirinê pêktîne. Belam jiyana wê ji mirinê xirabtir e. Rêka mirinê baştir dibîne û xwe an bi benzînê dişewitîne, an dida-

liqîne, an jî davêje nav tenûrê dişewitîne. Ev rêkên întîharên trajîk zêdetir di gelê rojhilatê de û başurê de tê jiyandin. Ji ber ku pîvanê feodalîzma paşverû li van herêman hakîm e. Jin, ji jinbûna xwe gelek dûr e. Jin dema hinek tişt ferq dike, dixwaze di rêka azadiyê de bimeşe. Bes zilam û jiyana xwe yê kevin li hember xwe asteng dibîne û rêka întîharê pêktîne. Cihe ku pîvanên paşverû pir be, li wir întîhar zêdetir in.

Cihê ku dinê îslamiyetê hakîm e jî, ev der e. Her wiha mirov dikare bibêje ku dîn jî ji bo serdestan û pêşengên feodal -ku ji bilî berjewendiyên xwe yê şexsî tu tişt nafikirin- tê bi kar anîn. Dîn jî ji wan bûye amûrê pêkanînên polîtîkayên qirêj. Jin di Îranê de hundirê çarşefên reş de hatine girtin. Namûs û şeref di nav qumaş û çarşefan de tê dîtin. Lewra nabînin ku namûs û şeref bi deh û sed salane bi kuştina taybetmendiyên însanî re hatiye bin pê kirin. Di bin navê dînê Îslam de hebûna jinê û hebûna jiyana rasteqîn hatiye tune kirin. Her tişt di destê zilama serdest de ye. Zarok wisa têne mezin kirin. Ev ne sucê jinê ye. Sucê zilama serdest e. Eger sîstema serdestî newe derbaskirin, wê bi xwe re ketina xwe û ê jinê bîne. Ev jî wî di civak de hîn bêhtir ketin û kûrbûna pirsgirêkan bîne. Rewş û hewldanên heyî pirsgirêka gel çareser nake. Ev pirsgirêk, netenê ê hinek şexsan e. Gerek ev pirsgirêk wekî pirsgirêkên aîdê xwe em bibînin û dest bavêjinê.

Di vê pêvajoya dawî de 80 jin întîhar kirin e. Cihê ku ewqas întîhar werin kirin, mirov nikare bibêje ku li wir Yekitiya Aşitiya Demokratîk heye. Sedemên

van întîharan zîhniyeta paşverû a hakim e. Ev zîhneyeta paşverû nahêle ku jin vegere cewherê xwe esil û hem ji bo xwe, hem jî ji bo civakê bibe çavkaniya çareseriyê û jiyanekî wekhev û demokratîk. Dûrketina jinê ji cewherê xwe, ji destpêkî heta niha ji bo mirovatiyê her tim bûye sedemê nexweşî, bindestî, taritî û lanetî.

Di vê pêvajoya dawî de keçikêk bi navê Nazdar, dixwaze tevlî refên gerîlla û jiyana azad bibe. Ji malê yanê cihê îşkence û lêdanê direve û li gerîllayan digere. Bes gerîllayan nabîne û bêçare dîsa vedigere mala xwe. Bavê Nazdar ji bo vê rewşê dike meselê namûsê û li  Nazdar dixe. Dîsa lêdan û kotekî û pêkutî…Diya Nazdar jî wê ji bo ku ceza bike ji malê diqewitîne. Piştre çar zilamên ku xizmên wan e dişîne ser Nazdar û wê dide tecawuz kirin. Ew çar xort, di nav daristanan de çar rojan tecawizê Nazdar dikin. Piştî vê bûyerê, Nazdar nîşana kesk û sor û zerê gerîlla eniya xwe girê dide û ser de jî rismê Serok APO girê dide û xwe didaliqîne. Întîhar kirinê wê, karekterê sîstema Îranê de tarzê ketina zilam û însaniyetê dide nîşandan. Zilam çiqas bêsînor ji însaniyetê dûr ketiye û jin jî çiqas ji aliyê vê sîstemê hatiye qirêj kirin û ji cewherê xwe dûr xistin. Bav û dê ewqas ji hest û hîsên însaniyetê dûr ketine. Namûsa feodalîzmê û civaka serdest jî evqas e…

Nazdar sembola jinê Kurd e. Bankirina azadiyê ye. Ev sîstema hatiye xulikandin, red kirina wî ye. Nazdar girêdana bi kesk û sor û zer dîsa bi rismê Serok Apo re wateyeke pir girîng dide vê çalakiya xwe.

Dixwaze ku di rêka Serok APO de bimeşe. Ji ber ku tama azadiyê hesiya ye. Çawa mirovek di çolê de tîhn bibe û li avê bigere, ji bo xwe jî Nazdar azadî ewqas pêwîst dibîne.

Zilam û civaka heyî divê ku ji van eyb û tawanê xwe şerm bikin û şerekî paqjjbûnê bidin. Lê belê ewqas trajedî hîn bes nayê dîtin. Zilam hîn jî ji ew taybetmendiyê xwe yê qirêj bernade û jinê tawanbar dibîne, tawanê xwe dixe aliyê jinê.

Jiyan dîsa wekî dojehêye ji bo jinê. Her tişt ji bo jinê gûneh û eyb tê dîtin. Dîsa îrada jinê di navbera çar diwaran de tê winda kirin û şikênandin. Ji ber van sedeman dîsa di van rojên derbasbûyî de jinekî ku êdî nema di nav vê jiyana dojehî de dikare jiyan bike, di mala xwe de deriyê odeyekî mifte dike, benzîn ser xwe û li çar diwarê odê dike piştre agir bi xwe û diwaran dixwe. Belkî ev jin, jinekî ne wisa zane û xwendavan be, lê belê ew ji kûrahiya hest û jiyana ku tê de ye derdixîne ku, ev çar diwarin wê ji jiyanê qut dike û ev laş e ku dibe sedema êş û jan kişandina wê. Her wiha agir bi vî awayî li jiyanê dixe. Li pîvan û qanûnê civaka paşverû û sîstema zilam dixe. Ew van tişta bi gotinan neanî ziman ew bi pratîgê xwe anî ziman û nîşan da. Jinêk din jî xwe davêje tenûra ku bi agirekî gur û mezin pêketiye.

Jiyanek ku her roj bi hezaran caran mirinê bide jiyan kirin qebûl nakin. Ew li azadiyê, wekheviyê, aşitiyê, demokrasiyê û cewherê mirovatiyê digerin. Ew bi întîhar kirinê re qîr dikin ku ev jiyana rûreş û paşverû qebûl nakin. Lê tu çare jî nabînin. Neqebûl kirin

û bêçaretî dibe sedemê întîharan. Ev întîhar ji mirovatiyê re bankirina jiyanekî azad û wekhev e. Çalekiya van keçên ciwan û jinan ji bo xwe gihandina tevgera azadiya jinê rê nîşan e. Ew, nîşaneya hêvî û baweriyê ne. Ger hêvî û bawerî tûnebûya nikaribûn xwe di nav çar diwaran de di nav tenûrê tije agir de bişewitandan û xwe daliqandibana.

Nazdar û jinên din nîşaneya bi tirêja rojê re ronakbûnê ne. Ew di şewqa rojê de jiyanekî nû û azadiya jinê û civakê didîtin. Ew şiyarbûn û rênîşana çareseriya gelê rojhilat û başur in. Nazdar bi çalekiya xwe re vebijarka jiyana paşverû di şexsê Serok APO de nîşan dide. Îlmê Serok APO ji bo çareserkirina gelan û civakan wekî ronahiyekî dibîne. Vebijarka Serok APO ya çareseriya demokrasiya şaristaniya nû di dilê xwe de hîs dikin. Divê ku hemû gelê Kurd, Ereb, Tirk, Fars û hwd li hember vê sîstema paşverû xwedî li berpirsiyartiya xwe derkevin û şerê demokratîkbûyînê re bibin hevkar. Dengê van keçên ciwan û jinan bibihîsin. Ji bo xilasiya xwe û mirovatiyê hewilbidin xwe û ji vê têkoşîna azadî û demokrasiyê bibin hevkar û rêwî.

**10-Gulan-2002**

## JIN Û BERDEL

Di civakê de çiqas pêşketin pêk werin jî pê re ewqas jî paşverûtiya civakê xwe didomîn e. Îro di dab û nêrîtên civakê de guhertin tê jiyankirin. Lê belê li hember van guhertinan astengiyên paşverû gelek êş û janan dide kişandin. Ev paşverûtî çine, bingehê xwe ji ku derê digire? Paşverûtî ji bêadaletî û newekhevdîbûn tê û bingehê xwe jî ji newekhevdîbûna têkiliyên civakê digire. Di têkiliyê civakê de newekhevdîbûn destpêkî ji bindestîbûna jinê û desthilatiya zilam tê.

Îro eger zilamek pir rehet dikaribe ji bo zewicandina xwe keçikeke biçûk -ku hîn bi rih û giyana zaroktî jiyan dike- bi guhertina jin bi jinê biguherîne û bi zewice, ev yek wê bi çi navî û awayî were bi nav kirin. Ew keçik her çiqas hîn di imrê zaroktî de be jî wekî jinekî tê hesibandin. Ew, bi jiyanekî bi vî rengî re wê li hember jiyanê bibe xwedî rihekî bi çi awayî, di jiyana wê ya bêviyan de jê re çi armanc û hedef bimîne.

Ew wekî milkekî tê hesibandin û tê firotin. Hestên wê ne girîng û rûmet e. Zaroktî û ciwantiya xwe jiyankirin ji bo keçikek an jî jineke negirîng e.

Zilamê wê yanê efendiyê wê jê re çi bibêje encax wê pêkbîne, ji bilî wê fikrandin û pêkanîn qedexe ye. Ew him hebûn him jî nebûn e. Yanê wekî miriyekî sax e. Ew di destê civak û zilam de aletekî an jî tiştekî şixulandin û bazarkirinê ye. Maneviyeta wê hatiye ziwakirin. Ew tenê bendeyê efendiyê xwe nîne. Ew bendeyê bendeyan e. Zilamê ku ji hêla sîstema heyî tê çewsandin ew jî bi eynî şêwe û rêbazê li ser jinê desthilatiya xwe didomîn e. Lewra sîstema heyî ji karekterê zilam ne dûr e û bingehê xwe ji karekterê wî digire. Ji ber vê yekê jî di çewsandin û hikûmkirinê de zilam tu jan nakişîn e. Taqasê yanê berdel kirina jinê de zilam ji rewşa xwe gelek memnûn e û serbilind e. Li gorî zilam pêkanîna vê, jê re wekî hêzeke û îspatkirina zilambûyînê ye.

Ev mînaka berdeltiyê zêdetir di Rojhilata Navîn de diyar e. Gelek caran mînakên zilamekî heftî salî neviya xwe yê 11-12 salî ku ji xwe re dike berdel yanê jin bi jinê dide guhertinê tê dîtin. Yanê jinê ku ji xwe re tîne jê 50-60 sal biçûk be jî ne girîng e. Heta ew ji bo zilam keyfxweşiyekiye. Lê belê ew keçik an jî li gorî nerînên zilam jina 11-12 salî çi hîs dike, çi jiyan dike, dema ku ew bi bedena xwe ya biçûk û zarok dibe jina zilamekî 60-70 salî jiyan ji bo wê tê çi wateyê?..

Ji bo jinê jiyan rojane û bêlêdan rojên xwe derbaskirinê ye. Jiyan jê re karê malê, xwedîkirina zarokên xwe yê ku hema hema di navbera wan de zêde sal tûne ye û li gorî xwesteka zilama xwe bûyîna jinekî baş e. Ji jiyana derveyê malê biyanî ye. Ji pêşke-

tinên jiyanê dûr e. Ji derveyê malê, jiyan jê re tirs û xof e. Wê jiyana xwe yê mirî wekî qederekî pejirandiye. Vebijarka wê, xwe şewitandin e. Gelek mînakên bi vî rengî hene.

Baweriya wê ya jiyanê hatiye şikandin. Azadî û jiyan jê re wekî xewnekî û xeyalekî dixuye. Maf çi ye? Bêhay û gûmana vê peyvê jiyan dike. Têkoşîn kirin ji bo wê wekî rewrewkekê ye. Bêzilam ji jiyankirinê re nebawer e.

Helbet ev rewşên ku em bilêv dikin, ji jiyana me ne dûr e. Li Kurdistanê hema hema li her parçeyê de ev rewş perçeyekî jiyanê ye. Belkî li bajêran ev rewş hinekî nerm bû be, lê belê zîhneyeta ku van daye avakirin û nêrîtan didomînin hîn jî di her kêliyê jiyana me de heye. Rêng û şêwe, rê û rêbaz cuda bin jî, zîhniyet eynî zîhniyet e.

Lê belê ev zîhniyeta zilam bila jibîr neke ku jiyan bi destê jinê afiriye û diafire. Heger îro pir kêm bêhsa jiyanekî jî tê kirin, ev bi cewherê jinê ku hatiye veşartin û tarî kirin tê. Şiyarbûna jinê û legerîna jinê her diçe zêde dibe. Bi ronakbûna xwe re her diçe civakê jî ronak dike. Zîhniyeta zilam, ku jiyanê dikuje, roj bi roj di dahûrîne, pê re jî diguherîne û jiyanekî nû avadike. Adaleta civak û jiyanê, bi guhertina têkiliyê civakê re yanê bi afirandina wekhevdîbûna têkiliyê civakê re avadike. Jin, jiyanê dîsa di dergûşa mirovahiyê li Mezopotamyayê de careke din diafirîne. Xewn û xeyalên jin û civaka bindest dibe rasteqîna jiyanê.

**20- Gulan-2002**

## MİFTEYA ÇARESERİYÊ….

Şaristanî gelek caran guhartinên dîrokî jiya ye. Di van guhartinan de jin rolên girîng leyîstiye. Demokrasî û wekhevî bi jinê re gihiştiye roja me. Şaristanî bi ked û xulikdariya jinê pêk hat. Jin zanistî û hinirên xwe fêrî hemû mirovatiyê kir.

Lê belê ew taybetmendiya jinê a parvekirinê ji aliyê zilam nehat fêmkirin. Lewra zanistiya jinê li dijî jinê hate bikaranîn. Êdî pergala zilam xwe li ser hinir û keda jinê rêkûpêk dikir. Hemû zanistiya wê û hinirên wê bi vî awayî hate dizîn. Nasnameya jinê di nav wext û kavilên dîrokê de hate wendakirin. Ev şaristaniya çînî pênc hezar sal e li ser jinê û pêre jî li ser mirovatiyê desthilatdariya xwe didomîne. Merc û ziruf jê re teng kiribûn. Lewra jin nedikaribû li nasnameya xwe ya wenda jî bigere. Lê belê tucar dest ji lêgerînên xwe berneda. Hertim di nava lêgerîn û hêviyeke de geh têkoşîn kir geh di nav bêdengiyê de feryad û fîganan kir. Ji ber van sedeman jin hertim ji herkesî bêhtir ji nûhbûyînan re pêşengtî kir. Gava li dîroka şoreşan binêrin dê were dîtin ku jin hertim di nava şoreşan de rolekî girîng leyistiye, bûye pêşenga fedekarî û xulikdariyan.

Ji ber ku zêdetir xwe di nav gihiştî de hişt û rêxistinên xwe yên taybet neafirand di dawiya şoreşan de tu tişt bi dest nexist. Dîsa di nava pergalên avabûyî de hatiye perçiqandin. Ked û xebata wê bê encam maye. Ev rewş hem di şoreşên ku di rojavayê hatiye lidarxistin wisa bû hem jî ya di rojhilatê de jî wisa bû.

Îro di Rojhilata Navîn de gelek mirovên bêsuc tên qetilkirin. Lewra jî yên tên ji yên berê nebaştir in. Di van rojan de gelek nuçeyên li ser kolanekî veşartî a li Kerkûkê hate dayîn. Di vê kolanê de termê du hezar kesan hatiye dîtin. Li gorî tesbîtan, yên hatine qetilkirin Kurd in. Wê demê jî pergala heyî qetlîaman kiriye niha jî dîsa di bin navê "azadiyê" de mirov tên kuştin. Ango hertim a ku zerar, êş û jan dikşînin dîsa gel bixwe ne.

Nemaze rewşa Efrîka jî gelek tirajîk e. Gelek zarok, jin, ciwan û hwd. Ji birçîbûnê jiyana xwe dest didin. Di vê sedsala zanistî û teknîkê de hebûna mînakên bi vî rengî gelek nakokî û pirsan derdixe holê. Tawanbar kî ye yan jî çi ye?

Helbet destpêkî divê pergal û rêvebirên van pergalên heyî bersiv bidin. Niha dîmena wekî ku pergal xwe diguherîne tê dayîn. Guhertin çêdibin. Lê belê li ser çi esasî? Têgîna "demokrasiyê" ji her derî tê bihîstin lê, "demokrasiyekê çawa?"

Emperyalîzm dibêje "guhartinên demokratîk." Lê belê demokrasiyekê li gorî berjewendiyên wan. Wê demê viyan, pêwistî û daxwazên gelan li kû derê dimîne? Lewra di vê xalê de pirsgirêk tên jiyandin. Ferq li vir e. Ango emperyalîzm bi rêbaza xwe resto-

rekirinê nikare pêdiviyên gelan pêk bîne. Her wiha nîvçemayîn û xetimandin bi mînakên Efganîstan û Iraqê re berbiçav e. Bi mabesta siyonîzmê re ketina nava bîrê encam nayne. Çiqas daxwazên guhertinan hebin jî ger li ser bingeha viyana gelan nebe wê demê encamên demokratîk jî nayên girtin.

Erê, ev rastiyeke ku bi rê û rêbazên pergala zilam, pirsgirêkên mirovatiyê nayên çareserkirin. Şer û şîddet taybetmendiya pergala desthilatdaran e. Lewra bi awayekî berbiçav hat dîtin ku ev rêbaz tu çareserî naynin. Pêdivî bi hinir, cewher û çavkaniya rasteqîn heye. Li hember ev rastiyên berbiçav hîn jî di pergala desthilatiyê de israrkirin taritî pejirandin e. Taritî mirovatî aniye ber kendala mirinê. Çav kor, hest wenda, ziman lal in. Mirin bê hay û gumana mirovan xwe digihijîne wan. Lê belê jiyan nûnera diyalektîkê ye. Lewra ronahî li hember taritiyê di nav şerekî dijwar de ye. Xweydan û keda mirovatiyê  ji ronahiyê re rêheval e. Lewra jin, pêre jî hemû qelh û çînê karkeran xwediyê vê ronahiyê ne. Têkoşîna wan çiqas xurt be xilasiya mirovatî û serkeftina ronahiyê jî ewqas nêzîk e.

Sedsala 21an ji bo gelan heyamekî cuda ye. Tîrêjên rojê rastiya taritiyê derxistiye ser ruyê avê. Ji bo serkeftina gelan divê ku ji herdemî bêhtir îro jin li hemû cîhanê xwe bi rêxistin bikin. Kurd, Ereb, Fars, Tirk, Elman, İngilîz û hwd. hemû dilên ronak yek bibin. Yekbûyîna jinê yekbûyîna ked û demokrasiyê ye. Mizginiya çareserî û aramiyê ye. Ev têgînên xweş û girîng encax bi rengê jinê re dikare pêk were. Jixwe

ev meha ku em têde ne meha ked û xweydanê ye. Xwediyê gelek bûyerên girîng û biwate ye. Jin bi hestiyariya xwe ya bêhempa re dikare xwedî li peywirên dîrokî derkeve.

Bersiva sedsala nû jin û têkoşîna wê ya demokrasiyê ye.

25- Gulan-2002

## GUNEHÊ WÊ EWE KU Lİ RASTİYA XWE GERİYABÛ

Ez li gundekî girêdayî Silêmaniyê, ya bi navê Çemê Rêzan, ji axîna dilê dayîkan û bi rondikên çavan re, weke zarokekî bê ziman hatim ser rûwê cîhanê. Hatina min, ji bona malbatê tarîtî bû. Ji ber ku ez keçikek bûm û tim ji bo wan ez ne temam bûm. Lê, ji bona, gel ez weke ronahiya stêrkan bûm. Ez tenê di cîhanekî biçûk de dijiyam. Rêka min ji deriyê xanî heya ber bîra ku di bexça me de ye, bû. Min tenê der û dora xaniyê me didît û ez wisa mezin bûm. Her tim bi nêrînekî biçûk û qels li min dinihêrtin. Her diçû jiyana min ji hêz û viyana xwe dûr diket. Jiyana di nava cehaletê de, ne tu jiyan bû. Jiyan ew bû ku min rastiya xwe ya di navenga cehaletê de nas bikira û wê demê li dijî paşverûtiya ku li ser jinê dihat sepandin, bisekiniyama. Naskirina tevahî jinan, naskirina min bû. Ji ber ku min xwe nas nedikir. Bi rûyê xwe yê melul û bi dilê xwe yê bi êş, tim di nava axîn û keserên xwe de li rastiyê digeriyam.

Malbata min ji PDKê bû. Ketibûn binê bîra cehalet û îxanetê, di tarîtiya xwe de fetisîbûn û ji rastiyê dûr ketibûn. Jê re jî digotin; “jiyan.” Lê, ne jiyaneke azad bû. Min xwe ji malbata xwe vedişart û ji bona ku av bînim, diçûm ser bîrê. Min cara yekemîn gerîla li

wê derê nas kiribû. Dema ku ez diçûm cem hevalan, bi kêfxweşî û bi dilekî weke yê zarokan xwerû bûm. Dema ku ez li gel wan bûm, min xweşikahiya jinên azad û yên bi rûmet hîs dikir. Dema min bi gerîla re nîqaş dikir, nêzîkê rastiyê dibûm. Her cara ku ez diçûm cem wan, ber bi ronakbûnê de, min di xwe de çirûskekî ronahiyê didît. Ez ji gerîla têr ne dibûm, ji ber ku pergala min ya jiyanê ji aliyê malbata min ve hatibû sazkirin. Dilê min yê bitirs ez mecbûrî çûyîna malê dihiştim. Rêka ku ez her roj tê de diçûm û dihatim, êdî min dikaribû çavgirtî jî biçûya û bihata. Bi pênûsekî xet danîbûn ser rêya ku ez tê de diçûm û dihatim. Ango; xeta jiyana min bi pênûsekî hatibû xêz kirin.

Min di şevên xwe yên tarî de, li ber pencera hesinkirî, li sitêrkên asîmanan dinihêrt. Rojên min di bin venêra perglaka ku ji min re danîbûn de derbas dibû. Tevahî gunehên min, ji ber keçbûna min bû û ez "namûsa" wan bûm. Dema ku ez dereng ji avê dihatim malê, rûkeniya min ji min dûr dikirin. Lêvên min yên lerzonek parçe parçe dikirin. Ji çavên min yên bi hêvî -ku mîna ava Ferad û Dîcle ne- ji ber cehaletê rondik diherikîn. Her derê bedena min ji ber lêdanê reşo-şîna dikirin. Êdî min digot; ji vê zilma xêrnexasan re, bes. Êdî min dixwest ku ez bibim mîna tovekî û wekî gulan, ji bona jiyanek nû bipişkivim. Min sînorên ku ji bona min xêz kirine rakirin û berê xwe da cem hevalan. Min jî bi wana re berê xwe da çiyan. Di temenê xwe yê çardesalî de, cara yekemîn bû ku ez ji bexça mala me dûr diketim. Ev cara yekemîn bû ku min fêm

kir, cîhan ewqas ne teng e. Li çiyayên Kurdistanê dar û zinar weke cindê xweşik bûn. Di rêkên çîleçep de, ez wekî kevokekî aştiyê, bi kêyfxweşî difiriyam. Ji xwezaya Kurdistanê min bêhna gul, beybûn, nêrgiz û axê dikir. Ev bêhn, bêhna azadiya Şaristaniya Mezobotamya bû. Ji zordariya malbata xwe dûr ketibûm. Daxwazî û xeyalên min, weke yên jinekî pêk hatibûn. Ev jiyan, jiyana ku ez lê digeriyam bû. Êdî min digot; ez jiyan dikim.

Ev pênc rojên min bûn ku tevlî refên gerîla bûbûm. Min li wê derê hevalekî jin nas kiribû. Navê wê Şîlan bû. Hat gel min û ji min pirsî;

-Tu çend salî yî?

Min lê mêze kir û çavên min tije rondikên evîna gerîla bûbûn. Min got; ez pênc rojî me. Destpêkê wê hevalê ez fêm nekirim, lê piştre me nîqaş kir û min pê da fêmkirin. Dîsa min got; heya niha min jiyan nekiribû, ev pênc rojin ku ez jiyan dikim. Wê hevalê li min mêze kir. Rengê porên wê çur bû û li ber baya, di bin tîrêjên Roja Jiyanê yên havînê de diçirisîn. Wê hevalê bi hêviyeke germ ez hembêz kirim. Ev hembêzkirin êşa dilê min ya bi birîn derman dikir û min êdî xwe wekî jinekî didît, lê dîsa jî ez ji azadiyê re tîn bûm.

Qederekî bixeter û reş, dîsa li ser eniya min digeriya. Pênc rojên min bûn ku ez li çiyan bûm. Malbata min hemû hatibûn ku ez têxim nava tirbekî tarî. Ji min re gotin;

-Eger tu newî, emê xizmên te yên jin hemûyan bikûjin û divê ku em “namûs”a xwe pakij bikin.

Ez bêçare mabûm, eger ez neçim wê gelek jinên bê guneh werin qetilkirn. Ji ber vê yekê pêwîstbû ku ez bîçûma. Min got; çûyîna min wê ji mayîna min çêtir be û ez bi rê ketim. Bêxwestek bûm. Dilê min dîsa bi birîn bû. Hêstirên çavên min ji ber cehaleta malbata min dîsa diherikîn. Li ser serê min lorandinek bêsekin û tebat hebû.

Min birin ew mala ku ez lê hatibûm fetisandin. Bi destên xwe yên qirêj li min dan. Min di her derbekî ku li laşê min diket de, birîna gelek keçên ciwan yên mîna xwe didît. Wekî bekoyan ketibûn ser laşê min. Lê êdî ez bê xem bûm. Ew her pênc rojên ku min li çiyan jiyan kiribû, nedihişt ku ez bêşim. Ez ji bo van rojan, gelek serfiraz bûm. Piştî sê rojan ez birim cem mizgefta gund. Wê "namûsa" xwe paqij bikirana. Ez ji mirinê qet neditirsiyam, ji ber ku cil û bergên gerîla li ser min bûn. Ev mirin, cûreya herî birûmet ya mirinê bû. ango jiyana bêdawî bû. Vê carê ez serfiraz bûm û pênc roj bin ji, min jiyan tam kiribû. Min dikaribû bê xem û rehet xew bikim. Cil û bergên li ser min tirs dixist dilê wan û min bi ser bilindî û ji xwe bawer li nava çavên wan mêze kir. Ji çavên wan tirs û îxanet dihat xwendin.

Tîrêjên rojê li ber çavên min beriqîn, lê âsîman bi ewrên reş xemilîn û li ser neheqiyê xwe barandin. Malbata min, mîna dijmin berê lûleyên çekên xwe dan ser min û gulleya yekî berdan çavên min. Ji ber ku min li nava çavên wan mêze dikir û ji ber tirsa ku ezê qirêjiya nava dilên wan bixweynim gulla destpêkê berdabûn çavên min. Xwîna min niqûtî ser axa Mezo-

botamya û bû mîna ava jiyanekê û hemû bizirkên jiyanê av da, pişkifand û xweza ji nû de xemiland. Min bi lêva xwe ya bi ken û êş, axa ku xwîna min rijiya ser, maçî kir. Mizgefta ku weke cihê îbadetxana bibaweran e, bû şahidê tiştên ku min jiyan dikirin. Her gulleya ku li min diket, bû evîna çilmilyon mirovan û di dilê wan de text çêkir. Her gulleyekî ku li min ket, mîna keçên Kurd yên li cîhanê belvbûyî, bedena min parçe parçe dibû. Lê armanca min bi yê çilmilyonan re digihişt hev.

Malbata min li ber çavên min bûbû weke beko û xayînên azadiyê. Çil gulle li pişta min xistin. Xwîna min gihiştibû Çemê Dîcle û Ferad, ber bi deşt û newalên welatê min ve diherikîn. Qene gorekî jî ji min re nekolan. Çend bost ax jî ji min re zêde dîtin û min avêtin nava koncalekî, piştre jî ji bona ku ez rastiya wan nebînim çend kulm ax avêtin ser çavên min.

Piştî rojek dibihîsim ku gelê me yê welatparêz û rêhevalên min ji vê bûyerê hayedar dibin û têne cem min. Her çiqas qelhên mîna malbata min û PDKê, zordarî û keftên bi çekan dikirin jî, tu kesî goh nedida wan. Tevde hatin cihê ku ez lê veşartime û hevala Şîlan bi destên xwe yên bihêvî ze ji wî koncalî derxistim. Herdu destên hevala Şîlan ji xwînê sor bûbûn. Rengê min ne rengê miriyan bû, rengê min rengê jiyanek nû bû. Min di nava lepên xwe yên germ û bihêvî de hilgirtin, birin li Silêmaniyê, di Goristana Şehîdan de veşartin. Gunehên min ew bû ku, ez li rastiya xwe geriyabûm. Bûm xelata jinên ku lêgerînvanên jiyana azad in. Vê carê jî tevlî refên şehîdên şoreşê bûbûm.

Îro, yên ku divê werin darizandin, têne darizandin û divê çareseriya nakokiya koletî û serdestiyê jî, di wateya navê min de, bi AŞTİyê were çareserkirin.

**07-Sibat- 2003**

## BERXWEDANİYA ÇAR EGÎDAN

Gul bi xwîna şehîda hate avdan û dinava zinaran de gul pişkovîn, bi gulên rengin bi navê wan hatin neqîşandin. Ew çar gul bûn evîndarê berxwedaniyê û li ser hemû gelî bandor kir. Bi aşqekî xemgin bûn evindarê jiyanê.

Dinava çar diwarê rêş û tarîh hatin çarmix kirin. Zilm û îşkencên herî dijwar li ser wan pêkanindin. Bi taybet ji li ser girtigehên siyasi… li ser Zîndana Diyarbekir de polîtikayekî herî wahşet dihata meşandin. Bi şev û roj jiyana wan ji mirine xiraptir dikirin. İzalosyonakê herî wahşet pêkanin û bi vî awayî sererastkirina mercên rewşa wan êdî veşartin. Ji bo jiyana wan astengi derdixistin û her diçû hîn zedêtir îşkence dikirin.

Wana ticara dudilî jiyan nekirin, bi qarerekî xurt girtin **“Hêdî bi vî awayî nemaşe”** digot. Lewra, ev rewş bû sedema 14ê Tirmeh 1984 despêkirina rojaya mirinê. Bi navê hemû girtiyên ku mîna wana bi îşkenceyan re derbas dibûn, biryar dan ku des bî rojiya mirine bikin. Mînak, Kemal Pîr, Hayrî Durmuş, Akîf Yilmaz, Alî Çîçek bi armanca azadiyê biryarkî bi vî rengî pêwîst dîtin. Ji ber ku tiştên li serê wana dihate kirin mirovatiyê gelekî dûr bû. Li ser girtiyan bi veşartî îşkenceyên giran dihata meşandin. Berdexwadiya wana li ser zindana diket.

Zindan dibû cehenem. Mirovatî tûne dikirin û psîkolojiya wan dilîstin. Karerekî bi vî rengê herkes nikarê pêkbine. Yê ku bi armanca xwe û doza xwe giradeyî encax dikare berxwe bide. Ji bo çareser kirina mafê hemû kesî xwe dan peş. Bi vê re hêza xwe û baweriya xwe hîn xurtir kirin. Pirsgireka wan ne nan û av bû azadî û armanc bû.

Bi baweriyekî rûmet
Bi fikrêkî azad
Bi qarerekî rasteqîn

Bi berxwedaniya xwe li herderî agahdar kirin. Bi demekî dirêj çalakiya xwe berdavan kirin, heta dilopa xwîna xwe ya dawî berxwedani kirin. Ji çavê wan çîrûsktên agir dibiriqîn û hêvî diçûrisi. Xweşikbûna dilê wana hemû kesî dîtin. Çavê gelê Kurd, Tirkan ronahi kirin. Bi dilekî bawerî; hêdî hêdî yek bi yek xatir ji gelê xwe xwestin. Şahadeta yekêmin 57 roj da Kemal Pîr, 59 Hayri Durmuş, 63 Akîf Yilmaz, 65 Alî Çîçek roja mirina ber dawî çûn. Gul û rihan bejna xwe li hember şahadeta wan bejna xwe tewandin. Rengê stêrka hîn geştir bûn û bi xwîna wan gul hatin avdan. Serî ne tawandin ji kolêtiye re. Bi rûkeniye kî mirine hembez kirin. Zindana Diyarbekir hêdî di xemiline bi rengê çar evîndaran. Ciwantiya Ali Çîçek bû kulîlkên gerdûnî. Kemal Pîr bi dengê xwe yê qalind guhê herkesî tijî dikir û mîna bilûra dihata guhê hemû kesî. Kesayata her hevalekî de xweşikbûnekî cuda cuda dihate dîtin.

Zindana Diyarbekirde koletî qebûl nekirin û li dijî wê derketin. **Nexwestin ku tiştê hatiye li serê**

**wan werê serê hemû kesî.** Ji bona guhertin û vegurtinên hemû girtiyan mafê xwe xwestin. Lê dijmin dîsa li gorî xwe nizikî girtiyan dibû. Bi taybet ji çareser kirina pirsgireka li dijî işkenceyên mirovatiyê qebûl nekirin.

Zindanên reş û tarîde bi şahedata wan ronahi belav bû. Li derdor bi dengê wan di guhê hemû kesî deng veda û bûn sembola hemû renga. Êdî ji nû de veguhertînên nû Zîndan de despêkirin. Rastî ku ji dervê ye mirovatiyê gel bihist û bi vî awayî li ser hat rawestandin. Polîtîkayên qirêj û veşartî herkes êdî dîtin. Bi mehan, roja rojiya mirine bi awayekî rast û baweriyekî gihiştîn serkeftinê. Armanca xwe bi dil û can dan nîşandan. Di kulekê zîndana Diyarbekir de tîrêjên roja rengîn dan û dengê wan hîna guhê her mirovekî tê bihîstin. Li hember koletiya baxtreş dest bi dest gav bi gav avetin. Ristekên jiyanê cur bi cur belav kirin Zîndana Diyarbekir de. Evîna gerdûna wan de çavkaniya, tîrêjên roja de xemilandiye. Çar Egît dinav dildaranda cih girtin û ticarî namirin, her dem di dilê me de bibin xeleka jiyanê.

**04-Tîrmeh-2002**

## KEÇÊ DELAL

"ji bo bîranina Ş. Ozlem (YILDIZ Aydin)"

Vê pergala paşverû ya ku hatiye avakirin di vê civakê de wê têr nedikir, wê vê jiyana erzan nedipejirand, ji ber ku mirovahî ber bi tunebûnê ve dibir û ji xwezaya xwe dûr dixist. Ji ber vê jî dilê xwe yê germ û hêviya xwe spart van çiyayên bi rûmet û bi rêya Serok APO di van çiyayên xweşik de azadî dît, bêhna nêrgiz û peybûn kir. Li ser rûyê xaka Kurdistanê, di bin asîmanên şîn de rojê tîrejên jiyanê reşandibû. Tîrêjên rojê di rûyê keçeke Kurd ya bênav de şewq dida. Wek her gerîlayekî keç, li serê van çiyayên azad kulîlk vedabû. Li ser zinar û latan, li deşt û zozanan, bi her çiqilkekê darê ve kulîlkên heskirinê yên evînê veşartibû, di dilê vê keça ciwan de heskirin û evîn weke çiyayê Ararat bilind bûbû.

Ji bo demên pêş vê keça ciwan hevî û baweriya xwe bi şaristaniya demokratîk anî bû, coş û heyecana xwe bi mirovahiyê re par dikir. Di çavên wê de hevî û baweriya jiyaneke nû, dilê wê weke Çemê Avaşîn zelal bû. Vê ronahiyê bindestî nedipejirand û di rêya jin a azad de tîn bû. Destê xwe avêt ser destê şewqa tava jiyanê. Di her tiliyekê wê de reng û hêza zanebûnê dixuya. Di vê çalakiyê de zor û zehmetî zêde ji bona wê ne girîng bû. Ji ber ku dixwest hêza Serok APO fêm bike. Ew keç, keça Serok APO bû, keça çavkaniya jiyanek nû bû.

Rûwê hevala Ozlem wek berfê spî bû. Porê wê yê reş û honandî berê xwe dabû aştî û biratiyê. Di nava kena wê de êş û janên koletiyê dixuyan. Ew êş, êşa tunekirina mirovahiyê bû. Di lêvên wê de xweşiya navê jin a Xwedavend Zîlan hebû, her têlek ji porê wê zincîrên sed salan diqetand. Ew êş, êşa tunekira jinan bû. Îro, felsefa jinên azad di dilê Ozlem de, wekî yê/a di dilê her gerîlayekî de hatibû çandin vê zincîrê koletiyê bi destên jinên azad dihat şikandin.

Fîdekariya Ozlem di asîmanên şîn de bibû rengê şaristaniyê. Ozlem a Botanî bûbû evîndarê Dêrsimê, Amedê, Rihayê… Evîna wê bûbû welatê wê, bi rûmet û dilê xwe yê zarokî berê xwe da ser sengerên dijmin, ji bo avakirina azadiyê bi tevahî hêza xwe êrîşê ser dijmin kir. Hevala Ozlem di rêya hemdemî ya serhildanên Elî Riza, Besê û Zerîfe de meşiya. Tîrêjên rojê ji bo berxwedana Ozlem ronahî dida erd û asîmanan. Ozlem ji mirinê neditirsiya, ji ber ku bûbû çavkaniya jiyaneke nû, hêviya wê mezin bû. Ji sersala nû re Ozlem bû çewqa jiyanê...

**09-Çile-2003**

## XELEKA RASTEQÎN YA ADARÊ

Di hundirê şahristaniya serdest de, rastaqîneya jinê winda bibû. Îro tevgera azadiyê ya Birêz Ebdulah OCALAN bi perspektîfên rengê jinê nêzîkatiya xwe danî holê. Gerîlayên jin bi perspektîfên Birêz OCALAN, di kongreya xwe ya sêyemîn de biryara damezrandina Partiya Jinên Azad PJA girtibûn. Perspektîfên Birêz OCALAN û hevpariya jinê, jin veguherî ber bi cewhera xwe ve.

Di 13ê Adarê de biryara Partîbûna jinê hatibû girtin. Vê xalê jî rengê xwe daye roja îro. 20 hezar jin, di 8ê Adarê de bi dengekî bilind û rengê şeng û şox nêzîkî aso û germahiya roja me ya rizgariyê deng vedabû.

Îro jinên cîhanê li hemberî şer şer, ji bona serwerkirina aştiyê serkêşî dikin. Ya ku di dîrokê de hatiye perçiqandin, zorî û zehmetî kişandiye, jin in. Ji ber vê yekê jî berxwedaniya wan gelek girîng e û navê xwe li ser rûpelen dîrokê bi agirê azadiyê kiribû sembola azadiyê.

Keçên Kurd bi agirê sor hezkirina xwe daye nîşandan. Mînakên 21ê Adarê yên ku deng vedabûn; 1991 Zekiye Alkan, 1992 Rahşan Demîrel, 1994 Ronahî û Berîvan û 1998 Sema Yuce bi agirê bedena xwe ji nû de aj dabûn. Xemla Zekiye Alkan û Rahşan Demîrel di dilê Kurdan de bûbûn hezkirina rastiyê, ronahî û hêlîna cîhanê. Bêguman wekî Ronahî, Berîvan yên ku vê rastiyê qenç fêm dikin, tenê ew zû

baş pê dihesin û di kûrahiya hestên xwe de serbilind dibin, ji bona paşeroja bihare tovên jiyanekî nû ne. Di vê xalê de hezdikin û çalakiyên xwe yên azadiyê pêk tînin. Ango, jiyana nû didin afirandin.

Sema Yuce jî bi hesta xwebûnê xwe avêt nava xeleka agirê, li hemberî zordarî û şerên ku li dijî jinê tê meşandin rawestiya. Bi vî awayî bû mînakekî lehengiyê û sembola Newroza ber bi Demokratikbûnê.

Di meha Adarê de rojên gelek biwate hatine jiyankirin.

Rojên naskirina çand, dab û nêrîtan e.

Rojên pêserwextbûna dîrokê ne.

Rojên hêvî û berxwedaniyan e.

Rojên bi hevpariya gelan re biharbûna azadiya jinê ne.

Rojên ku serhildanên Kurd gihiştine lûtkeya xwe ne.

Rojên demokratîkbûna jiyanê ne.

Meha Adarê wekî biharê bi kulîlkên cur bi cur hatiye xemilandin. Rengê biharê rengê jinê ye. Ev rengê jinê, nixumandina cevhera jinê, vediguherîne xelekên bedawî û bêqedandin, rastî û pirengiyê.

Gele Kurd ji aliyek ve êşa koletiya salan, zorî û neheqiyan kişandiye, lewma jî pêwîstî heye ku rêya tercîha zanebûnê bike. Divê ew kesên ku bi dilê xwe tevlî vê rêka lêgerînê bûne û xwe weke dilsozên mîrasa Zekiye Alkan û Rahşan Demîrel dibînin parazvaniya rengê jinê bikin. Çawa ku Zekiye, Rahşan, Sema, Berîvan, Ronahî rêwiyên rêya Mezlûm Doxan bûn, berdawamkirina xeleka agirê azadiyê jî em in. Lewma

jî divê hemû jinên Rojhilata Navîn; Ereb, Tirk, Asur, Ermenî, Fars û Kurdan bi coşek mezin tevlîbûna xwe ya di newrozê de xurt bikin.

Ango; kesayeta wan ya xwerû, pak û ya ku gelek ji jiyanê hez dikin, bi biharê re ji nû de bibişkivin. Bi lêgerîna xulikandinike ji nû de bimeşin, ber ve azadiye lûtkeya çiyan ve hilkişin. Weke kulîlka berfin a ku ji bin berfa spî, reşahiya zivistanê serî radike, bi berxwedaniyek berfê diqelişîne û bi axa zêrîn û asoyê re dibe yek, dertê ser rûwê erdê û bi raperîna xwe, mizgîniya newrozê dişeyîne ji gelên Rojhilata Navîn re.

**01-Adar-2003**

## KÎMYASAL Û HELEPÇEYÊN NÛ NAYÊ XWESTİN

Gelek sal jî derbas bibin tu car jana Helepçe nayê jibîrkirin. Jana hezaran kesan di nav seliya bêdengiyê de nayê wendakirin. 15 sal berê jin, zarok, ciwan, pîr û kal bi çekên kîmyewî hatin qetilkirin. Hîn jî ew dîmena solên biçûk ku bêxwedî mane, dergûşên ku hejandinên wan nivî de maye, rû û destên ku ji bandora kîmyasalê reşbûne û şewitîne di bîr û ramana me de ye.

Kes van dengên hêmîn û mehsum nebihîstibû. Goh kerr, çav lal bibûn. Dil qayîm, hest pola bibûn û hîs nedikirin jana gelê Kurd a Helepçe…

Hîroşîma, Nagazakî dengvedabûn heta giyanberên xwezayê a veşartî jî… Lê, Helepçe wekî ku nehatibe jiyandin tu mirov û xweza jî xwedî lê derneketibû. Qey ev qeder bû? Qey Kurd tawanber bûn? Tawanbar jî bi wê hovitiyê nayên cezakirin… Dadgeh nehat danîn ji bo tawanbaran, yên mirî hatin darizandin… Ango dîrok çiqas bête veşartin, çiqas bête tarîkirin jî rastî ji bîr nake. Tu hêz nikare tiştên hatî jiyandin tûne bike. Lewra tawanbar ne tenê kesayetêkî bû. Ne tenê firokên Sedam bûn. Hêzên bi maske, dizên pênc hezar salan bûn. Pergala desthilat, vacên bêwicdan bûn…

Dîrok ji dubarebûnê pêknayê. Lê ji bo gelê Kurd rastiya xwezayê jî serûbin bibû… Ji ber ku gelê Kurd gelek caran janên wekî Helepçe jiyan kiriye…

Kanê tawanbarên Newala Qesabba, kanê celladên dervekirinên hezaran kesan…

Şopên dîroka Kurdan nîşaneya rewşa gelê Kurd e. Helbet wê tawanbar bêdeng bin hetta wê êrişkar û hov bin. Ji ber ku tawanbar gelek in. Hevûdu jî vedişêrin. Çima deng ji Brîtinya ya ku dibêje pêşengê dadê me derneket û dernakeve? Çima deng û hisa DYA ya ku dibêje xwedayê aramî me derneket û dernakeve? Çima tu helwest xuya nekir û nake Rojava ya ku xwe nûjen dide naskirin? Xwediyê wan çekên kîmyewî kî bûn? Ku îroj jî dixwazin kimyeviyên xurttir bikarbînin.

Beyê gelê Kurd dîsa qedera Kurdan heta beyê viyana gelên rojhilata navîn qedera gelan tê nivisandin. Lê vê carê DYA, Brîtanya, Rojava û hêzên dagirker a herêmê xwe dixapînin. Ronakbûna sîh salan a bi têkoşîna azadiyê ji bîr dikin. Kurd îroj xwedî serok, rêxistin û artêş in.

Her çiqas hêzên dagirker li ser xetên xwe yên dagirkerî bi îsrar bin û “Kurmê darê me” çiqas di koletî û îxaneta gelê Kurd de bimeşin jî rastiya van hêzan derketiye ser rûyê avê. Gelê Kurd jan û êşa komkûjî, şer û xwînê baş dizane. Ji ber vê yekê ye ku ewqas li ser xeta xwe ya aşitî, demokrasî, biratî û wekheviyê bi îsrar e. Sîh salin ku gelê Kurd ji bo aşitiyekî rast û dirûst di nav têkoşîn û tevgerê de ye.

Her çiqas çar aliyê Kurdan bi komployên navnetewî û leystokên qirêj ve were dorpêçkirin jî gelê Kurd bi azweriya azadiyê re têkoşîna xwe didomîn in. Ji bo ku Helepçeyên nû newin jiyandin û çarenûsa

xwe bi xwe pêkbîne di nav xebatekî sift de ye. Divê ku ev xebat li ser bingeha yekitiya netewa Kurd û çareserkirina pirsgirêka Kurd bi awayekî xurttir berdewam bike. Lewra yên ku van xebatan pêş bixe gelê Kurd viyana wan ê serbixwe ye. Bi ronakbûnekî dîrokî û hişpakekî zelal re şopandina demokrasî û pêşxistina aşitiyê herdem wê xeta esas a Kurdan be. Edî "kurmên darê" jî nikare hişpaka Kurdan bi mij û moran bike. Dostên rast û çareseriya ku divê pir eşkere xuya ye. Jixwe şiyarbûna ku gelê Kurd jiyan kiriye rê nade Helepçeyên nû. Lê belê hêzên xwînmij gelek in, divê ku hîn xurttir û bi hêztir ji bo aşitî, yekitî û demokrasiyê bi rêxistin û xwedî ked bin…

**08-Adar-2003**

## HEVALTİYA GERÎLA

Bi rengê keskesorê ku hemêza asîman dixemilîne û dibê xelaka rengîn. Em jî grupek heval bûn,ji kultur û nasnemayên pir cuda cuda em hatibûn li gel hev. Li ser perdaya şîn, kesk û zer bi rengê xwe yên xweşik, şewqa xwe dabû axê. Di manga me de hinek Tirk, Kurd, Areb, Laz em hemû gihabûn li gel hev. Em hemû li derdora agir de xelek veda bûn. Bi dilekî germ û şad me hemûyan çaya xwe vedixwar. Şewqa stêrkan esîmanê tarî ji hev diçirand û xelekekî girover hîn xweştir dikir. Mîna agirê me, stêrkan xwe geşkiri bû. Wê şevê li ser esîman du stêrk xuya bûn, gelek di teyîsîn û asîman xeşik dikirin .

Wê atmosferê em dibirin, rojên berê. Tişta me anî bûn wê derê çi bû? kîjan lêgerînê em anî bûn wan dera? Yê ku li hûndirê civaka me de têr ne dikir çi bû? Ew pirs em anî bûn li ser wan çiyayên azad. Em hemû gelek keyfxweşbûn. Ji ber ku raman, hezkirin, hêvî, êş me li gel hev pardikir. Herçiqasî mirov, hebûna jiyanê be jî, lê belê pêwîste ji bona civakê em xwe bigihînin lûtkeya azadiyê. Yê ku bi raman û parvakirin digihîne hev û din, hevaltiya gêrîla bû. Her çiqasî di jiyana me de, êş, zorî, zehmetî hebe jî, lê belê rûmeta hevaltiyê û bîrdozîya APO çîtiyê me ser niga dihêle. Bi xeta APO çîti me hevaltiya rast bi dilekî pak diafirand. Li ber bayê axaftinê me jî, ji her milî de, dilê me hînik dikir. Deryaya dilê me mezin bû û ji her milî de vekirî bû.

Hevalek li kêleka min rûniştî bû, nişkave ji berîka xwe lênûs û pênûsa xwe derxist. Ev xweşikbûna parvakirina me, li ser rûyê hemûyan diha-

te xuyakirin. Hevalekê, bi destê xwe yê nazik dinivîsand. Di rûyê wê de hêvî dihate xwiyakirin. Şûna bêdeng bûna me pênûs diaxifî. Agirê me li ser rûpela şewq dida... ji her milî de parvakirin bûbû dostê me yê herî rast. Çavê wê li ser agirê sor di teyîsîn. Ber bê dawî bûn digeriya çavên wê çarna jî mêyzandina wê dizivirî li gel hevala. Dema dinivîsand rûyê wê, çarna melûl û carna jî keyfxweş, bi raman dihat xuyakirin.

Ne tenê wan roja me parvadikir. Parvakirin bibû parçekî jiyana me. Di nava xwezayê de ajel û zindîwerên renga reng dihatin xuyakirin. Dengê çukên xerîp di nav bayê de tevlîhev dibû û dengê xwezayê herderî bilav dikir. Nav daristanê de dengê cuda cuda hata bihistin.Xwezayê jî bi dengê cuda, bersif dida çuka xerîp. Nav wan dengan de dengekî nimz dihate guhê me. Hêdî hêdî ew deng zelal dibû. Kêleka me dengê bilbilan guhê me xweş dikir.

Ango; xweza wekî me parvadikir û hebûna xwezayê bedew dikir. Bilindbûna dengê teyrikan ketibû nav dengê me de û parvakirina me, em biribûn wan bîranînên derbas bûyî.

Bê sekin nîqaşê me berdawam dikir, lê belê ez bi raman û guhdar kirinê çûbûm. Ew rojên rêka dûr, em bi hevre meşiya bûn. Piştî ku ew meşê me yê zor û zehmet bi hevparî me burand bûn, ez gelek şad bibûm. Ronahiya heyvê ez xistibûm nava hestên kûr. Keyfxweşiya dilê min, bi heyvê re min parvadikir. Ev meşa me ya di bin tava heyvê de me geş kiribû. Meşa me gelek giran derbas bûbû. Ew hevalê li gel min jî, gelek zorî kişandibûn. Ew hevala zorî dikişand, hemû

hevala alîkarî didanê, hinekan ji pişta wê çante û sîlah jê digirtin. Dixwestin bi çoş û moral wê bidin meşandin. Hinek heval bi henekî digotin; “Dema em jî nû bûn me nikarî em bimeşin”. Evîna hevala li ser zimanê wan dihate belavkirin. Di hûndirê civakê de kêm cara wekî evîna hevpariya gêrîla tê dîtin, an jî nayê dîtin.

Ew roj, mînakî biçûk bû. Gelek caran em bibûn şahidên çalakiyan , yên ku hatin birîndar kirin, ji bona gule lê nekeve xwe bi wêrekiyekî bê hempa avêtine pêşiya hevalê xwe. Ji bona hevalê wî neyê şehîd kirin. Buyerên wisa , kêm nînin. Çarna jî mirov ji xwe pirs dike;  mînakên wisa di cîhanê de hatine dîtin? Ez bawer nakim ku gelek bin. Erê, ew parvakirin hevparî, evîn me li ser niga dihêle û bi ser dixê.

Bi derbas bûna her katijimêrê re, heyv jî diçû. Çarna jî heyv di nav ewrên rêş de winda dibû. Û şev tarîtir dibû. Tenê li ser esîman stêrka bedew xayadikir. Heyv û stêrk asîman gelek geş dikir. Lê liva ewran, dida diyarkin ku mewsim tê guhertin. Guhartina mewsim dihişt ku, di hindirê me de jî guhertin were çê kirin. Guhertina hatî çê kirin, reng veda bû li ser hevparî û nîqaşa me. Sohbeta me ji bona azadiya evînê me pêşdixist. Bedew bûna hûndirê me, bi zelal bûna rastiya ku mirovatiya me eşkere dikir. Her hevala diaxifî bi hêvî û coşek mezin hev guhdar dikirin. Hevpariya parvakirinê bi dilekî kûr me hev hest dikir. Ev hestên me yên ku parvakirin didane nîşandan ku pira pêşerojê bû.

Hêdî hêdî şev perdeye xwe digirt. Waxtê xewê hatibû û parvakina me xewê ya şêrîn biribû. Ava zelal diherikî her du milê ava gihabûn hev û diherikî. Ew av bi dengê senfoniye sohbeta me sekinan dibû. Wekî xewna me ya bi kûr, bi êvarê ra bûbû yek û ji bona biratiya Gelan diherikî.

**03-Nîsan-2004**

## DÎROKA HARAN Û DAYÎKA ÛVEYŞ

Dîroka Urfa dixemilê bi baxçe zêrîn. Ya ku baxçe gulên ya bi renge bihara. Bi ket dayîna mirovatiye, aj da bereket xweza ye. Dîroka Urfa gelek xale xweye cur bi cur heye. Lewra jî kûltûra Şahristaniya Neolotîk reng veda  ser Urfayê. Û ava kutred ya li ser Dicle Ferat bi hezara mirovatî bi jiyana xwe hembez kiriye.

Haran Şahristaniya merkeze ya bi Bajarê encame ya li ser lekolîn a dîroka veşartiye. Ango Deşta Haran bin azmana ya bi stêrkên ya xemla xaka mirovati bû. Ev axa bereket bûbû varê Neolotîk ya bi xwedewana.

Evsanê Urfaya, yên ku cem gel ten gotin; mînakên Nemrut dixest Hz Îbrahîm ji bavejê nav agirde. Dema Nemrut Hz Îbrahîm ji tavajê nav agir de, hinge agir dibe  gol û tije masîyên dibe. Dî van roj de hate roja îro, ev gol  kutsal te dîtin. Navê gola ji dibê Gola Anzixa. Ev gol ji hertim bi Dîrokî te nasin û tim gel ji pere xwe taveşîn nav Gola Anzixa ye. Lewra ji Gola nav masîde nayên xwarin. Haranê de gelek beyxamber derketine hola. Vêca; Urfa bûbû ware beyxambara. Lê belê wê deme ji tişta dihat xwestin ji, zanyarî mirovatiye bû. Dîrokê de care yekemîn ûniverstê bi nava Haran hat ava kirin û zanyarî ye betir beşket. Ango; bûbû welatê êvîna a Rojhilata Navîn.

Bi ware Haran de, Dayîka me ya delal, Dayîka Kûrdistana şirin jiyan dikir. Çavên ya bi belek mizginiya te dayî cîhanê. Ji ber ku deşta Haran bê av qelîşî

bû û benda mizginiya fikiyê Neolotîka a Şahristaniya jine bû. Deşta haran bi hêvî kî xurt benda zarokî avdana xwe bû.

Ti sanci bê êş nabê. Her êşekî de mizgîni ya zarokekî heye. Dayîka ûveyş hezkirên xwe ye keyfxweşî barandin. Bi awazên strana dilşadiyê û hesreta axîn bi deng veda li ser axê bereket. Deşta Haran bi tîna bihare de bûbû sed dilopek av. Ronî bû şev û mezebotamya maç kir Rûye zarokê û Haran ji Dayîka ûveyş hembez kir.

Şevka TAVA wê herder ronahî kir. Bi penûsa dîrokê ev roj bi nava ABDULAH hat nivîsandin. Dayîka Ûveyş hemberî zaroka xwe keda sala ver zarokê xwe da. Bi taybetî Dayîka Ûveyş zaroka ya dîrokê , bi ava zelal a ku Dicle şir vexar û ava Ferat ji gidayê xwe mazin kir. Urfa merkeza zanyarî ya mirovatiya a beyxambera ya esasî bû. Di vî warî da Dayîka ûveyş piştî Hz Îbrahîm û Hz Muhamed beyxambere kî din ji anî ser rûyê dinyayê. Ev pexamber ji nîşana sembola îro yê.

Lê bêle sala 93ê meha 11Nîsane li Adana Dayîka me Ûvêyş bi stêrka bi xatir ji me xest. Rûye veye mîna heyv ticarî ji bira me nace. Lewra ji Hozana helbestên bi nava Dayîka Ûveyş hat gotin:

Tola sala ya bi tariya deh hezar salan îro Kurd deste xwe rakiriyê hemberî nehekî yê. Di vî warê de xala herî girîng jî eve ku bê barûd û xwîn naxwazin. Ango; gelê Kurd xwe gihandiye zanistiya rasti ya bi kok û rewşa xweya esasî. Lê bêle dixesya dayîka Ûveyş ji ew bû ku, heya ku pirsgire ka Kurd nayê ça-

reserkirin û gelên Kurd negije mafen xwe yên azadîye de mirov nikara Demokratîkbûyina behsa wê bike. Dixasiya tim dayîka ji ewe ku Rewşekî hemdemî û Demokratîk…

**10-Nîsan-2003**

## EM TÎRÊJÊN AZADİYÊ HEMBÊZ BİKİN

Her çiqas di dîrokê de bedêla xwedî derketina li ked bi dilêşî jî hatibe dayîn, lê belê di encama hemû bedêlan de serkeftin û guhertineke dîrokî hatiye pêşxistin. Rosa Lûxenburo, Clara Zêtkîn serkeşî ji dîrokê re kirine. Lewma jî bi agirê azadiyê ku berdan bedena xwe xwesti li keda xwe xweyî derkevin. Lewma jî ew bûne sembola îro. Xala herî girîng jî ew e ku îro di her 1ê Gulanê de ew roj bi çalakiyên ked-karan tê pîrozkirin. Tevahiyê cîhanê wê roja girîng bi dildariya evîna xwe pîroz dikin.

Di hemû şoreşan de jinê bi agirê xwe yê aza-diyê ve cihê xwe girtiye. Hinan li karxaneyan, hinanî jî di navbera çar dîwaran de li zindanên tarî bi vê agirê re xwe yek bûye.

Tu caran bergîranda keda wan nehatiye dayîn. Mafên karker û kedkaran ji aliyê çîna serdest ve ha-tibû xwarin. Ji bona vê jî di sala 1957an de li Febrîqa Şîkargoyê jinan dest bi protesteyê kir, mafê xwe xwest û xweyî li keda xwe derket. Bi hêjmarek zêde jin(126 jin) xwe di febrîqê de agir berda bedena xwe.. Ev çalakî, bi pîrozbahî û tevlîbûna rengê jinê re îro ji her demî zêdetir tê xemilandin.

Ji ber ku jin qelha çînî a bindest e, dibe bingeha esas ya hêza karkeran. Karker û jin di gelek xalan de têne cem hev û gelek taybetmendiyên wan yên weke hev hene. Ango jin, xulikdarê ked e û bi taybetî sem-bola yekemîn yak edê ye. Jin her tim xulikdara avabûna jiyanê bûye û mirovahî di dergûşa jinê de

mezin bûye. Keda wê gelek mezin û dîrokî ye, lewma jî dibe serkêşa jiyana nû.

Nêzîkatiyên ku li hembêri çîna karker tên pêşxistin berjewendî û bolîtîkayên serdestan diparêze. Lewma jî tê xwstin ku sedsala 21an li ser vê esasê were sazkirin.

Emperyalîzm bolîtîkayên xwe yên li ser jinê hîn bêhtir kûr dike. Ango; bi rêya Medya jinê weke meta bikartîne û girêdana wê esas digire. Ji bona vê jî pêwîste çînên bindest û karkeran hemû di sedsala 21an de têxe nava bûhran û nakokiyên kûr.

Nêzîkatiya Emperyalîzmê ya li ser azadiya jinê li ser bingeha têgihîna ji kesayet re biyanî hiştinê pêş dikeve û ev bişêweyên tenik tê meşandin. Lê belê jin bolîtîkayên pergalê baş naskiriye. Ji bona vê jî pêwîste serkêşiyê ji karkeran re bike.

Wê demê dê karibe rûyê pergalê yê veşartî derxe hole.

Li Kurdistanê pêwîstî bi ji her alî ve lekolînên li ser jinê heye. Di gelek waran de jin bûye bingeh û sedema guhertinên muezem. Jinê mora xwe li guhertin û veguhertinên Kurdistanê daye. Ev rewş li gelek welatan jî bi vî awayî ye. Lewma jî di 1ê Gulanê de divê em dîsa bibin pêşkêşê guhertinê.

Jinên li Ewropa hîn zêdetir dikarin tevlî 1ê Gulanê bibin. Ji ber ku potansiyelekî gelek mezin yê jinê heye. Bi vî awayî dikarin bolîtîkayên emperyalîzmê yên li ser jinê bê tesîr bikin û Ewropa bi rengê jinê ji nû de bixemilînin. Pêwîste Tirkiyê jî li ser esasê pêşxistina demokrasiyê mafên wekheviyê yên karker

û çînên bindest nas bike. Jinên Kurd û Tirk bi çareserkirina pirsgirêka Kurd dikarin xwe bigihînin rêxistinekî hîn xurttir û di çalakî û pîrozbahiyên 1ê Gulanê de pêşkêşî bikin.

Pêwîste em tîrêjên azadiyê yên ronahiyê hembêz bikin.

**29-Nîsan-2003**

## HÊVÎ XWEŞİYA JİYANÊ YE

Hêvî ji bo mirovahiyê gelek girîng e. Rewşa cewhera mirov û rastiyê ronahî û aşkere dike. Çawa ku ji bona gulê av pêwîst be, wisa jî ji bo mirovan hevî pêwîst e. Hêvî wekî avekî zelal di hundire mirovan de ye. Hêviya mirovan bi xitabet, parvekirin û hezkirina ku ji bona yên li hemberî xwe didin nişandan diyar dibe. Bingeha hezkirinekî rasteqîne jî bi vî awayî dertê der.

Hêvî, rêka rast ya serwextbûna hîsen ku jin jiyan dike ye. Ev pêwîstî bi awayên cur bi cur xwe dide nişandan. Hinek caran bi nivîskî tên derbirînkirin û penûsa xwe, parçeyek ji hêviya dile xwe, li ser lênûsan parvedikin. Hêvî, parçeyek ji jiyana yên xwedî armanc û li rastiya azadiye xwe digerin e.

Mirovekî/ê bê hêvî, wekî ku di jiyanê de bê fikir û ruh e, mirî û bêhêz dimîne. Tama xweşikbûna zindîbûnê nabînin û di jiyanê de nikarin tu serkeftinî bikespînin. Mirovên bê hêvî, di jiyande tim aciz in û di nava pergalê de tune dibin. Ber bi terediyekî kur ve diçin ku asta herî qirêj ya di jiyanê de ye. Û bêviyan dibin. Ji jiyankirina azadiyê dûr dikevin. Weke gulên çilmisî dimînin û ber bi zuhabûnê ve diçin. Lê mirovên bi hêvî jî mîna gulên rengîn in û behna xwe didin jiyanê. Dê her tim xwedî serkeftin bin.

Hêvî bingeha xwe ji fêhmkirin û zanîna xwezayê û avabûna raman digire. Weke zindiyan, hêvî jî bi hêza fikir geş bûyê. Bi vî hêviyê, bi bikaranîna axê û serwextbûna pêvajoya jiyanî, jinê dike

avakarê jiyanê. Dereceyekî bilind dide jiyanê û bi axê re dike yek. Ev taybetmendiya bihêvîbûnê dihêle ku cewhera winda ya jinê bi vî awayî derkeve zanabûnê. Jin, bingeha afirandina çandî ye ku çand jî şêweyekî cur bi cur hêviya jiyanê ye. Kurbûna hestên jinê ya li ser esasê rastiyê, heya îro veşartî mayê. Îro jî pêwîste ku hêvî bi çoşa jine û bi renge jinê derkeve hole. Bi vî rengê hêviya xwe destê xwe direjî mirovên bêhêvî dike. Ji bona çareserkirina pirsgirêkên mirovên bêviyan, dîsa vegerandina wan ya rastiya dîrokê ev pêwîst e.

Hêvî mirovan vediguherîne xweşikahiya zarokatiyê ku tu kesî dest nedayê. Tu xweşikbûn ji xweşikbûna azadiyê ne xweşiktir e, ango nabe weke xweşikbûna jinê. Ev bêhna hêviya ku li ser evîna azadiyê belav dibe, eşqa azadiya dildaran û hêviya mirovên çav li rê, dibe weke gulebênekî û ji bona mirovatiyê bejna  xwe bilind dike. Ber bi rojê ve rê diçe. Lê gul, bihêvî û xwesteka azadiyê, hemû mirovan hembêz dike. Lê di cihê eş û janan de, bila esîman tije hezkirin û hêvî bibe.

Ev çalakiyên ji bona aştiyê ku li her deverê cîhane tên pêşxistin, bihêviyekî xurt û bi şêweyên cur bi cur bek tên. Ev çalakî li hemberî şer tên pêşxistin. Zarokan jî digot “ev şer ji bo diravan e, lewma jî ev diravên ku me kom kirine, em dixwazin bidin wan.”

Zarok, ciwan, kal û jin tev de di nava çalakiyan de cih digirin. Bihêvîyekî xurt li dijî şer radiwestin. Bi van çalakiyên xwe, peyama xwe ya şermezarkirinê ji DYEê re dişeyînin.

Di cîhane de tu kes naxwaze ku şer were kirin. Hêvî û xwesteka cîhanê serwerkirina aştiyê ye… Bi hêviyekî mezin em dibêjin "ji şer re na, ji aştiyê re erê."

**03- Gulan-2003**

## KULÎLKA AŞTİYÊ, SEMA

Sema YUCE berdewankirina xeta Hevala Zîlan e. Ew xet jî xeta azadî, hêvî, viyan, aştî û hêza jinê ye. Sema YUCE bi van taybetmendiyên xwe îro di dilê bi milyonan mirovan de cih girtiye. Ji ber ku wê zordariya li ser jinê dihat pêşxistin bi agirê berda bedena xwe veguherand hêza azadiya jinê. Ji bona wê jî ketiye dilê mirovên ku kesera evîna azadiyê dikişînin. Di 17ê Tirmeha 1998an de bû agir û ala sor, kesk û zer bû nîşana berxwadena zindanan û roja jiyanê. Em jî wê roja jiyanê ji bona gelên cîhanê pîroz dikin û bejna xwe li ber şehîdan ditewînin.

Sema YUCE keçeke Kurd bû, lê belê malbata wê malbatekî arîstokrat bû. Lewma jî di hundirê pergalê de jî nêrîtên Kurdeyatiyê dûr hatibû mezinkirin. Bi vî awayî jî dixwest çanda xwe nas bike û fêrî rastiya xwe bibe. Gelek hewl dida ku rastiya xwe bibînê. Pergalê pê re li gorî xwe rastiyêk dabû avakirin, ji bona vê jî li dijî pergalê derket. Ango; dixwest wê rastiyê di şexsê xwe de mehkum bike. lewma jî di nava lêgerîneke bê sekin de bû. Li dijî wan êşên ku bi hezaran salan di hundirê wî de hatibû çandin, di şexsê xwe de ketibû nava şerekê çînî û hewl da ku xweşikbûna zîhniyata nû derkeve holê.

Sema YUCE rastiya xwe û rastiya zordestiya zilam a ku 5 hazar salan li ser jinê û jiyanê zordestiya xwe didomand nas kiribû. Bi taybetî jî koletiya ku li ser jinê hatibû pêşxistin. Lê belê gelek mirov jî hene ku koletiya li ser wan tê pêşxistin nabînin. Sedema vê

jî ew e ku jin bi rengê xwe tevlî jiyanê nebûye. Pêwîstî heye ku jin bi rengê xwe, xeta Xwedavendên Îsîs, Demeter, Înana bimeşîne.

Pêwîste ku tu jin zordarî û neheqiya ku li ser jinê hatiye pêşxistin nepejirîne. Sema YUCE li dijî vê derket û bi taybetî jî polîtîkayên dejenekirina di zindanê red kir. Bi viyan û hêvî yekîtiya gelan esas girt û çalakiya xwe li dar xist. Di encam de jî bû Kulîlka Aştiyê û çavkaniya Rojê. Di zindana tarî de, rûyê Sema YUCE wekî heyva çardeşevî ronî da. Jîn bi daristan û gulistanan ve hat û bi ronahiya YUCE kulîlk bişkifîn.

Sema YUCE vegera jiyanê û rastiyê pêk anî. Di dilê Kurdan de jiyenek nû afirand. Ji bona jiyeneke nû bû cangorî. Ji mêjiyên dîl hatibûn girtin û destên zincîrkirî re bû mifta jiyanê. Ji nexweşiyan re bûbû derman. Ji jiyena bin dest re bû çareserî. Xeta Birêz OCALAN fêm kir û di jiyana xwe de pêk anî. Ji ber ku di xeta Birêz OCALAN de azadî û çareseriya demokratîk hebû. Fêmkirina xeta Sema YUCE fêmkirina xeta Birêz OCALAN e. Di encam de jî pêwîste ku em xwe li gorî xeta YUCE, bi zîhniyetek nû ji nû de bidin avakirin.

Li ser vê bingehê emê zîhniyeta nû û xeta Sema YUCE di meşa xwe ya azadiyê de esas bigirin. Heke zîhniyet were guhertin, dê aştî û demokrasî serwer bibe.

**11 -Tirmeh-2003**

## Jİ BO DAYÎKÊN MEYÊN KURD Û TİRK

Rojekî nû, sibehekî nû... û bi rojekî bi hêvî dest pêkir. Pêvajoyekî ku di çavên herkesîde hêvî di baber tikes hêdî naxwaze guhdarî şer bike û ne jî dixwazin hêdî di kabosên şer bibihîsin. Lê dîsa kabos li Tirkiye diger e. Piştî vêqas êş û jan ê dîsanê di şerde însan tên kuştin “bila şer êdî bisekine.” Ma hêdî ne demê wêye?

Bila hêdî ne dayîkên leşkeran nejî yên gerîlayan bigirîn, bila dil neşewitin. Du gelên mîna bira, dema demokrasî û aştiyê tê û derbas dibe. Dinava xaka Mezopotanya yê de û Anadoloyê de dayîk li benda aştiyêne û bi dengê jinê û hêviyê wê yên bibe bersiva demê. Bi bêhna heskirina di cewherê her dayîkên aşitiyê de evîn, edalet, xweşbînî, rûmet, azadî, aşitî demoktrasî cihdigire. Aşitî xweşikbûna van di cewherê dayîkan de veşartiye. Xweşikbûna avakirina jiyanê û dayîkên me zor û zehmetiyên herî bi êş kişandiye, bi singên xwe li ber rûmeta jiyanê xwe feda kirine.

Dayik bûne çiroskên azadiyê. Yên ku herî zêde êş hîskirine û jiyan kirine, li beram berî kevneperstiyên paşvero rawestiyane, dayikên mene. Wan nêzîkantiyên çewt qebol nekirine, û xwe tevlî xebatên şev û roj ku xwe fedayî xewên şevan kirine. Dayîkên me bi germbûna miha Tîrmehê re û jinên dilên wan de hêvî heye bi dostanî û biratî tije kirine ma dîsa ne dayîkên me ne? Li Amedê, Sitembolê, Enqerê h.w.d. Bê sînor li keviyên soqaqan bi dengê azadî, şox û şeng bandikirin ma em kîne? Bi hestên xwe yên bê tirs rebertî dikirin dayîkên me.

Dinav çar dîwarên girtîde rewşekî ku nikarin serê xwe rakin, hêdî îro jinên Kurd yên çalek ketine rewşekî bi vî awayî û cewherê xwe di parêzin. Dinav du gelên birade û aşitiyê de şerê qirêj bidin sekinanan din û bi dilê dayika gereke vejîn werekirin.

Lê belê ev tinê ne bese: Bi vêra xuluqandina şoreşa jinê avakirin û mora xwe li ser dîroka bide lesytandin. Encex di peymana civakî de jin gavên nûjen bavêjin û divê çerçevê de pêwîste rolekî girîng bileyzin. Ji bo vî şerî bide sekinandin, pêwîste dayîkên Tirk jî dengê xwe bilind bikin. Dinav dengên dayîkên Kurde, aşitiya, wekhevî ku di dilê wande pêwîst dike bidin eşkere bikin. Em dixwazin dengên dayîkên meyên Tirk jî bibihîsin. Ji bo zarokên xweyên winda kirîn li ser wana hêdî bila rûndikên çavên xwe paqij bikin. Ji bo pêşerojekî zarokên xwe bi şahî xwedî derkevin, encex bi aşitî û biratîre derbasdibe. Mirovên meyên mîna Heqî Qerar Kemla Pîr jî zarokên (evlat) dayîkên meyên Tirk û Kurdin. Dibêjin em hertim li gel aşitiyêne û herdem tînin ziman. Dayîkê me naxwazin jiyanekî bê barûd bê şer û bê xwîn dinyayek....pêwîste dengê xwe bi herkesî bidin bilav kirin. Bi keda her dayîkîkî ku xwêhdan rijandiye û ji bona pêşeroja zarokên xwe, xwedî derbikivin. Lazime sîstema qawosê hati avakirin ji nûde were avakirin û jê derbikevin. Newisabê emê dinav zihniyetiyên paşverode bi fetisin. Eger guhertinên erênî neyê çêkirin yên dinav rojên tariyê de feqîr bi mînin. Encex bi guhertinên zihniyete kî nûjen were derbas kirin. Ji bona wê di her çandê de,

her deverê de (yöre) hemû dayîk û jinên me di vê zihniyeta nûda gavên pêşketî bavêjin.

Pirskirêka Kurdan pêwiste em hemû piskirêka xwe bibînin. Ew pirskirêk newe çareserkirin rondik tucaran nayê paqijkirin û yê dilê me bi êş bimîne. Û şer ticarî nayê bi dawî kirin...

Xweşikbûn, azadî, şahî rojên bê şer mafê hemû dayîkan me ne. Ev encex civakekî bi demokratîk mûmkûne ji  bona vêjî em dibêjin civakî bê şêr gengaze....

**15-Tîrmeh-2003**

## EVİNA JİNÊ HESKİRİNA MİROVATİ YÊ YE

Evin guhertine, evin heviye, evin bingehê azadîyê ye. Evin heskirina bingehê nove jiya veke nûyê di baxê hebû vêde û divê jiyanêde şaxê heskirina mirovatîyê û azadîyê û heye. Ji boku mirov dikarîbe armanca xwe pêk bîne. Evi pê gereke, û dibe pêwîstiya jiyana wî. Eğer evîn di nava civata mirovtiyê de nebe, wê nikaribe sinif û her rengê newek heviyê dinava xwede çareser bike. Û her weka wê mîna mirovekî bê hêvi di taritiya xwede wê bimîne, û her tiştên xwe bi şox û şepal winda bike. Ji vê jîpêviste kuvê evina xwe bi derdorê xwerê jî paybike. Û ev paykirin di rîyên nîqaş û fikirde wê rêyên pêk ve çûnê mezin veke. Û ev ji bo despêkirina riya evînê gereke.

Mirov dikare ronahiya xweşik bûna xwe di tîrêjên hesreta vê civatêde derxe holê. Û bi vî awayî mirov wê tim were heskin û hurmet jêre were nîşandan. Ji ber ku tu çiqasî çav kaniyekî mezin be ji bo evîne wê her ji ava teyî zelal wê were ve xwerin. Lê demê ku çav kaniya te bivi çiqe wê bi qelişîne erdên şînbûyî. Û bi vî rengî wê sahiya evîna derdor jî namine. Û mirin di kêferata xwede wê jiyan bike. Û her diçe ava çemê zelal şîlo deke û danava rengê xwî çikşînde wenda dibe. Lê dema ku vîna xwe veda dinav seqem û tarîyê de wê bibe avek zelal û gulek di bahar emrê xwe şin dide.

Evîna jinê di pêva joya despêka xulixandina jiyanêde veşartîye û bi çêkirina zarokêrê ev evîna veşartî bî ronakbû. Ji ber kû evîna wê gelek kû û buha ji xweza û zarokre hebû. Ji bo vê jî ji bibû peçak navenete ji xwezayê perçak tîrêjên rojê, dilimek ji tava heyvê û çirûskeki jî stêrkak bibû. Û pêre bibû yek, bi kedîkirina hevwana re û çandinina ya axrêre. Pêre bingehê evîn û hevî yê xwe ji mirovati re danî.

Jin çawa heskirina xwe ji zaroka xwere dida nîşandan heskirina xwe ji welatê xwe şêyri dide nîşandan. Pakbûna axê mîna pakbûna henasên zarokekî ku jî nûve rûwê jînê dibîne, û girêdana jin û axê dibe mina girêdana bendê navika zarok û hembêza da jîka germ mi. Zaroka ku mîna dar bi evînê hatibe avdan wê mîna gulekî sor di baxê evîna xwede hatibe şîn kirin. Jî ji bîr bike û girê dana xweya pir bingehî bi axa welatê xwere heye û bernade wan zeviyê ku dilop bidilop ji xwêdan arila xwe av daye.

Mirovên bi evîn pir bi sebrin ji bovêjî jin bi evina xwe henberî zor û zahmetî çareserî dike û ti bendû qeyd nikarin xwe li hember pêlê evîn û heviya wê bigrin. Û bi vî rengî jî bûye xwedî armanc. Eger ev evîn û xwestek û hêvî nebe mirov nikare jî bı xwe û jinên dinjî azadiyê bişopîne. Cewherê jinê nêzikî evineye û evina seran ser û bê bax ser keftinê naynê û insan bê rûmet û bê hêvî dihêle û civat di eleqet xwede winda dike. Evîn dibe kopriya ku gemiyê rastiya mirovan lê bisekine. Û rê li henber guhertin û lê gerînan vedike. Pir muhum nîne rengê evîn ji mirovekî tim be yan ji Ereb be, yanji Kurd be, û çireş û sipîbe kû insan

dikreribe bide hev. Û din bin baskê evina jinêde bifirin ta ezmanên aşitiya mirovahiyêde.

**20-Tirmeh-2003**

## ŞEHÎT ÇAVKANİYA TİRÊJÊN ROJÊ NE

**“Partiye me partiya Şehîda ye.”** ji bo diwan rojekê hemdem were afirandin, dinav refê gerîla de gelek şehît hatine dayîn. Wan ew nirx û behemên hêja afirandîn. Bi dilekê dilawêr ji bo jiyanek nû pêşbixin canê xwe fedakirin. Bi qahramantî, dilsozî û bi dîlpakî xwe kirin rê ya Demokrasiyê. Bi vê awahî bune çavkaniya jiyane nû. Xweşîkbuna wan her tim reng veda li ser jiyana rûmet. Pîvanên wan yê ku li ser mirovan bi bandor gelek mezin daye diyarkîrîn. Bi wan encama hêz, hêvî dide li ser rûyê mirovên azadixwaz u herdem dibe bingehên naskirina nasnama xwe, ya ku rastaqîn. Tu cara “Şehît namirin” hertim ronahiya wan dibe bingehê nûhbûna me û doza wan yê ku bi rûmet dibe hêz...Vegotina şehîda gelek giringe, ji ber ku keda şehîdan em îro gehiştine pêşketinên herî bilind. Ser binyadî kedkarbuna wan îro şoreşa me xwe gehand nirxên mezin. Zorî û zehmetiyên jiyankirin tu carî nayê ji bîrkirin. Weke Serokatiya Partî digot; “ji bîrkirin îxanete” ji bona wê pêwîste ku xwedî derketina şehîdan... ji ber ku rastiya xwe dur ketin, bi vî awahî inkarkirina dîroka xwe ye.

Her şehîdê me, ronahiya çavê meye û dilopên xwîn, dilê me de birîn dike. Ew rastî ji heye ku hemû hevalên şehît, ji parçekî ji canê me ye, hesreta dilê nûde jiyanê ye. Êşa hezar sala li ser zimanê me tê gotin, lê belê çiqasî bibêjim wê kêm bimîne. Ji ber ku ew baxçe şehîdan, baxçe hebûna warê me ye. Hemû şehîdê meli gorê xwe xwedî nirxekî taybete û hertim

di dîrokê de rolekî gelek mezin daye avakirin. Dinav wan şehîdên bi rûmet delabuna xwe tevlî goristana rengîn bûn.

Vegotina heval Erdal gelek zehmete, ji ber ku birîna dilê me, gelek zehmete ku êşa dilê xwe bînîm ser ziman. Her dem daxwaziya wî ew bu ku pergalekî nû bide runişkandîn û bi zanyarî dilpakiya xwe tevlî jiyanê dibû. Girêdana wê heskirina jiyaniye, weke kulîlkên bi rengên biharê bû. Nirxandîna wî weke daristanekî şînahiya kesk, weke xezalekê dilpak, weke kevokên azad dewlemend bû. Ji ber ku mirovek xwendevan û bîrevwer bû. Her dem zanabûna xwe bi hevalên xwere parvedikir û pirsgirêkên ku dihate jiyankirin bi nêzikatiyên îkna, xoşewistî çareser dikir. Ew astengên dihate jiyankirin ji bo xwe kelem ne didît ku pêşiya serkeftina wî bibe astengê. Bi wan nêzikatiyên xoşewîst, her dem hevalên gel wî hûrmet û rêz dida nîşandîn. Wî rengî Heval Erdal, rengê azadî û kêfxweşiya dilê xwe dida jiyanê. Rûyê wî yê bi ken, dilê wî yê germ, xwe nêzikê her hevalan dikir, biçûk re biçûk bû, mezin re mezin bû. Bi giyanekê hêvî hertim li mirovan meyze dikir. Ew xweşîkbûna dilê wî xweşîkbûna Serok APO bû. Hawl dida ku jiyana azadiyê pêşbixe û bi aşqê azadî li tevlî jiyanê dibû. Li hember mezinbûna dilê wî, pênûsa min gelek qels dimîne, û mîna hesretekê dilê min birîn dike.

Heval Erdal gelek dirêj dinav refên gerîla xebatên herî zor û zehmetê daye meşandin. Rêberekê weke piling, şêr û pir dilawêr bû. Yê ku bin denetima wê dima, her dem dilê wan xwînsar bûn. Ji ber ku

tecrûbeyên şer û jiyanê gelek bû, ji bo wê jî her mirov ji bawerî dida Heval Erdal. Li dîroka rengîn, li Botan ê li berhemên Cûdî a dewlemende Heval Erdal demek dirêj li Cûdî mîlîtantê kiribû. Li dijî hêzên kedxwar û kevneperest şerekî gelek dijwar dabû meşandin. Bi ala sor berxwedaniya li ser Kela Kor dabû meşandin. Tirsekî gelek mezin ketibû dilê kedxwara. Qahramantîya berxwedaniya Heval Erdal çavê dijmin tirsandibû. Bi vî awahî dixwest ku ji bo jiyanekê nû azad, li hertim dijî kevneperest-tan şer dikir. Bi tola sedsalên ku kînên qirêj, bi rengê zelal ronahî bike, hewlda ku Aşiya rengên pêşbikeve.

Piştî Cûdî, ji bo xebatên ramyarî derbasî Ewropa bû. Li Ewropa xebatên gelek mezin da meşandin. Her dem dikete nav lêgerîn û bîryarbûnûkê bi bingehîn. Ew mantîqekî pergala civaka desthilatdar û rola xweşiyekî ji hezar salan heta roja me ya îro...li dijî wan xwe gehand azadiya herî bilind. Ji bo rizgarkirina tevahî netewîn bindest xebatek gelek dewlemend di domand. Armaç û hedefa Heval Erdal bi afirandîna xweşîkbûnû wehhevî û yekîtiya gelan binyad digirt. Ew jî di bû sedema avakirina jiyanekî bi rûmet, azad û dibû hêza jiyanê. Dil fireh û dilgeşiya Heval Erdal weke zeryayên rengîn bû. Lê belê karekterê ku li pergalê desthilatdar girtî, li hember vê pergalê dixwast bidomîne. Lewra kesayeta xwede guhertinên bingehîn çêdikir.

Akademiya Mahsum Korkmaz de perwerdahiya Serok APO dîti bû. Perwerda Serok APO dibû sedema zanabûna civak û dihişt ku guhertinên binyad were

çêkirin. Bi wan encama kesayeta heval Erdal gelek bi hêz bibû, hêza perwerda nalo gehîştibû zanabûna ilmê Serok APO. Bi vî awayî pêşengiya gelê Ewropa dikir. Gelek fêrî zanabûnû dîrokê kiribû. Nirxên xwe yên ku bi wate û pîroz diparast. Ew keda li ser gelê ku, bibe şervane azadiya Serok APO...

Di sala 2003an de, carekî din vegeriya çiyayên ku bi salan bûne cihê ked, nirx û watedayîna jiyana mirovan. Zor û zehmetiya ku li serê çiyê kişandî tev jê re bûn hêza jiyanê. Di dergûşû Mezopotam-ya de, li rastiya xwe geriya bû û naskirina bû. Di-xwest ku ew dergoşa mirovahî bi Gelê Cîhanê bide naskirin. Ji ber ku ew xeyalên ku hatî windakirin ronahî bike. Ango, Heval Erdal şox û şengtiya xwe tevlî her karî dikir. Hertim digot; “Armanca jiyana me ji destpêkê heya niha ji bo gelê me ye.” bi gotina Heval Erdal: em jî dixwazin wann roja bikin, roja yekîtiya Cîhanê.

Çavkniya jiyana me ya rûmet Hevala me ya de-lal Xelat...1997 an li Başûrê Mezin li tevlî refên gerîla dibe. Jiyana xwe ya ku malê gelek bi êş û zehmetî kişandiye. Li demek kêm ji li cem hêzên KNK peş-mergetî dike û dibe pêşeng. Lê belê ew jiyan wê têrne dikir û xwe dûbare dikir. Ji ber ku ji dîroka jinê hatibû dûrxistin. Ew pergala hatî avakirin ret kir û tevlî doza azadiya jinê bû. Li ew êrîşên herî dijwar li ser jinê ret-kir. Bi wan êşên berê, êdî dixwast lêgerîna azadiyê li ser kesayata xwe de bi domine. Bi taybet ji alternatîfa bi riya nasnama jinê, bi rastiya dîroka xwe...

Rûkena ku li ser rûyê heval Xelat; hertim coş û moral dida mirovan, heskirina wê yê ku jiyanê hertim

dibû sedema hêvî dibarnd. Bi tîrêjên rojê rûyekê bi ken **“Bayanî baş”** digot. Bi erîniyekê dilpak heskirina hevaltiya xwe dida nîşandan. Li ser vê binyadê bi gîridanê hevaltiyek her dem digot; **“Heval Giyan heskirina min a ku hevaltiya evîna min dide diyarkîrîn.”** Tu carî li ser zimanê heval Xelat **“Heval Giyan”** kêm nedibû. Fedakariya wê her dem bi dil bû. Rola wê li ser hevaltiyê bi bandor bû. Dilê we ya ku dilpakiya zaroktiyê û dilovan, xoşewist her dem dibû sedema heskirana wê. Îlke û pîvanên ku ret, bi qabûlkirina jiyana herî rast diparast. Gidêdana heval Xelat li ser bingeha jiyanekê bi rengî jinê hertim dixwest. Her dem hesreta dilê wê perwerda PJA bibîne. Ji ber ku kilîta çareseriya rasteqîna azadî wir didît. Ketibû di nava lêgerînekî herî rast. Li ser binyadek jinekî azad. Hesreta wê hertim dilê wê de mabû. Hewlda ku xwe bigehînê jinekê xwedavenda asta herî bilind. Xweşîkbûnû heval Xelat, xweşîkbûna jiyana wê bû. Bi coşa dilê xwe pêşniyar kir, ku biçe li gel hêzên Artêşê. Bi dilbûnû xwe cihê xwe nav Artêşê cih girt. Tevlîbûnekî, bi aşqê azadiyê xwe tevlî jiyanê dikir û dixwest ku bîrdoziya jinê azad bike jiyanê.

Heval Erdal û Heval Xelat hûn nav mede çûn; lê belê dilê wê yê ku bi keyfxweş li ser cîgara me xwe jiyan dike. Tola wê ne bi çav tarî, bi zihniyetekî nû em ê tola sedsala rakin. Bi taybetî jî, bi motîfên sedsala nû, li ser erd û esîmanên şîn, bi navê şehîda em ê binivîsînin. Hemû şehîdê me xelata dilê meine û çavkaniya hebûnû dilê meine.

Ji azadiya jiyana me de, ewrên reş û tarî li ser roja 17 ê Tebaxê çavê me tijî rondik bû û keser di dilê me de tijî xwîn bû. Ji ber ku gola xwîn miş li ser Heval Erdal ketibû, gola dilê me birîn kir. Ew çarenûsû reş, em jî dixwazin vê rojê bikin roja kurdistan a rengîn û bi zanistiya ku, şehadetekî vî rengî...Heval Erdal; her dem min dixwest bi hesreta dîtîna we mam, bibû perçekî xeyalê jiyana min. Lê belê ew hesret di dilê min de man.

Pakrewan ji bo azadî, ji bo demokrasî pêşengî kirine, ji bo hemû gelên kurdistan ê, di heman demê de ji bo herêmê û xebatkarên Demokrasî, Aşîxwaz **hemû roja bikin roja Serok APO.**

**15-Tebax-2003**

## Bİ NASNAMEYA AZAD RE TEVLİBÛN Û XWEYİ DERKETİNA ZİMANÊ XWE YE

Piştî deme kî dirêj bi coşekî mezin rûmetên xwe ji bo xebatkarên Azadiya  Welat û Gelê meyên ku xwendevanê giştî ya dikim. Keyfxweşiya li ser zimanê kurdî em dîsa bi hevre pardikin.

Divê ku mirov zimanê kurdî bi ber fireh hîn bibe. Gelek sedem heye ku mirov bi zimanê xwe biyanî dibe. Bi sad salên ku hatî derbas bûyî, gelê kurd bi Nasname xwe hatiyê durxistin. Ji ber ku sedemên wan têne zanîn, beşê herî girîng jî ewe ku gelê  me zimanê xwe jibir nekiriye, lê belê dibê ku gelek peyv jibîr hatibin kirin.  An ji gelek peyvên din ji, mîna Tirkî dizanin lê wataya wana kurdî hîn bibin ji hene.

Ji bona xebatên  wiha jî, rewşa kê cîddî-asê divê. Divê ku derfên hebin mirov li hemû cihê welatên dewlemend bigere û lekolîn û lêgerina bikin. Ne kolîna berhemên nivîskî hemû berhemên nivîsî klasîk û a ji yên nûjen gerek bên vekolandîn. Mînakên hunermendan: helbestên wan ên mîna Elmedê Xanê, Meleyê Cîzrirî, Feqiyê Teyra, Cigerxwîn heta yên nûjen... ji bona zimanê wêjeyi ku di jiyana ronakbirî cihekî girîng digre.

Sedemên yekemin ji, rewşa civaka ma bandorekî îzolosyone pir zêde xwe dide pêş. Lewra; ev rewşa bûye sedem ku hertim zimanê dayikî durbikeve û bedêng biminîn û mahkumê tarîtî û zilmen bin. Her tiştên wan li gorî pîvanên zimanê cuda cuda tedê tê ditin. Li ser durketina zimanê dayikî pêwîste ku divê

mirov zimanê kurdî bi ber firehî hîn bibin. Tişta girîng jî divê ku li derve saziyên ku bi dersên kurdî were dayîn û xebatên bi vî rengî were pêşxistin. Lê eger sektandin cîdî çênebê, yê xwere nirxandinên cuda bine. Ji ber ku vê yekê civaka baviksalarî û çînên desthilatdar û baskên kevneperestan astengî derxistine. Ji bona wê jî edebiyata kurdî û zimanê kurdî dewlemendbûna xwe durketiye.

Tişta girîng xweyî derketina Nasname xweye, nasnama ji bû hemû gelê girîngiya xwe diparese. Nasname ji bo mirovên Tirk, Arap, Kurd, Elman Fars hwd. pêwîstiya xwe dide nîşandan. Li hember ziman cuda cuda pêwîste ku her mirov rûmetbûna xwe bide nîşandan. Lê belê dîsa jî nîzîkatiyên şaş û cewt xwe dide xuyakirin. Bi taybetî jî li hember zimanê kurdî nîzîkatiyên kevneperst xwe gelekî dide pêş. Li hember Nasname, çand, hunera gela pêwîstiya watedarbûyinê hewparî heye.

Pirsgirek ne tenê pirsgireka bi zimanê kurdî zagonî bûye. Pirsgirek li hember Nasnameya kurda nîzîkatiyên paşverû, li hember zimanê kurdî astengîkelem dibe. Ji bona wê jî zimanê kurdî milê siyasî, çand, huner, edebiyat de xurtkirin gereke. Xweyî derketinina Nasnameya xwe, xweyî derketina zimanê Kurdî ye. Li hember zimanê Kurdî nizîkatiyên awartin tên çêkirin; mînakên berbiçav hene. Hinek hunermend ji ber ku zimanê kurdî stran dibêjin tên awartin û neheqiyên rû bi rû dimînin. Ji ber vê neheqiyê û kelemên tên jiyankirin tikez qabul nake û bi wan nîzîkatiyan natirse.

Ew dîroka rengîn, ya hatî weşartin û bi rastiya xwe hatî durxistin bi politikayên izolosyona li ser gelê kurd hatî kirin, em êdî bi vî awayî qabul nakin û ber bi dawî yê, dibêjin.  Bi Nasnameya xwe ya rastaqîn, li her derê cihanê cihê xwe meydanên siyasetê de bikrin. Bi taybet ji nîzîkatiyên dewletên astengî çênekê û bi wan xala de rola xwe bidomine. Eger ku hîn bi pîvanên kevin de berdavam were kirin, di berbanga sedsala 21 an de gelê kurd gihîştiye rewşa zanyarî ya nasnameya  a azad, ji bona wê ji asteng nake û rêya xwe xeter nabîne. Pêşkêşkirina vî zimanî, ji aliyê wî yê têvel ji xwe re dikim armanc û bi nasnameya azad re tevlibûn, xweşikbûna dilê mirovane.

**08-Çile- 2004**

## AKADEMİYA ZANİSTÊN CİVAKÎ HAT ÎLAN KİRİN

**Bi navê** “ABDULLAL OCALAN AKADEMİYA ZANİSTÊN CİVAKÎ” **di 15ê Sibatê de hat îlan kirin. Bi zihniyeta nû, bi raman û fikrên dewlemend, dike armanç û hedefa xwe. Armanç û hedefa Akademiya Zanistên civakê (Abdulah Ocalan Sosyal Bilimler Akademisi) Siyasi û birdoziya re rêbertiya rasteqîn bide meşandin. Bi taybet jî ramanên Serok APO parastin û xebatekî rûmet bide nîşandan. Akademi cihê ku bîrewer û rewşengeriya demokratîk ya raste. Rola Akademiyê bi zanista Abdulah Ocalan ji jiyan û zihniyeta nû re rêbertî dike. Tişta girîng jî ewe ku di dîrokê de berpirsiyariya herî pîroz bide meşandin.**

Îro bi vî watayî îlan kirina Akademiyê gelekî girîng e. Ji ber ku 15 Sibatê azadiya Serok APO ji destê wî hate girtin û bi vî rengî ronahi reş kirin. Lewra em dixwazin ku bi îlme Serok APO, ramanên nû ku çavkaniya pêşerojêne dîsa bixin zayînekî jiyanî . Em hêvîdarin ku her tişt bi rengê xwe vegere. Her tiş bi zelaliya xwe xweş e û pîroz e. Lê belê barê bênc hezar salin, fikrên hest û zelalî bi hêzên desthilatdar ji holê rakirine ji bo van sedeman jî pêdiviya zihniyetekî nû heye. Li cihekî wiha herdem xwe re serkeftinên erênî wê bi xwe re bînê û avakirinekî rast wê bide nîşandan.

Nizîkatiyekî bi vî awayî li ser kesayatekî yê nû de bide avakirin. Dema li ser kesayatekî ew nêrîn bi

bandor bibe yê xwe re li ser civakî tesîrekî erênî yê bidomîne. Li hember dijminatiya herî xeter wê bibe alternatîfa yekem. Herwiha li ser bingehê tekoşîna siyasî, tekoşîna demokratîkbûna gelê Kurd dixwaze bidin rûniştandin. Lê belê li hûndirê Tirkiyê hinek hêzên rantxwar xwe didin pêş. Astengiyên desthilatdar û ketxwaran dibin kelem. Şûna pirgirêkên bi aliyên dîrokî û civakî hildin dest, lê belê pergal li gorî xwe her tişt dide meşandin û kesayeta mirovan de viyan ji holê radike. Û dibe sedem ku mirov astengî jiyan bike. Bi zanistiya Serok APO pirsgirêkên ku di civaka giştî de tên jiyankirin û bi mafên rast yekîtiyekî bide rûniştandin. Bi taybet jî mafên jinê tûnê kirine û bê nasname hiştine. Gelekî mînakên bi dil êş hene. Ji bo wê jî pirsgirekên civakî tên jiyankirin, em dixwazin pirsgireka çareser bikin. Êw Akademi wê bibe alternatifa nûhbûna Civakê.

Rola Akademiyê gelekî dewlemende û rola xwe cuda cuda yê bide nîşandan. Di hûndire Akademiyê de beşên cuda cuda hene. Ew beş jî wêje, felsefe, dirok, sosyoloji, Teoloji û siyaset cih digre. Ji bo Medyayê û Kovar, Rojname û hwd. li her derî nivîsên cuda cuda tên belav kirin. Ango; li ser cîhanê de ye bibe bandor. Nivîsên zanyarî cur bi cur tên weşandin û pirtûk, lêkolîn, tên nivîsandin. Armanç û hedefa Akademiya gelekî mezine. Rola navendeki dide pêş xwe û wê bibe çavkaniye îlme Serok APO. Berhemên nû, ramanên nû, herdem wê bibe sedema afirandina azadi, wekhevî, demokrasî û aştî.

*10-Sibat-2004*

## SİBATA REŞ Û TARÎ

15ê Sibata 1999an di dîroka komluya navnetewî a ku li ser Serokê Netewî Abdullah Ocalan hatiye çêkirin... Sala çaran ber bi dawî diçe û dikeve sala bêncan... Ew Kompluyên li ser Serokê Netewî Abdullah Ocalan hatî pêşxistin, cewherê xwe de li ser tevahî yekitiya gelan bû. Bi kesayata Serok APO nirxên ku dayî avakirin û mirovên ku jir û zana afirand û dixwestin çavê wan bi tarî binixumînin, lê êdî gel şiyar bûye û ketiye nav zanabûna rastiya jiyanê. Bi taybetî jî bi nîzîkatiyên pêvajoya guhertinê rasteqîn milê îdeolojî, siyasî komployê vala derxistiye Serok APO.

Sibata reş û tarî, dilê me êş kir û ew rojên ku berf, miş duman li her derî cihanê bilav bûyî. Parçekî ji canê me kêm bû û bi birînekî kûr li her derê me vebû. Ji ber ku Serok APO, qedera koletiyê û wendayî ber bi azadiyê ve zivirandi bû. Koletiya li ser giyana mirovan de hatî afirandin bi nêzîkatiyên xwe xwest rêka xweşikbûna jinê a neolîtîk bide naskirin. Ango; pênç hezar salan jin bûye kolê zilam, zilam jî bûye kolê sisteme. Bêguman civak bi rastiyên ku têde hatî ji durxistin ji cewherê xwe û jiyana mirovan jî bi kapitalizmê ya li ser civakê bandorekî qirêj didomandi ye. Lê îro Serok APO dixwaze jiyana mirovan li ser esasên afirandina ramanên nû bide avakirin. Bi taybet jî bi civaka Ekolojik-Demokratîk ji bo civakê nû,

xwezayekî paqıj bide avakirin û alternatifa wê datîne holê.

Ji bo berjewendiyê xwe, astengî ya herî mezin Serok APO dibînin, bi vî awahî komployekî bi vî rengî li darxistin. 1996an de gelek caran di Suriyê de li hember Serok APO suîkastekî pêk anin, lê ne karin armanca xwe pêkbinin. Ji bo wê jî 1999an meha Cotmehê bi gefên herî dijwar li ser Suriyê zext çêkirin. Ji bo wê jî Serok APO ji Suriyê derket.

İsraîl, Emerîka, Akdenîz operasyonên herî dijwar lidarxistin û bi vî rengî despêkirina komploya didan diyarkirin. Şuna pirsgirêkên dîrokî û civakî hildin dest operasyonên bêsînor kirin û işkenceyên herî giran sapandin. Rusya, Kenya, Yewnanîstanê cihê xwe di komployê de girtin. Bi taybet jî Yewnanîstanê ku dostaniyê dikir, rolekî bingehîn di komployê de leyist. Serok APO ruxmê her tiştî, hêlên bi hiqûqê ve eleqedar danî bû alikê lê belê dostaniya ku weke dijmintî hate bikaranîn xeter û ne ehlaqî dît. Bin navê dostanî û rêhevaltî de, ev xiyanet hate veşartin. Ji bona armancên xwe yê polîtîk, dostaniya xwe firotin. Pêşiya hertîştî çemkên duristî, dostanî û rêhevaltî herdem xwe da pêş. Lê dewleta Yewnanîstanê dîroka xwe ya xiyanetê êdî dubarê kir û dîsa demxeyekî reş di dîroka xwe de da nivîsandin. Pêşxistina komployê de rola dostaniya sexte û rêhevaltiya kêm hebû. Armanca DYA, Yewnan, İsraîl ew bû ku Serok APO tune bikin, lê ew daxwaziyên bi dil reşî, bi nîzîkatiyên Serok APO ên guhertina pêvajoyê hişt ku guhertinên erenî çêbibe.

Bi hezaran rêheval û dostên herî hêja li derdora Serok APO komkiri bûn, ji bo armancên ku demokratîkbûna gelan û azadiya Serok APO. Dijminatiya herî dijwar û xeter bi nîzîkatiyên xwe yê îdeolojîk û siyasî vale derxist. Bêguman hîna milekî komployê berdawa me. Ji ber ku îzolasyona li ser Serok APO û mercên jiyana wî nayê çareserkirin. Dixwazin erzan, sivik nîzîk bibin û hêdî hêdî bi nexweşiyê ji holê rakin. Gelek pirs mejiyê mirov de dimîne asê. Mînakên Nepolyon gelekî girîng e. Napolyon hêdî hêdî ber mirinê de çû, piştî mirina Napolyon demekî dirêj, li gorî lêkolînan nû tê zanîn ku bi dermanên Arsenîk hatiye jehrî kirin. Ji bona vî jî Tenduristiya Serok APO mirovan dide fikrandin. Ango; çermê Serok APO çima diweşe? Çima wekî her mirovekî maf nayê dayin? Serok APO 4 an sala li Îmraliyê de bi tenê jiyan kir, di rewşekî wiha de psîkolojiya mirovan ber bi xeterê ve diçe. Pêwîste ku tecrîd û izolasyona li ser Serok APO ji holê bê rakirin û rewşa mercên jiyana wî were sererastkirin.

Vale derxistina Komploya li ser Serok APO vale derxistina komployên li ser yekîtiya gelan e. Ger komploya li ser Serokê netewa Kurd neyê eşkere kirin û vale derxistin, dilsoziya bi azadî û wekheviyê re jî nayê kirin. Her wiha ger ji aliyê hemû kesî de ev yek neyê dîtin û eşkere kirin wê dirok keseki efû neke.

**13- Sibat-2004**

## ŞERVANÊ AZADİYÊ

Wergeha şervanên nû, perwerdeya xwe ber bi dawî bir. Piştî şahiya ku bi serkeftin 3 mehên ku perwerda xwe ber bi dawî anin. Xweşikbûna dilê wan, li ser rûyê wan bûbû ronahiya serkeftinên pêşerojê. Bi dilê pak-zelal xwe tevli jiyana gerila kiribûn.

Ji ber ku li civaka jê hatî, wan bi ter nedikir û ti guhertinên erênî, li gorî tê xwestin çenekiribû. Li hûndirê civakê de, ber bi nexweşiyên herî dijwar û bi êş çûyîn çêdibe. Bi taybet jî, jiyana wan xwe dubare dike û aloziyên xeter dibe bela serên mirovan. Ew alozî jiyana mirov tine dike. Keyfxweşiya azadiya mirovan ji destê wan dûr dixe û dibe ber jiyana aloz. "Jiyana rasteqîn" a ku azadî diafirîne û jê durdixinê, kesayeta mirovan de bê viyan dihêlê. Carna jî jiyana aloz dibe ber bi mirinê. Ji bona we jî mirovên tên ku dixwazin bi kesayeta xwe de guhertinên erênî çêbikin û rastiyên jiyanê bi viyan, hêvî ya xwe bidomînin. Bi taybet jî alternatîfa jiyanekî nû dibînin. Bi wî rengî tevli refên gerila dibin. Gelek sedem henin ku tevlibûna gerîla dikin. Xwezakî paqij, bedew, zelal mirovan şahî dike. Dilê mirovan xweşik dike, rihe mirov paqij û zelal dike. Ew şervanê nû dixwazin hawl bidin ku pergalekî nû bîdomînin û xwe bi nû de ava bikin. Li serî de li hember civakê kevneperest destê xwe radikin û ji bo îroj jî dibe alternatîfa sistemekî nû.

Bi coşekî mezin, bi dilêkî geş li benda dîploma xwe ya mezûnbûyinê bûn. Li ser rûniştekî rûniştibûn,

heyecana li ser rûyê şervanên nû, gelek balkêş bû. Çavê wan wekî stêrkan şewq vedida li derdor. Dilxweş û şahîbûna wan gelekî bi bandor bû. Rojên bêrf û seqem ji bona wan ne xem bû. Du hevalên kameraman hatibûn ew roja watedar bikşînin. Ew herdû hevalên Kameraman ji gelekî hestiyar bûbûn.

Endemê rêvebiriya Kongrê-Gel Duran Kalkan û grubûkî mezin çûbûn li gel wargeha şervanên nû. Ji bona mezûnbûna şervanên nû dîploma pîroz bikin, hatibûn. Hêvî û coşa şervanên nû gelekî bandor li ser rêheval Duran Kalkan jî kiri bû. Çavê Birêz Duran Kalkan mîna xezala bi birq bûbû. Civîna rêheval Duran Kalkan dewlemend bû û gelekî bawerî dabû şervanên nû. Bawerî û hêviyên xwe ên serkeftînê ji bo şervanên nû anî ziman û ew dewra perwerdê ber bi dawî ani. Li hûndûre perwerdê de ê yekem hatî hilbişartin ji bo ku dîploma xwe a mezûniyetê bikre hat, Duran Kalkan kleşe xwe ya xweşik bi hêvî kê mezin (ödül) xelat da. Rêz bi rêz hemû mezûnên wergeha Xinêre a ku ji hefti kesan pêk dihat dîplomên xwe girtin. Ji heyecana gelekî silavên xwe şaş dikirin. Şûna bêjin sipas, digotin: “Pas” hemû ji hew şirintir û xweşiktir bûn. Nav hevalên keç de a yekemin derketî, keçekî 15 salî bû. Rûyê wê mîna bêrfê diçirisî, purê wê reş û tarî xelek xelek disekinî. Wekî zarokekî paqij, wekî xwendavanekî zana, wekî leşkerekî bi ezmûn disekinî. Hemû şervanên azadiyê xelatên xwe û diplomeyên xwe girtin. Li ser çavên reş û belek mîna stêrkên êvara geş dibûn. Rastiya wan di nava jiyana wan a nû de veşartîbûn. Ew dîroka wenda de lê

digeriyan, îroj hesreta sedsala xwe gihandi bûn rastiya axê pîroz de. Ew hesret, di nava tîrêjên rojê de veşartîbûn. Lê îro ew hesret ber bi çav bû. Hêviya wan, hezkirina wan, hemû dibû ronahiya dilê gelê wan. Rûyekî bikenekî xweş dengê xwe berda bi awazên bilûra re gotin: ***"Bijî Serok APO" "Bi can bi xwîn em tere ne ey SEROK, Bê Serok jiyan nabe."***

**20-Sibat-2004**

## WERİN XWE Bİ AVA ÇAVKANİYA GULA RENGÎN BİŞON

Di zivistana reşahiyê û şevên tarî de, ciwan pêwîste ku bibe gerdana li ser singa bihara rengîn û bi rola xwe li ser tariyên bênç hezar sala biqelîşinê û bibe bandor li ser rastiyên azadiyê. Ew şahrîstaniya ku hatiye dizîn, jî nûv de derxistiye holê. Yê ku wê rastiye eşkere kiriye Memosta yê Mezinê. Çavkaniya tîrêjên rojê bûye sedema ku zayîna ramanekî bi fikrên

nû were pêşxistin. Bi taybet jî li ser keç û xortên ciwana bi bandore. Girêdana xwe bi rengekî cuda cuda anine ziman. Gelek keç û xortan bi alavên bedena xwe darîstana ku dixwestin li ser gerdûnê raxin ronahî kirin. Û bi agirê azadiyê re bûne hevalbend. Gelek mînakên rengîn hene, mîna Zîlan, Sema û Fîkrî Baygeldî....

Azadî; zelaliya ava kaniyeke xwesere ji hestên dilê ciwana ber bi asûyên ronak ve diherîkê. Bi hilma azadiya Serok APO sînorên qîrêj nasnake û paqijiya dilê Serok APO aşîtiyê û baweriya, azadiyê bi pêşerojê re diafirîne. Xeyal û hestên xwe yê jiyanê pêwîste ku bê tirs ew wê daxwaza di dilê herkesî de ye bike armança xwe. Azadî ji bo hemû mirovan pêwîste. Azadî, xweşikbûne, hêviye, Yekîtiya Demokratîk ke û aşitî ye. Bêguman mirovên ku li hember azadiyê bê bawer û bê hêvi nizîk bibe, wê ji çavkaniya jiyanekî mezin qut bê û nikari be jiyanekî rengîn bidominê. Ji bo wê jî gereke hemû ciwan bi taybet di nava lêgerina hezkirinekî kûr de bê. De ku bikari be neqişên rasteqîn û hestên xwe ye jiyana azad bi xemlîne.

Di bin siya azadiyê de, bi hestên xwe yê zelal ku ji kaniyên Deryaya Îmralî de, di bin tîrêjan de xwe xemilandiye. Di nava çar dîwaran de Gulekî rengîn veşartiye. Lewra her tişt bi rengê xwe xweşîke, her zîndiyek di cihe xwede xweşe. Lê belê ew Gula rengîn di nava xweza û mirovan de xweşik û bi rûmet e. Her zindiyek pêdiviyên xwe bi şemalekî nerm û xweş heye. Ji bo wê Gula rengîn, gereke zincîrên koletiyê were qetandin. Yê ku rola serkêşiyê bi şêweyekî çalak bi-

leyîze ciwanin. Bi vî awayi ji bo ku rê girtinekî hemdem em bidin nîşandan ji dîrokê û hêrsa pêşerojê re gereke em hêza veşartî li ser Gula rengîn rakin. Ew xal jî wê bi xwere pîvanên azadiyê bide nîşandan. Meha Sibata bi qêrîn, hawar û tevlîhev, dilê mirovan diêşine û xençer dike. Bi vedana dengê Serok APO belav bû li Cîhanê. Ji bo azadiya Serok APO gereke ciwan bi giştî li ser piyabin û berê xwe bidin axa Welatê rengîn. Û bi rengê xwe û bi dengê xwe bi awazên bilûra azadiyê velorînin. Ji bo azadî bila Ciwan hemû bi hest û raman tevlî Kampanya Azadiyê bibin. Cihê ku ciwan lêbin li wê derê serkeftinên azadiyê têne qezanç kirin. Li hember taribûna dest bi dest, gav bi gav hemû ciwan bi ava çavkaniya azadiya jiyanê xwe û giyanên xwe pak û xawin bikin.

**25-Sibat-2004**

## PÊŞXİSTİNA WÊJEYA KURDÎ PÊWÎST E

Gava mirov li dîrokê kurda dinêre, mirov dibîne ku wêje cihekî girîng girtiye. Ji bo şaristaniyê berhêmen dîrokî pêşengî kiriye. Dî dîrokê de cara yekemîn hûner bi destê jinê çêbûye û bi taybetî jî wêje rolê xwe yê mezin lîstiye. Di mîtolojiyê de wêje, rolekî xwe yê girîng heye.

Bi taybet jî hebûna wêje ya bi zimanê kurdî cihekî xurt negirtiye. Edebiyat, ji bo pêşketinên her gelî û ji azadiya gelê Kurd hêzekî mezin e. Ew jî hebûna miletekî dide nîşandan. Bi vî awayî civaka Kurdan ji bo edebiyata dibe xezîneyekî mezin. Lê ew bi zimanê kurdî nayê bi kar anîn. Pêwîstî heye ku guhartinên pêkanînê de nasnameya bîrdoziya nû bide xuyakirin. Bi zîhniyeta nû gereke li ser wêjeyê bandorekî bilîze. Ne ku bi giyaniya cuda, bi zimanê kurdî pêwîste.

Kurd, ne ku bi zimanê xwe, lê bi zimanê neteweyekî din dinîvîsînin. Ronakbîr û nivîskarên herî mezin yên Tirkiyê piranî Kurd in. Ew her tiştê xwe ji Kurdan û Kûrdistana rengîn werdigrine. Piraniya wan vê yekê înkar dikin û xwe wekî Tirk dibînin. Ev xal jî tiştekî xirap û pir bi xeter e. Hertim bi pêşnexistina wêjê, zimanê Kurdî şûnda maye.

Xebatên li ser ziman, wêje, çand pir girîng e... gava mirov neteweyekî zimanê xwe winda bike, ew humiyeta xwe ya neteweyî jî winda dike. Lê ji bo ev xebat baş dimeşin, divê mirov li dîroka xwe xwedî derbikeve. Baweriyeke pir kûr û rast pêwîst e.

Gelek mirov jî hene ku, çiqasî ku zimanê Kurdî bizanin jî lê di malên xwe de napeyvin. An zimanê dayika xwe bicûk dibînin, an jî peyivandina wî hewce nabînin. Bi vî awayî zimanê Kurdî şûnde diçe û tu guhertin nikare bi wan nêzîkatiyan çêbike. Pêdiviyên bi nivîsandina wêje ya zimanê Kurdî heye. Wekî nivîskarê Feqeyê Teyra, Melayê Cizirî, Ehmedê Xanê li ser wêje ya ziman û çanda Kurdî re xizmet kirine, lê belê dîsa em kêm dibînin. Pêwîste em li mîrasê wêje xwedî derbikevin û li ser riya wan de berdawan bikin. Ji ber ku wêjeya me gelek dewlemende. Em hemû baş dizanin ku heta edebiyata me, çanda me li ser navê dijmin dihata gotin û dihata hesibandin. Ango, êdî pêwîste xwedî derketina keda xwe ya wêjeyî pêkbê...

Koka zimanê Kurdî di dîrokê de pêwîste bê vekolîn kirin û şîrove bibe. Di vî warî de hemû dokument û çavkaniyên ku hene divê bêne civandin û li ser wan lêkolîn were pêşxistin. Ji bona wê jî wêje bi

dîrokî dest girtin, gelekî girîng e. Li her derê cîhanê gereke wêjeya bi zimanê Kurdî were pêşxistin...

Ji bona vê yekê jî hemû ronakbîr û kesên ku ji xwe re dibêjin ‘em demokrat û pêşverûne’ pêwîste ku di pêşxistina wêjeya Kurdî de rolê xwe bilîzin.

**30-Sibat-2004**

## 8ê ADARÊ Bİ RENGÊ JİNÊ Bİ XEMİLÎNİN

***8ê Adarê roja jinên Karkerê cîhanê ye.***
***roja evînê ye***
***roja azadiyê ye***
***roja Karkera ye***
***roja xweyi derketina mafê hemû jinê yê..***
***Li warê zerîn de; 8ê Adarê bi tîpên pîroz li ser dîrokê hat xemlandin.***

Her çiqas di dîrokê de bedêla xwedî derketina li ked bi dilêşî jî hatibe dayîn, lê belê di sedema hemû bedelên de serkeftin û guhertineke dîrokî hatiye pêşxistin. Roza Lûxenburo, Clara Zêtkîn serkeşî ji dîrokê re kirine. Lewma jî bi agirê azadiyê ku berdan bedena xwe xwesti li keda xwe xweyî derkevin. Bi vî awayî jî ew bûne sembola jiyanê kî nû. Xala herî

girîng jî ewe ku îro di her warî de 1ê Adarê de ew roj bi çalakiyên kedkaran tê pîrozkirin.

Ew roja bi wate ji bo tevahî jinan dibe sedema azadiyê. Ew roja girîng de gelekî nirxên bi taybet hatin avakirin. Jinên bi dilewêr, lihember ketxwaran serî rakirin. Xwe bi agirê azadiyê kirin yek. Bi kulîlkên biharê rengîn, xwe kirin, xeleka jiyanê. Êw roj xwe xemile bi rengê jinê. Bi vî awahî bûn sembola hemû rengê xwedewanda yê jina. Herdem jin bi mora xwe li ser rûpelên spî û dinava dîrokê de dane. Bi taybet ji rola xwe li hemû warî de leyîztine..

Bêguman rewşa jinê gelekî bi dil êşe. Berê jin li hember her tiştî bêdeng dima û mehkûme zilmê dibûn û bi vî awahî her tiştê wan bi pîvanên zilama bû. Ew koletiya bi awayekî bavîksalari û çînên desthilatdaran li ser jinê astengiya derdixistin. Ew xal ji, di bû sedema jin bê viyan, bê hêz bimîne. Mafê axaftinên jinê re tune bû. Jin wekî kolêyekî dihata bi kar anin. 24 seatan jin xebet dikirin li kerxaneyan, lê belê li gorî xebatên dida meşandin pere nedidan wan. Mafên wan dihata xwerin. Li ser keda jinê dihate rûnişkandin.

Tu caran bergîranda keda wan nehatiye dayîn. Mafên karker û kedkaran ji aliyê çîna serdest ve hatibû xwarin. Ji bona vê jî di sala 1957an de li Febrîqa Şîkargoyê jinan dest bi protesteyê kir, mafê xwe xwest û xweyî li keda xwe derket. Bi hêjmarek zêde jin(126 jin) xwe di febrîqê de agir berda bedena xwe.. Ev çalakî, bi pîrozbahî û tevlîbûna rengê jinê re îro ji her demî zêdeti tê xemilandin.

Ji ber ku jin kelha çînî a bindest e, dibe bingeha esas ya hêza karkeran. Karker û jin di gelek xalan de têne cem hev û gelek taybetmendiyên wan yên wekî hev hene. Ango jin, xulikdarê kediye û bi taybetî sembola yekemîn bû. Jin her tim xulikdara avabûna jiyanê bûye û mirovahî di dergûşa jinê de mezin bûye. Keda wê gelek mezine û dîrokê de dibe serkêşa jiyana nû.

Nêzîkatiyên ku li hembêrî çîna karker tên pêşxistin berjewendî û polîtîkayên serdestan diparêze. Lewma jî tê xwestin ku sedsala 21an li ser vê esasê were sazkirin.

Emperyalîzm polîtîkayên xwe yên li ser jinê hîn bêhtir kûr dike. Ango; bi rêya Medya jinê weke meta bikartîne û girêdana wê esas digire. Ji bona vê jî pêwîste çînên bindest û karkeran hemû di sedsala 21an de têxe nava bûhran û nakokiyên kûr.

Nêzîkatiya Emperyalîzmê ya li ser azadiya jinê li ser bingeha têgihîna ji kesayet re biyanî hiştinê pêş dikeve û ev bişêweyên teknik tê meşandin. Lê belê jin polîtîkayên pergalê baş naskiriye. Ji bona vê jî pêwîste serkêşiyê ji karkeran re bike.

Wê demê de karibe rûyê pergalê yê veşartî derxe hole.

Li Kurdistanê pêwîstî bi ji her alî ve lekolînên li ser jinê heye. Di gelek waran de jin bûye bingeh û sedema guhertinên muezem. Jinê mora xwe li guhertin û veguhertinên Kurdistanê daye... Ev rewş li gelek welatan jî bi vî awayî ye. Lewma jî di 8ê Adarê de divê em dîsa bibin pêşkêşê guhertinê.

Jin, ciwan li cîhanê de pêwîste ku hîn zêdetir dikarin li tevlî 8ê Aderê bibin. Ji ber ku potansiyelekî gelek mezin a jinê heye. Bi vî awayî dikarin polîtîkayên emperyalîzmê yên li ser jinê bê tesîr bikin bi rengê jinê ji nû de bixemilînin. Gereke Tirkiyê jî li ser esasê pêşxistina demokrasiyê mafên wekheviyê yên karker û çînên bindest nas bike. Jinên Kurd û Tirk bi çareserkirina pirsgirêka Kurd dikarin xwe bigihînin rêxistinekî hîn xurttir û di çalakî û pîrozbahiyên 8ê Adarê de pêşkêşî bikin. Dîroka zerîn bi rengê jinê bi xemlinin.

**05- Adar-2004**

## ÇEMKÊN NAMUSÊ

Xweyi derketina mafê jinê, xweyi derketina mafê ciwana ye. Ye ku mafê jinê xweyi derbike wê, ye bibe alternatifên yekem. Gereke ciwan bibin xizmetkarekî wê doze. Heger ciwan xweyi mafê jinê derbikeve ye bibe evîndarê demokratîke.

Êdî bese kuştîn. Hertiş li gor daxwaziya wan nabe... jinên ku bê suç hatin kuştin. hemû ji li ser sedema çemkan namusê jinê hatiyê pêşxistin. Miletên bindest bi çi awayi dikarin heyina xwe ji serdestên xwe bi parêzin. Hêya ku çemkên namusê ji holê ranebin, kes nikarê ti pêşketinên siyasi, aborî çebikê. Bi wan nizîkatiyên li gorî sedsala nû de, a ku herî paşketiyê. Dibêjin ku li gor hemden em pir zananîn lê belê ti nûjenî em nabinin. Mirovên ku pir şûnde manê û ti hêza wan a ku erenî nin e.

Li Kûrdistanê îro hemû Rojhilata Navîn de bûye merkeza tekoşina demokratîk û azadiyê. Ji bo wê êrîşên gelek mezin xwe dide peş. Bi taybet ji 30 mîlyon mirov rabûye, ji bo rizgariya û dijî û nijadpereste, koledar, bê adeletiyê şer dike. Li Kûrdistane gelekî guhertinên erenî çebû ye, lê belê hîna ji tiştên kevinde xwe dubarê dike. Bi vî awahî welatên pareziya xwe valê derdixe. Ji ber ku bavê Guldunya Toren “axê me qirêj nakin” goti bû. Ew gotin ne rastîn. Gelê Bitlis gereke xweyî Guldunya Toren derbikevin. Bi vî awahî welat paraziya xwe ye bide nîşandan. Kuştîn ne miraniyê, kuştîn tirsekbûyine. Derbasiya vî divê were vekolîn û şîrove bibe û li ser wan lêkolîn were kirin. Ye ku bi vî awahî sedema kuştîna namusê bikin, gereke li dijî koka wan xwîn xwara ji holê paqiş bikin. Ji ber ku ***“jin kulîlkên bihara qernê bist û yekê ye”*** ji bo wê ciwan bi kûrahîya dilê xwe mîna kulîlkên perfîne serî rakin li hemberî kevneşopiyan. Ji bo mafê jinê gerek bibin rewiyên azadiyê. Li gor lekolînên wan salên nû de hatî çekirin, kuştînên jina hîn petir zedebûye.

Jin hebûna civakiyê. Ye ku birewerbûna xwe bide nîşandan gereke tola jinên ku mîna Sevide Uyanik, Naîme Salman, Dîlber Kina, Kadriye Demirel, Guldunya toren rabikin. Li hûndirê pergala de pîvanên bavîksalarî û çînên desthilatdar heye ku lewra ew rewş bûye sedema ku hertim bedeng biminin û pîvanên paşketî li ser jinê didominin. Ji ber vê yekê guhertin û veguhertin bi zihniyetekî nû ihtiyaciya civaki heye. ***“Ciwan û jin wekî goşt û hestî bi hevre girêdayîne, yek bê yê din nabe.”*** Bêguman hêza jinê,

heza ciwana ye, hêza ciwana ya jinê ye. Ye ku guhertinên û veguhertînên nûjenî bibe sêrkêş bi taybet jin û ciwanin.

Hinek xal hene ku veşartiye mane... Ciwanê kî birewer, çawa bê sedema tên kuştin. Bi vî rengî kes qabul nakê û gereke ciwan tola vî bi çalakiyên serhildan bibin bandor.

Li ser esasên hevpariya xeta parastina rewa de ronahiya herî rast bibin çaraseriya çemkên namuse. Xweyî derketina nasnama jinê xweyî derketina mafê xweye.

**10-Adar-2004**

## ROLA CİWANA Çİ YE?

Rola ciwanan çi ye? Divê mirov li ser vê jî nîqaş bike û bersiva vê bide. Ji bona vê jî divê wateya ciwana carekî din di ber çavan re were derbaskirin. Em li ser girîngiya ciwana hildin ser milên xwe û bifikirin da ku em îkna bikin ka rola ciwana çi ye? Bî vî awahî carekî din xwe di ber çavan re derbas bikin û rexnedayîna xwe bidin.

Ji ber ku li Tirkiyê gelek êş, janên netewperestiya hat jiyankirin. Bi vî awahî, lewma li Tirkiye ji demokratîk, biratî, yekbûyin gelan qels dîmîne kelemên li peşiya Tirkiyê çi ye û çawa eme ji hola rakin? Bêre her tiştî gerekê ji hemû cureyên netewperestiyan dûr bikevin. Bi vî awahî ciwanên Tirk jî divê ji bona ku gelê Kurd bi çand, ziman, huner û viyanekî azad jiyan rola xwe bileyîze. Gereke ciwan Berî her

tiştî cureyên netewperestiya dûr bikevin. Ji bona serwerkirina demokrasî, aşitî rolekî çalak bileyîze. Di navbera gelan Tirk û ye cuda de rola xwe bileyîzin û ji bona pêkhatina vê hewl bidin.

Bêguman tiştên ku wê ji encamên vê hilbijartina antî-demokratîk werîn derxistin gelekîn. Dîsa diyare ku wê ev encam demekî dirêj rojeva Tirkiyê û rojeva aliyên tokoşîna demokrasiyê didin meşandin û meşgul dike. Her çiqasî encam ne encamekî ku kesî hêvî dikir. Herkes baş dizane ku ev hilbijartina hat li dar xistin ji demokrasiyê bêpar bû. Di li dar xistina vê hilbijartinê de demokrasî tune bû. Pêwîste qelhên bi vî rengî, di nava gel de xebateke xurt bidin meşandin. Û nûnerê çareserî ya demokratîk civak bixwe ye...

Guhertin û veguhertin vê mentiqê, encam bi şoreşekî zîhnî mimkun e. Astengî û kelemên di pêşiya vê herî pevrebûnê de dertên ji holê tune bikin. Rola yekemîn li ser milê ciwana ye û rola herî girîng yê duyemîn jî, dikeve li ser milê hemû qelhên demokratxwaz, sazî, avahiyên civakên sivilîn.

Dem dema biharbûna azadî û demokratîkbûna gelana. Û dîsa em dikarin bêjin ku dem dema çalakiyê ciwanên mêrxazan e. Bi taybet jî rola pêşeng a ku di vê pêvajoyê ketiye li ser milên ciwana her demî zêdetir dixwaze.

14-Adar-2004

## HESTÊN GERÎLA

Birûskên asîman hêdî hêdî ber bi rojê biharê diçû. Hêdî hêdî tava rengîn şewqa xwe dida xwezayê. Bi vî awahî mîzginiya biharê dida nîşandan. Di wan rojên xweş de ez û heval Warşîn, heval Rûbar, me berê xwe da Xakurkê. Em bûbûn rêwiyê Xakurkê. Bi dilekî keyfxweş û xemgîn em ji Xinerê birêketin. Her gavêk me, dibû ber bi rojên biharê. Hîna nû kulîlkên biharê serî radikirin ber bi rojên xwezayê ve. Di nava daristana ye ku nû mizgîni ya biharê dida, dara beyif bû. Darên beyivan bi kulîlkên xwe yên spî û pembê her der dixemilan. Xweza mîna mirovekî zindî me hembêz dikir. Bi bandora xwezayê em sermest bibûn. Bi dengê dilê xwe ez mîna zarokêkî keyfxweş kiribûm. Giyayê nazik li ser axê perdaya şîn xemîlandibû. Xweşiya hilma xwezayê li ser rûyê me diket û bêhna wê dilê me hênik dikir.

Piştî demekî dirêj ku em meşiyan û gihiştin warê Xakurkê em her sê heval çûn li ser girekî bilind û çemekî mezin li ber çavên me ket. Ji ser wî girî hilma evîna gerdûn diçû û tevlî fetla xwezayê dibû. Hestên me ji rûyê me dihatin xwendin. Dema me li bedewbûna deşt, çiya, gelî, newal û zozanan meyze dikir, em gelekî keyfxweş dibûn. Xweşîkbûna welatê me bi bereketa xwezayê hatibû neqişandin. Li ser wî girî em ketibûn nava fikir û xeyalên cur bi cur. Hevala bi Warşîn hestên xwe yên bi hêvî got: “Hêviya min ewe ku Gelê Kurd hemû wan warê şahî û pîroz bibînin. Gelê me layîqê herî tiştên xweşikin.” Warşîn hêdî hêdî serê xwe hejand. Heval Rubar; bi rûyê xwe yê mîna berfê ket axaftinên jiyanê. Bi dilekî xemgîn “hevaltiya gerila gelek xweş û rûmete.” Bi wan fikran li ser hestên me kûr û dûr dibû. Di çavên Rubar de tijê hest dibû...

Bayêkî cemidî ku li laşê min dixist û demekî kin bêdeng sekinim. Min hestê xwe ji bona pêşeroja kî nû veşart .

Piştî seatêkê ku em meşiyan, em gihiştin li gel hevalên xwe yê heja. Bi ditina hevalan em gelekî dil şah bibûn. Coşa hevalan li ser rûyê wan dihata xwendin. Em li ber darekî ku pelên xwe nîne em li derdûre agir rûniştibûn. Li derdûra agir ez û hevala Warşîn (Koçgirî), hevalê Rubar (Siirt-Eruh), hevala Siadet (Dersim), hevalê Celal (Şirnex-Gundik Remo) rûniştî bûn. Agirê me mîna agirê Newrozê geş bû. Geş bûna agir hevpeyvîna me hîn  bêtir rengîn dikir. Çirûskên agir bibû ronahiya çavên me. Bayekî çemidî, dibû se-

dama rep repa dengê dilê min. Coş û şahiya hevalan, diyar bû ku ji hevalan gelekî li ser min bandor kiribû. Min dixwest ku hezkirina xwe bi herkesî re par bikim.

Çavên min li derdûr digeriya. Hevalekî bala min kişand. Çavên min li hevalê Mazlum ket û li ser singa min bi heyecana, bû rep repa dilê min. Keyfxweşiya min, li ser rûyê min belav bû. Min guhê xwe da dengê dilê xwe. Nişkave ez rabûm li ser xwe û ez meşiyam li gel hevalê Mazlum. Bi coşekî mezin min wî himbez kir. Him hevalê min, him jî birayê min bû. Piştî 11 sala cara dûyemîn min birayê xwe di nava refên gerîla de dîtibû. Min nezanî ji bo birayê xwe çawa hestên xwe binim ziman. Êdî bayê sar li laşê min ê gerim dixist û derbasî rojên berê dibûm. Ez û heval Mazlum gav bi gav, dest bi dest em meşiyan li gel agir. Em bi hevre rûniştin. Xeyalên me zindî dibûn ber bi rojên berê. Bayakî hênik ji zozanên bilind dibeziya û li rûyê me dida. Heval Mazlum ciwanêkî xurt û şerîn bû. Min tim dixwest ku ez rûyê wî binerim. Bi meyzandinên min ez diçûm gel rojên kum e bi hevra derbas kirî. Xeyalên min bi Mazlum re dîsa zindî dibûn. Me bi hevalê Heval Mazlum re gelekî guftûgoyên dewlemend dikirin. Hezkirina xwe ya bi xwezaya re da diyarkirin.

Piştî em du roj li gel hew man, hedî hêdi ji hev veqetandin nêzîk dibû. Êdî dema veqetandina ji hev hatibû. Çavên hemû kesî li ser me bû. Qet destê min qut nedibû. Berî her tiştî hestên min li ser ramanên min bandor dikir. Bêhna birayê min yê şêrîn ji min dûr ne diket. Êvîna birayê min li ser stêrkên asiman

dibû gerdûna azadiyê. Wek her hevalêkî min ji hemû hevalan bi dilêkî xoşewîst min xatirê xwe ji hemû hevalan xwest û em bi riya azadiyê dîsa meşiyan ber bi riya Xinerê.

**18- Adar-2004**

## RASTEQÎN DİLÊ CİWANAN DE VEŞARTİYE

Kesayatên ku li ser keviyên kuçeyê (sokak) tîn û birçî bê xewn gelekî tên dîtin. Yê ku di nava eroînê cih digrin û li xwe dide û wê jehrê dikişîne dilê xwe de. Yên ku ketine nav dizî û xirabiyên herî dijwar kêm nîn e. Kesayata ciwanan a herî baş, di nava xirabiyên jiyanê de hatiye veşartin.

Hesabên wan ciwana, kî yê bide? Bila bersiva wan hemû kesî ji xwe bipirsin?. Çima ciwan bi vî awahî ketine rewşekî mirinê.

Cewherê ciwana layîqê tiştên herî rûmetin, lê ew rastî wekî mirinekî reş ketiye li ser dilê ciwana. Dema ku ciwan bê armanç û bê hedef bê, wê demê nikare xwe bi afirine û li hûndire civakê de tu pêşketinên erenî çêbike. Mirovên ku bê armanç û bê hedef nikarin tu serkeftinên azadiyê biafirînin, ji ber ku rihê mirovan mirî ye. Em jî dibêjin ku ciwanên me rêberin, lê ew rasti li gorî tê xwestîn, nayê dîtin.

Sistema bi vî awahî hatiye pêşxistin ku ciwan bi cewherê xwe hatiye durxistin. Tu li wan dinerî ku mirov dibêje qey ew ne ciwanin, ji ber ku di cewherê xwe de tu fêrq nemaye. Lewra ew rewş bûye sedeme ku hertim êş jan were pêşxistin. Ew xal jî bandorekî dijwar li ser cîvakê bike. Ew kesayeta ku bin bandora sistemê de tune dibe û ketîbûna mirovan tîne holê. Bêguman jiyan bi ihtiyac u zerûratên pêktê, lê ew rastî nayê wê watayê ku em xwe teslimê sistemê bikin. Yê ku rêbertiya vê sistemê bike û rê bide dîsa ciwanin.

Mînak Televîzyonan qenalên hineka hemû arabesken hemû hunerê ciwanan dikujê û bi ciwantiya wan dur dixe. Şuna televîzyon bibe alternatîfî jiyanekî nû, lê belê ramanên ciwana dibe li ser jiyanê ketî. Rêbazên wekhevî, biratî, azadî heye, ango çima programên dewlemend temaşe nakin? Bi ramanên ketî li ser ciwanan bandorekî xeter didomînin. Ji bona wê jî li hûndûrê civakê de gelekî ciwan jiyana xwe bi destê xwe bi dawî  dîke. Bi taybet jî bi eroîne an jî temenê xwe di zîndana de darbas dikin. Di nava jiyanê de listokên xeter xwe dide pêş. Dîskotekên ciwanan, hemû kom dikin û bi ramanên vala tijê dikin. Bi wan nêzîkatiyan li ser mirovên ku azadiyê kut dike û êdî êdî li ber tengavî dibe. Ew mirovên ku ciwan giştî di nava qirêjê de  difetisînin.

Ti berê ciwanan bidî kuderê yê wisa bimeşin. Bêguman eger ku xirap rê bidî pêşiya wan yê wisa biçin, lê belê eger ku rêka azadiyê bidî pêş wan yê wisa bidomînin. Ciwan herdem veguhertinê re vekirîne, yê ku rola xwe jî bilîzin bi taybet jî ciwanin. Em naxwa-

zin ku tiştê hatine jiyankirin li ser serê hemû kesên ciwan carekî din bê jiyan kirin, em dixwazin ku hemû ciwan bi dilekî aşitixwaz, bi dilê ki azadixwaz, bi dilê kî xoşewist li hûndûrê jiyana rengînde rolakî girîng bidomînin. Em hevîdarin ku ciwan rola xwe bilîzin.

**23-Adar-2004**

## KOMKUJİYA HALEPÇE

***Li ber Şehîdên Halepçe em bejna xwe ditewînin û komkujiya Halepçe şermezar dikin.***

*16ê Adarê 1988 de li ser Halepçe komkujî hat çekirin.*

Dema ku Halepçe komkujî pêk hat û li ser mirovên sivîl bi awayekî pir trajîk komkujiyeke pir mezin hat çêkirin û di encam de piranî zarok û jin, gelek kes hatibûn qetilkirin.

Bi dîmen û hemû rastiya xwe ev komkujî li ber çavên her kesî bû. Herkes jî wekî her demî bê deng mabûn. Li ser wê rojê heta niha êşên sala di dilê me bîrin dike. Wekî sed kul û birinên di dilê me di êşîne. Li ser wê roja bi xwîn hatî avdan em bi dilê kî êş rexne dikin. Şuna xwîne gereke bi ava demokrasiye were çareserkirin. mirovên Kurd bi awayekî hovane hatin qetilkirin, gelek jî seqet man û di hêla derûnî de nexweşiyên cur bi cur di jiyana wan de çêbûn. Tevahiyê cîhanê bêdengiya mirinê serwer bûbû û ev bêdengî hîn jî berdewam dike. Lê belê piştî komkujiyê

ne ji Neteweyên Yekbûyî û ne jî ji sazî û rêxistinên mafên mirovan tu dengek derneketibû.

Wateya van helwestan îro ji aliyê her Kurdekî ve baştir tê zanîn.Tiqes naxwaze ku komkujiyan li ser ti mirovan were çekirin. Ji bona wê ji gereke gel rola xwe bi awayekî hawildana demokrasiye bilîze. Bêguman eger gel rola xwe bi awayekî demokrasiye nelîze, nîqarê pêşiya komkujî bikre. Bi encama avakirina demokratik ji azadiye gelê kurd re ye bibe quwete ke mezin. Ew xal ji ye bibe sedema hebûna miletekî ye rasteqîn û ye bibe dergûşa medeniyete.

Êş û azarên mirov, jan û elemên mirov ji nû ve der dibin û dîmenên wêneyên ku dema qirkirinê hatine kişandin tên ber çavên mirovan. Bedenên parçebûyî û warên wêranbûyî, zarokên ku tirs ji çavên wan diçirûsî, dayîkên ku xwe avêtine ser zarokên kem nîne bû. Gelo ma gengaze ku ev dîmen li ser jiyanê tesîr nekin? Û bû  gelek sedema daristanên agir pê ketî û giya û kulîlkên çilmisî bûbû. Tiştên ku dikevin ber çavên mirov, yên ku vê welatê neqişandine ne kulîlkên renga renga, ne daristanên mezin û ne jî kaniyên ava wan sar û zelal in.

Ew pirsgirek ne tenê pirsgireka Gela Kûrde, pirsgirek pirsgireka hemû Gela ye. Çareseri ji ne tenê li ser milê gelê Kûrd e. Pêwîste ku Kurd, Arap, Tirk, Pars bibe nîşana Demokrasi û Aşîtiyê. Gelek sedemên netewperest dibe encama dijminatiya ava dike.

Iraq ê de gelek guhertinên erenî hatiye çekirin. Lê belê hîna pergalekî yararşî xwe dide xuyakirin. Ew yararşî gelek xeteren bi xwîn dide avakirin. Viyana

gel ji holê radike. Heger Gel dixwaze jiyanê bi şahî û rûmet bê kuştîn gereke bi viyana xwe bi awayekî demokratîk bide avakirin. Seknandina komkujî ya Halepçe... Bi encama demokratîkbûna Gelan re ye bibe çareser. Demokratîbûna Kurda demokratîkbûna hemû mirovane.

Halepçe ne ku bibe gola xwîne, bila bibe gula jiyanê. Êdî kes naxwaze rondikên bi xwîn û kuştîn, talan....

**29-Adar-2004**

## REWŞA JİNÊ HÎNDÎSTANÊ

Dema mirov li dîrokê Hîndîstan ê dinêrê mirov dibîne ku dîrokekî gelekî dewlemend e. Despêkê Hîndîstan navenda şahrîstaniya jinê bû. "Navenda xwedewanda" bû, bi vî awayî dihate naskirin. Dî dîrok a çînde çemê herî mezin çemê Enduz cihê xwe yê taybet dinava şahrîstaniya çînêde digire. Çemê Enduz taybetmendiye kî xweye taybet dinava şahrîstaniya çînede girtiye. Lê belê Hîndîstan ji cewherê xweye berê hêdî hêdî durket. Ji ber ku Hîndistan şahrîstaniyek xweyê dewlemend hebû, ji bona wê Îngiltere dest avêt dewlemendiyên Hîndîstanê. Û hêdî li ser Şahrîstaniya Hîndîstanê metingeh dan avakirin.

Hîndîstanê de, ne rengê jinê ma, ne jî mafê jinê ma.... Îro jin, keç di nav mercên çawa dene? Di Hîndîstanê de jin li gor xebatên ku dimeşînin nikaribûn destheqê xwe bistînin. Jin mîna pergalekî li Hîndîstanê tê şixulandin. Mafê wan tên xwarin. Li gel wan, qîmeta lawirekî, ji ya jinê hîn qiymetire. İrf û adelet wan de, çêlek gelekî pîrozê û bî vî awayî lê

meyze dikin. Em li ber irf û adetête wan rêz digirin. Lê çima qiymet nadin jinê?

Dema ku jinê Hîndîstanê zarokên wan çidibin, dema keç be, çavê wan tijî bi êş û jan dibe. Lê dema lawik be hîngê ji bo wan şox û şenge. Li gorî lêkolîvanên ku hatine kirin....Hîndistanê de kuştina keçên hîn zedetir dibe. Ji ber ku keçik dema mezin dibe û ditin mêr, gereke li ser jî pere û zêr bidin mêrê jinê. Bi wan sedema jî zarokên rûyê wan xwerû, birçî ku çav li singa diya xwe dikeve digrî. Hîna tiştekî nîzane, wan keçên bi vî rengî bi arvan sor dikin û didin wan ji bo ku  keçên wan bi ar bifetisin û  an jî jer ditin wana. Keçên bê tawanbar bi kenekî şêrîn û çavên tijî xwerû meyze dikin, lê hîna mirin û jiyan çi ye nizanin, tên kuştin. Nîzîkatiyên çewt  hîna xwe dubare dike.

Ango; gelek mînakên cuda cuda hene. Yek jî wan jî, dema mêrê jinê dimre, gereke ew jin jî bi mêre xwere were şewîtandin. Bi wan sedema jin dibe milkê zilam,  bi vî awayî mafê jiyanê jere nin e. İrf û adetên çewt û şaş hîna xwe berdawan dike. Gazînên wan keç û jina kî  yê çareser bike û li ser bizekîne. Ev zîhniyeta wan heyanî kengî li ser civaka Hîndîstanê de desthilat be. Sunetkirina jina, fuhuş her ku diçe, zede dibe. Li dijî vê yekê gereke were seknandin û li hemberî wê têkoşînekî  were kirin. Hêdî bese kuştina jina... helwesteke bi vî rengî êdî xizmeta azadî û demokrasiyê nakê û dibe asteng. Ji bona wê divê ku em destê xwe deynin li ser wicdana xwe em bi axifin. Bêguman, pirsgirekên hemû cihanê fêm bikin û li gorî

pîvanên wê nêzîkî pirsgerêkên civakê bibin. Encax bi vê yekê em dikarin xwe ji nû de nûjen bibin. Pirsgerekên Hîndîstan û gelek waletên cuda cuda jî gereke em pirsgirekê xwe bibinin. Kî bixwaze ku rastiya nas bikê pêwîste rastiye xwe jî nasbike.

Di bin şer û mercan de berjewendiyên hemû jinê rast bikin û gav bavêjin. Jin ji bo sîstema xwe pejirandiye û ji bo berjewendiyê xwe bi kar anine. Tahrîbate li ser Hîndistanê hatî çêkirin bila hêzên kevneperest ji xwe pirsbike. Rewşa Hîndîstan çima wisa ye? Yek jî pirsgerêkên herî girîng jî, pirsgerêka jinê bi xwe ye. Heya ku mafê jinê tune be, hertîm pirsgerekên cîhanê wê berdewam be.

**05-Nîsan-2004**

## EM TÎRÊJÊN AZADİYÊ HEMBÊZ BİKİN

Bi agirê azadiyê ku berdane bedena û xwestin li keda xwe xwedî derkevin. Lewma jî ew bûne sembola îro. Xala herî girîng jî ew e ku îro di her 1ê Gulanê de ew roj bi çalakiyên kedkaran tê pîrozkirin. Tevê cîhanê wê roja girîng bi dildariya keda xwe pîroz dikin.

Di hemû şoreşan de jinê bi  çalekiyade bersiv dayî ku bi çalakiyên bi azadiyê cihê xwe digre û heta niha jî rolekî xweyê girîng leztiye. Hinan li karxaneyan, hinanî jî di navbera çar dîwaran de li zindanên tarî bi vê agirê re xwe yek kiriye.

Tu caran bergîranda keda wan nehatiye dayîn. Mafên karker û kedkaran ji aliyê çîna serdest ve hatibû xwarin. Ji bona vê jî li Febrîqa Şîkargoyê jinan dest bi protesteyê kirin û mafê xwe xwest ku xweyî li keda xwe derbikevin. Bi hêjmarek zêde jina  xwe di febrîqê de agir berdana bedena xwe... Ev çalakî, bi pîrozbahî û tevlîbûna rengê jinê re îro ji her demî zêdetir tê xemilandin.

Ji ber ku jin kelha çînî a bindest e, dibe bingeha esas ya hêza karkeran. Karker û jin di gelek xalan de têne cem hev û gelek taybetmendiyên wan yên weke hev hene. Ango jin, xulikdarê kedê ye û bi taybetî sembola yekemîn ya kedê ye. Jin her tim xulikdara avabûna jiyanê bûye û mirovahî di dergûşa jinê de mezin bûye. Keda wê gelek mezin û dîrokî ye, lewma jî dibe serkêşa jiyana nû.

Nêzîkatiyên ku li hembêri çîna karker tên pêşxistin berjewendî û polîtîkayên serdestan diparêze. Lewma jî tê xwestin ku sedsala 21an li ser vê esasê were sazkirin.

Emperyalîzm polîtîkayên xwe yên li ser jinê hîn bêhtir kûr dike. Ango; bi rêya Medya jinê weke meta bikartîne û girêdana wê esas digire. Ji bona vê jî pêwîste çînên bindest û karkeran hemû di sedsala 21an de têxe nava bûhran û nakokiyên kûr.

Nêzîkatiya Emperyalîzmê ya li ser azadiya jinê li ser bingeha têgihîna ji kesayet re biyanî hiştine pêş dikeve û ev bişêweyên tenik tê meşandin. Lê belê jin polîtîkayên pergalê baş naskiriye. Ji bona vê jî pêwîste jin serkêşiyê ji karkeran re bike.

Wê demê dê karibe rûyê pergalê yê veşartî derxe hole.

Li Kurdistanê pêwîstî bi ji her alî ve lekolînên li ser jinê were çêkirin. Di gelek waran de jin bûye bingeh û sedema guhertinên muezem. Jinê mora xwe li guhertin û veguhertinên Kurdistanê daye çêkirin. Ev rewş li gelek welatan jî bi vî awayî ye. Lewma jî di 1ê Gulanê de divê em dîsa bibin pêşkêşê guhertinên nû.

Jinên li Ewropa hîn zêdetir dikarin tevlî 1ê Gulanê bibin. Ji ber ku potansiyelekî gelek mezin yê jinê heye. Bi vî awayî dikarin polîtîkayên emperyalîzmê yên li ser jinê bê tesîr bikin û Ewropa bi rengê jinê ji nû de bixemilînin. Pêwîste Tirkiyê jî li ser esasê pêşxistina demokrasiyê mafên wekheviyê yên karker û çînên bindest nas bike. Jinên Kurd û Tirk bi çareserkirina pirsgirêka Kurd dikarin xwe bigihînin rêxistinekî hîn xurttir û di çalakî û pîrozbahiyên 1ê Gulanê de pêşkêşî bikin.

Pêwîste em tîrêjên azadiyê yên ronahiyê hembêz bikin.

**28-Nîsan-2004**

## KEDA JİNÊ

Ji kûrahiya dilê hemû jinên kedkar em hemûyan di wê roja taybet de pîroz dikin. Ew rojên burî bi rengê jinê hatibûn xemlandin. **1**ê Gulanê roja şahiya xweyî derketina kedkarane. Ye ku di dîrokê de keda rengîn afirandiye jin bi xwe ye. Jin li herderî bûye bandora rasteqîn. Gereke jin bi rengê xwe li herderî jiyanê bi xemilîne. Bi rengê xwe yê Neolotîk li ser mirovan bike ramananên aşîtiyê.

Keda jinê îro bûye sembola 1ê Gulanê. Hawldana jinê li gelek deveran de ber bi çave. Jin bi dil her tim xwe daye pêş, lê belê gelek sedem bûye asteng-kelem li pêşiya jinê. Em hertim dibêjin jin di dîrokê de rolekî girîng leyistiye. Lê ew keda hatî afirandin, sîstema baviksalarî li ser keda jinê rûniştiye û mafê jinê ji holê rakiriye. Bi vî rengî sistema baviksalarî li ser navê xwe nivîsandiye. Bi vî awayî keda jinê hatiye veşartin. Keda ku jinê daye avakirin hertim di bin perda reş de hatiye veşartin û li ser keda jinê hatiye bikar anîn. Ya ku li ser jiyanê herî rast dibe bandor jin bi xweye. Bi fikirin ku li derî jin tûne be, yê çawa

bibe.? Wê jiyanekî bê raman, bê fikir û tiştên erênî pêşnakevin. Li dera jin hebe, hûnê bibînin ku hûnerên cur bi cur daye avakirin.

Lê ev rastî jî heye. Rastiya ku civaka jina Kurd têde ber bi çave. Qîmeta jina Kurd nayê dîtin. Îro li herderî jina Kurd bûye rêbera azadiyê û kedê ye. Ji bona wê jî gereke ew nirxê jinê dayî ava kirin rêzekî bi dil were dayin.

Di van rojê dawî de gelek tiştên ku dilê mirovan di êşine tên rojeve me. Tiştên ku herî paşverûne. Ev sedsala 21an sedsala jinê ye, hem hemû dibêjin. Lê rastiyên herî bi êş û jan tên jiyankirin dibe sedema xeter bûnê li ser jinê.

Keçekî 14 salî tê revandin. Û ew keça pak û xwerû li ser wê tê tecawûzkirin. Piştî wê çerxa felekê, bi ser de jî, bavê keçekê diçe qîza xwe bi destê xwe difetisîne. Ew çi rastiye? Li tariya koletiya bênç hezar sala hîna berdawam dike. Tawanbar kîye? şûna qîza xwe qazenç bike û alîkarî bide, radibe bi navê ez ê namusa xwe paqij bikim qîza xwe dikujê. Bi vî awahi dîsa neheqî li ser jina bê tawanbar tê kirin. Yê ku bê tawane jine... çima ew rastî naye dîtin? Yê ku li ser keçekê tecawûz kiriye tawanber e. Bi wan sedema bi dil êş dîsa li ser keda jinê tê rûnişkandin û mafê jinê naye dîtin. Sedema wan kî ye? bila kes ji bîr neke ku îro em hemû bi keda jinê gihane astê herî bilind. Yê ku îro riya pêşketinên mirovatî û wîjdanî pêşbixîne dîsa jin bi xwe ye.

**01-Gulan-2004**

## BERXWEDANA JİNÊ

Heyva Gulanê heyva berxwedanî yê ye. Ew rojên Gulanê em sere xwe ditavînîn, ji ber ku gelek şehîdên qehreman û bi qîmet hene. Îro ev şehîd bûn sembola berxwedanî ya hebûne jiyane.

Bi çîruskên azadiyê berxwedanî li bajar, çiya û gelek deveredin cur bi cur pêşket. Herçiqasî zorî û zehmetî ser mirova hatibê kirin jî lê dîsa bi awayî berxwedanî kêm nebûye. Hebetir hemberî kewneşopî, berxwedanî hatiye peşxistin. Ew berxwedanî tim hatiye ser zimanê Kurda û bûye destana rasteqîn e.

Mînakên vekî heval Zîlan, Bêrîtan, Sema, Hakî Karer berxwedanî wan berbiçave. Bi vî awayî, yên ku di zîndana de dilê xwe kirin yek û agir berdan laşexê xwe û bûn Tolhildana salan...Yên ku bi pîme pombê canê xwe fedakarin û bûn hebûna jiyana nû. Heval Bêrîtan ji bona nekevê deste KDPê de rabû bi hezek viyanî xwe li ser uçurume herî bilinde xwe avet. Teslimiyeta kewneşopî kabul nekir. Bi rûmetekî bi aste herî bilin de, berxwedanî peşxist û bû sembola berxwadanî. Ji bona azadî xwe kir dilê milyonan mirova de. Ji ber ku çanda Kurdan berxwedaniye. Ji bona gele Kurd jî ew xal gelek girîng e.

Ne tenê nava dîroka Kurdan de bi tenê berxwedanî pekhatiye. Dîroka jinê de gelek dewerê wekî Rusya û Almanya di çalakiyan de peşengtî ya ku berxwedanî hati çekirin nîşan dane. Ji ber ku jinê de giyanê berxwedanî gelek e. û Serkeşiya berxwedana gelek deverê de hatiye peşxistin.

Hinêk ciyan de hunermend û rewşenbîr ji ber ku hemberî pergala Sistema rexne kirine, hatine dalîqandin, an jî hatinê vîndakirin. Lê belê ticarî berxwedanî kêm nebûye dîrokê de. Herçiqasî pevajoya de dem bi dem îxanêt ji derketîye holê jî lê dîsa yê ku wanda kirî jî şexsên îxanetçî bûn, yê ser diket jî berxwedanî bû.

Ango; ew heyva pîroz de, Emperyalîzm bi nîqaşên yasayên ku afûkirina mirovan peşxistiyê. Lê belê Emperyalîzm ev rastiyan Kurda bi înkarkirinê, nikare tî guhertinên bingehî bike. Û wan nizikatî dihele ku gelê Kurd hîn bêtir hêrs peşbikeve. Bi wî encamê înkarkirina nasnama me ya Gelê Kurd e. Ticarî bi wan nezîkatî dihêlê ku gelê Kurd pirsgireka çareser nabe. Hinbetîr pirsgrêk dibe girêkî mezin. Ji bona ve jî pêwîste Tirkiyê û Emerîka polîtika xwe ya ser esasî înkar  kirina Kurda dev jê berdin. Bi vê yekê sistema xwe ya kevin nû bikin û gavan ber bi biratiya gelan ve bavêjin. Ji ber ku çanda Kurda Berxwedana a li ser jiyana nû ye. Gelê Kurd axîna azadiyê û hesreta nasnama jinê ye.

Ew roja Dayika em pîroz dikin. Bi Gele Tirk û Kurdan bi dilekî keyfxweş em tim dayîka hembêz dikin. Cewherê tevahi Dayîka jî ewe ku Rastiya Pergalê bibinin û zihniyetik nû serde biçin. Ser esasî Yekîtiya Kurd û Tirk ew roja girîng de tim dayîka Serkeşîya rastaqîn a ku Demokratîk bikin.

Pêwîst heye ku em bibin xizmetkarî vê doza berxwedaniyê…Ango; gîştî cîhan bibe evîndarê Demokrasiyê.

**20-Gulan-2004**

**STÊRKA SİBEHÊ**
**Çalakiya Heval Bêrîtan**

**Rastiya wê strana, rastiya Heval Bêrîtane.**

**BÊRÎTANA MİN**

**Çendî hebim li bîrnaçe..... Bêrîtana min**

**Awaz û siruda li ser devê ... Bêrîtana min**
**Kulîlka deşt û çiyaye..... Bêrîtana min**
**Di enya pêşde wê can daye..... Bêrîtana min**

**Cenga jînî te xweş dikir..... Bêrîtana min**
**Wekî Pêlan êrîş dikir..... Bêrîtana min**
**Çeper neda di berxwe dida..... Bêrîtana min**
**Paşverutî mehkum dikir..... Bêrîtana min**

**Di eniya şer de ya li pêş bû..... Bêrîtana min**
**Di şehîdbûnêde, her li pêş bû.... Bêrîtana min**
**Wek şeveqê ron u geş bû..... Bêrîtana min**
**Xemla xweyî Bukanî sor bû..... Bêrîtana min**

Her ku mirov rastiya şehadeta Heval Berîtan dibîne, wîqasî dikeve dinava xemgîniyek mezinde. Şahadeta heval Bêrîtan dilê mede birînekî pir xedar çêkir. Qîrîna heval Bêrîtan li hemberî îxanetê guhê me de dengê berxwedanî bilind dike. Ji ber ku kesayata wê de xoşewist û zanabûna wê dihişt ku kêm kêmasî bike. ji ber vê yekê pir dihate hezkirin. Bi taybetî jî di karê xwe de herdem serkeftin dixist destê xwe de. Şahadeta heval Bêrîtan hîn bêhtir di çavên gerîla de mezintir dibû. Eşqa û azadiya wê bê sînor bû. Bi taybetmendiyê xwe bû dewlemend û dilê hemû jina da bû sembola berxwedaniyê.

Malbata heval Berîtan, xwedî pir zarok bû û ji hêlên madî de pir hejar bûn. Oliya Malbata Heval Bêrîtan, ola xwe elewî bû, di hêlên civakî de kesên rewşenbîr, entelektwel bûn. Ev taybetmendî hiştiye ku

heval Bêrîtan bingehekê huner, çand pêşbixine. Gelekî rind û xweşik edebiyat dinîvîsand. Hunera destê wê mîna nîvîskarên cur bi cur bû. Herdemî xwediyê armanc, hêvî û baweriye bû. Pîvanên hezkirina xwe bi awayekî eşkere datîniya holê. Di kesayata xwede taybetmendiyên milîtani pêktanî. Di helbesta xwede dibêje:

Ez buqas zereyekê ji mirinê natirsim
**û mirin li min zor nayê**
**lê belê ...!!**
**temaşake li van çiyayên**
**noqbuyî di nava şefaqê de**
**tenê ji bo em kêliyekê bi hev re**
**li wan temaşakin**
**ez naxwazim bimirim.**

Heval Bêrîtan di çalakiya Rubarak de cih girti bû û di wê çalakiye de guruba êrîşê cihê xwe digirt. Di wê çalakiye de birindar dibe. Ji bo birindarbûna xwe gelekî ser bilind nêzîkgî xwe dibe. Di wê çalakiye de berxwedaniya jina pir cuda û balkeş bûn. Wêrêkî û mêrxasiya Heval Bêrîtan gelekî ber bi çav bû.

Dijmin dixwazin êrîşekî mezin li ser hêzên gerîla bikin. Piştî demekî dirêj cebilxanê Heval Bêrîtan bi dawî dibe. Li ser Heval Bêrîtan êrîşê kî pir dijwar tên. Di dawiyê de dema ew mêze dike tu rêka xelasiyê namîne, ji bo ku nekeve destê netêwperestên Kurde Heval Bêrîtan çareseri bi berxwaniyê dibîne. Hêzên dijmin hêdî hêdî nêzîk dibin û gazî wê dikin.

Dema dengê wan dibîhîze; ji bo nekeve destê dijmin û gulên xwe, latên tûjde lêdixwe û perçe perçe dike. Û piştra jî sloganan daveje "Bijî Serok APO" tilîliyên dikşîne li ser zinarên Xakurkê. Dijmin bi dengekî bilind dibêje:

-Teslim bibe

Li hember wan axaftina; Heval Bêrîtan dibêje:

***-PKK teslim nabe, yê teslim bibe ketxwarî, paşverutî û xîyanetkariye.*** Piştî axaftînên xwe bi dil. Xwe ji serê zinara davêje xwarê . Bi qîrîniya heval Bêrîtan re xiyanet û paşverûtî hate darîzandin. **Serok APO** dibêje: **"Jin dema şer dike, azad dibe, dema azada, xweşik dibe, dema xweşik dibe, tê hez kirin"**

Keçên Kurd bi sedan, ji bona nekevîn destê dijminde, bi gulên xwe ve, yan jî xwe ji kendalan-zinaran de avîtine. Mîna Heval Bêrîtan, di şer de gelek jinên Kurd bi cengaweriya xwe ve hatine naskirin û li ser zimanan, bûne efsane. Yek ji wan Heval Bêrîtan bû. Heval Bêrîtan di sala 1992 an de cihê xwe şerekî dijwar digre. Bi vî awahî ji bo ku nekeve destê kevneperestiyê re naxwaze teslîm bibe. Bi vî awayî çalakiya xwe pekîne.

Çalakiya Heval Bêrîtan li ser gelê Başure Mezin jî bandorekî pir mezin kiribû. Wekî helbestekî ji nû de xwe afirandi bû. Xeta Berîtan ji bo jinên azadiyê gelekî rûmete. Berîtan xeta azadiyê yê û berxwedaniye ye. Berîtan tekoşîne, xelasbûna hemû jinên kurd e. Ji bo ku xeta Heval Bêrîtan hewl bidin ku çalakiyên demokratîk, serhildan çêbibin.

Xeta rastiya lehengî wan kesan re ji bo jiyanekî rûmet peywendiya wê nûkirin. Bi taybet ji Xeta Serok APO famkir û bû bersiva jinên Kurda da...

24-Gulan-2004

## CİVAKA DEMOKRATİK-EKOLOJÎK

Di cîhanê de bi pêşketina zanist û teknîk ve di metodên tekoşinan de gelek guhertin hatine çekirin. Di demekî herî girîng de jî bo afirandina dîroka gelê Kurd gelekî pêşveçûn, nûbûn û vebûn tê jiyankirin. Bi vî awayî, em jî dibêjin ku, tevahî pêşketinên rêxistinî gelekî bi dil germî. Di roja me jî de tevahî pêşketinên rêxistinê kûr diçê. Lê bi teknîkê komkujiyên xwezayê

tînin û ev jî bi destê mirovan çidibê. Dumana faprîqa hawaya paqij qirêj dike. Jiyana mirov teng kirin û xweşiya xwezayê tune dikirin. Hîna jî berdawam dike.

Jiyan bi xwezayê xweşe, xweza jî bi mirova xweşike. Di vê wateyê de berî her tiştî di jiyankirina paradigmaya civaka demokratîk-Ekolojîk de rolekî pêşeng dikeve li ser milê jinê. Ji ber vê yekê divê xwedî hawldanê girîng bin. Yê ku herî nêzîkî xwezayê jin bi xweye. Ji ber ku sîstema baviksalarî hakime û ew jî dihêle ku desthilatdariya xwe li ser xweserist bike. Yê ku hêza teknik di destê wan de be, hawirdora mirovan bi xwere tune dike. Civaka Demokratîk-Ekolojîk bibe alternatîfa pirsgirêka sistema bi zihniyeta kevin. Ew di sedsala nû de pêwîstiya sîstema Demokratîk- Ekolojîk heye. Mirov û hevpar, insan-xweza, insan-insan têkiliyên hemûyan pêkanîna wan bi awayekî Şahristaniya Demokratîk, perspektifên ji nû de pêwîstin. Ji bo cîhan, bi fikrê felsefîk, teorîk, ideolojîk- siyasal, ahlaqî û wicadanî bi wan sedeman pêwîste rengê hemûyan hebê. Civaka demokratîk-Ekolojik wateya wê çi ye? ne tenê bi fikrê (birikim) insana, şahristaniya berembere wê zindî-bê can, xweza bi wan hemûyan gereke were fikrandin û zihniyeta bi vî rengî ye. Ji bo vê jî divê, em destpêkê demokrasiyê di xwede saz bikin û bi qasî ku di xwede bi cih kir, hingê emê derbasî civaka bikin. Civaka ku xwe gihandiya astekî zanistiyê xwe di ber hemû pirsgerêkên mirovatiyê yên sedsalê de berspirsiyar bibinin. Di civaka me de ji têgînî, teknîk û demokrasiyê biyanitiyek heye. Ji bona derbaskirina vê pêdivî bi za-

nistiyekî entelektuel û gihiştina paradîgmaya nû heye. Paradîgmaya nû li ser bingehê sosyalîzma demokratik e. Mirov dikare bi vî rengî xwe di felsefa Serok APO xwedî derkevin û çanda demokratîyê bide rûniştandin.

Teknik ji bona xizmeta mirovatiyê hatiye avakirin lê, teknoloji di destê kî de ye? em gereke ji xwe pirs bikin.... Di Tirkiyê de cihê girîng 263 şonên xwezayê tê zanîn. Cihên ku li kurdistanê bi sedane tê zanîn û yê ku naye zanîn jî hene. Hinek ji wan di şer de hatin tunekirin. Lê bi destê insana hatin şewitandin û tune kirin.

Çukurova hawîrdora zozana hemû bi daran hatibû xemilandin. Ji bona çandinê hemû dara, piranî ji koka wan hatin rakirin û gundiya tiştên xwe çandin. Bi vî awayî daristan ji holê rakirin. Piştî wê cihê çandî, derman kirin ew jî hişt ku çukên cur bi cur bimrin. Dîsa mînakekî din, Çukurova li dera Azarza hemû tehtên bilind bûn û li ser wan tehtê tije kartal bûn. Ew kartal rengê xwe pir cuda bûn. Xweşikbûna wan kartala, li ser asîmana dibûn xeleka erênî. Li wî gundî hêstirên wan dimirin û li ser kelexê wan jehr dikin. Bi vî awayî kartal li ser kom dibin û hemû tên tunekirin. (soyu tükeniyor) Bi kuştina wan, xema kesî jî nîn e... Xezalên çav belek û wekîdin (soyu) wan hêdî hêdî tune bûn. Lê kes napirse û xwedî li xwezayê dernakevin. Bi makine daristana kirin sarayên çimento. Şînahî kirin betonên ziwa. Bi wan sedema axa Tirkiyê hêdî gelê xwe têrnake. Bereketa axê hêdî xwe ji nû de na afirîne. Eger mirov şîrove û lêkolînên di derbarê pêvajoyê de bike hûnê pir xweş bibînin ku, çawa

xweza ji holê radibe û zerarê dide hawîrdoran. Bi pejirandina teknîk gelekî şaşitiyên pêkhatin. Ew jî tesirekî li ser mirovan kirin. Di wan sedsalên nû de tenduristiya mirovan pir zêde bûne. Bi vî rengî jiyana mirovan diçe ber xeterbûnê.

Bi ruhekê Civaka Demokratîk- Ekolojîk xurt li hemberî xeta Serokatiyê pir hişyar û hertim xwe bi berspirsiyar dîtin gelekî girîng e. Di bin her şert û mercê de berjewendiyên gelê kurd, yên mirovatiya bindest Fêmkirin gereke. Di wicdan û zihniyeta xwe de gelekî girînge û li ser esasên famkirana civaka demokratîk- Ekolojîk pêwîstiyekî insaniye.

**29-Gulan-2004**

## TAWANBAR Lİ KÛ DERÊ NE?

Kurd, îro dixwazin birêxistin di rêya nûjen û bi viyan de bimeşin. Lê belê polîtîkayên kevneperstan dihêle ku Kurd dîsa ber ve dîroka xwe ya paşverû de biçin. Tirkiyê dixwaze ku Kurd dîsa li derveyî dîrokê bimînin. Bi polîtîkayên xwe pirsgiraka Kurdan hîn behtir kûr dikin.

Tirkiyê wekî her demî bi çaresernekirina pirsgi-rakên civakî re dîsa ber ve kaosa aborî ve diçe. Dîsa bi pêleyîstokên xeter dileyîze.

Gelo miletên bindest dê bi çi awayî karibin xwe ji zext û zordariya serdestan biparêzin? Her tim pergala desthilatdar xwestiya ku Kurdan ji holê rake, an jî Kurdan ji xwe re bike xulam. Kurdan di tarîtiya dîrokê de winda bike û ji pêşengên wan qut bike. Lê belê dîsa jî li hemberî hemû astengî û keleman rê tê domandin û hêvî tu caran naşikê. Pîvana wan bûye gihîştina ruhê APOcîtî. Lewma jî Kurd êdî gihane asta zanebûna pîvana xwe. Ji ber ku li dijî îxanetê, gelek kes bûne ronahî û çirûskên agirê û êdî Kurd baweriya xwe bi wê ronahiyê tînin.

Îro hikumeta Erdogan dixwaze gelê Kurd bê viyanbihêle, daxwaziyên wan binpê bike. Bi taybet jî li beramberî ciwan û jinên Kurd êrîşên derveyî mirovatiyê têne pêşxistin. Ev rastî li ber çavan e, ji ber ku di her warî de jin û ciwanan di sedsala 21an de rola pêşeng a guhertina civakê bi îdia û biryardariyeke xurt dane ser milên xwe. Vê biryarbûnê jî bi meşa xwe ya azadiyê re, bi coşeke mezin pêk tînin.

Ciwanên Kurd û Tirk li ser esasê tevlîbûna demokratîk li Enqerê meşiyan heya Amedê. Bi raman û rûmeta xwe ya mezin, meşa xwe bi ser xistin. Ji ber ku di bin ronahiya rojê de giyanewer bûn.

Li Tirkiyê hin kesên rantxwar, bi rengê herî wehşî êrîşan dibin ser welatparêzên Kurd. Bi destê kontrayan li gundêkî Çewlikê mirovên bê sûç têne kuştin. Bi zanebûn li ser wî gundî zordarî tê kirin.

Çewlik di warê erdnîgarî, civakî û dîrokî de bajarekî dewlemend e. Kurdên wê derê bi welatê xwe ve girêdayî ne û hema hema bi giştî welatparêz in. Ango

viyan pêş ketiye. Lewma jî dixwazin vê carê ji Çewlikê dest pê bikin. Hin derdor ji pêşketina viyana gelê Çewlikê nerehet dibin. Mînakên wisa gelek in.

Ango; bi polîtîkayên înkarê diçin ser partiyên siyasî yên ku biratiya Kurd û Tirk bi lêv dikin. Ev zordarî wekî zincîrekî di her xelekî de xwe dide diyarkirin.

Dîsa li ser navê poşmaniyê pêvajoyeke nû didin destpekirin. Lê, ew jî di naveroka xwe de dîsa înkara gele Kurd hildigire. Çeteyên ku navên wan di bûyera Susurlukê de derbas dibin berdide derve û dîsa xwînmijên ku navê “Hîzbulah” li xwe kirine bi hêsanî têne berdan. Lê belê, çima mirovên ku yek du peyv bi zimanê Kurdî axifinê nayên berdan û wekî “xayînên welat” têne lensekirin.

Li gorî we tawanbar kî ye? Çima kesên ku daxwaziya biratiya Kurd û tirk bi lêv kirine nayên berdan û qontrayên ku jiyana xwe li ser mijîna xwîna civakî ava kirine bi hêsanî têne serbestkirin?

Dewleta Tirkiyê behsa demokratîkbûn û edaletê dike. Lê belê pratîk berovajiyê mijara gotina wan e.

Bi nêzîkatiyên mêtingehî û bi parastina berjewendiyên xwe yên rantê nikarin tu serkeftin û nûjeniyê ava bikin. Ango; di zîhniyeta xwe de nikarin guhertinekî nûjen û civakî pêk bînin.

Tu caran zarokên ROJÊ xwe ji ber tîna tîrêjên ku ji axê re bûne çavkaniya jiyanê nadine alî. Tu kes lehengiya wan ji bîr nake. Ji ber ku hêvî, bawerî, fedakarî bi berxwedaniyê têne naskirin. Eger Tirkiyê di

nêzîkatiyên înkarê de israr bike, wekî dûpişkên dema ku dikevin xeterê dê derziya xwe ya jahrê li xwe bide.

08-Hazîran-2004

## Dİ HÊVİYA JİYANÊ DE Dİ DİL

Di dîrokê de cara yekemîn ji civakbûnê re rêvebertî kirî jine. Jin zanistger û pêkerê jiyanê ye. Yê ku yekem car tişt dayî destpêkirin û afirandiye jin bi xweye. Di nava çirûskên agirde xwestibûn jiyanekî nû bidin afirandin...Wekî, Demetra, Îsîs, Afrodît û Înana... Dagirkerî dinava demêde herikî û çû, Her ku çû xweşikbûna hindirê jinê de xurt û tond bû. Dengê jinê bi demê re kêmbû. Qêrîniya wê di hindirê wê bi xwede ket bin axê. Peyvê bêdeng bûn ala hezkirinê û pir mezinbûna ji azadiyê re careka din ala xwe bilind kir.

Ala tekoşînê ku li dijî paşverotiya ku qasî moyên porê xwe vejîn kiriye. Her ku ala serkeftinê dihat hildan hewqas jî di dilê me jinande xweşikbûn dida pêş.

Royê wêyê bi hêvî û piştî meyzandina wê cûda bû... bi meyzandina bi hêvî û bi vî awayî rêwîtiya evînê bi hezaran mirov, di dilê wande jiyana azadiyê û meşaleya azadiyê çêkirine.

Ewin Zîlan Sema û her wekî din hevalên meyên jinin. Wekî her jinan jî Sema û Zîlan jî li êş û sanciyan kişan dine. Bê wijdaniya desthilatdaran, gelekî bi bandor bû û dijwarî hatinin hejandin.

Zoriyên ku ji aliyên sistemê ve dihatin meşandin û mîna ku silogan "despêkê li jinê bidin" hatiye kirin. Zîlan li hemberê vê gavekî xurt avêtiye, Sema... bi xwe bawer, serhiş, pir zêde bi îrade, bi serê xwe hereket kirin pir pêşdebû. Bi paşverotiyên hindirê xwe qebûl ne kiriye. Hêza kesayetiya xwe xwe de li hember sistemê rabûye... Zîlan û Sema ketin dinava tanaqodên civaka kurde û dinavde dan fikrandin.

Polîtîkayê qirêj ku li hemberê jinê têne pêkanîn marjîlaştirmeya hatî kirin xwestin bisekinin û destê xwe rakirin û bedenê xwe dan agir, ketin li ser rêwîtiya rêya azadiyê.

Tengasiyên koletî yozlaşma bivî awayî bê sekin berxwedan kirin û hedefekî, hêrsekî bihîstine, yekem carê jinê kurd gav avêtinekê xurt û bi serkeftin daye avakirin.

Yê ku pir zêde Serokatî fêmkirî û yê ku kirine piratîkê ewanane. Mîsyonê ku Serokatî daye jinê û ek-

senê îdolojiya jinê fêmkirine û xwestekê jiyanê bê nikarina û hemû gerdûn dane bihîstin.

Çalekiya hevala Zîlan dibe ku mîna întîhariya dijwarî dihate dîtin, ema di rastiya xwe de wateya jiyanê ji bona rastiya aşitî û heskirinê ev çalaki pêkanîn. Ev erişekê ku li hemberî zilama kewneperst bû. Gereke ev çalakî ne diyariye ku întiharî de weredest girtin. Ev çalakî li hemberî îdolojiya zilamê kevneperst bû. Ji ber ku wana ji me bêhtir ji jiyanê hezdikir. Eger wana ewqas jî vê jiyanê heznekira wana nedikarî vê çalekiyê pêkbanina.

Zilan û Sema di sedsala 21ande rêbertiya jinê kiriye û rê daye nîşandan, taqipçiyê riya azadiyê ne. Wekî her jinekî pêşdene de bû û  Zilan û Sema; dîrok, çax û pêşeroj fêmkir, û bî vî awayî xistin pratîkê de. Berî hertiştî em wana fêmbikin û bi vî rengî nêzikî çalekiya wan bibin. Ewana berî hertîştî lêpirsinê di hindirê awade, lihemberî dîrokê, rojameya îroda biserxistine.

Rûyê Zîlanê mîna heyva bi şewqa dida gelê xwe. Sema bi mezinbûna xwe û çavên xwe yê ku bi aştî pêşeroj meyze dikir. Hêviyên wê xeyalên wê di hindirê gerdunê deng veda. Awana cudabûna ji jinên din bi serkeftî bi serxistin. Zilan berî hertiştî di jiyana xwede sistem li bingahê hev xisti bû. Ew bû xwe jiyanek bi îda xwestibû. Rêyên azadiyê bi bedena xwe parçe parçe belav kiriye. Komkirina laşê Zîlan, ji bo jinên din bû pêşeroja azadiyê, yê bibe tovê jiyanê.

Sema, Zilan  carekedin hêjabûna xwe  bi evîna xwe dilê mede dadengvedan. Mîna sterka sibehê bi-

tevu balkeş bûna xwe li ser eniya me, di jiyana mede neşqiririne.

Felsefeyê jiyanê didin xuliqandin, zîndikir û dû çiçekên azadiyê bûn. Girêdane Zîlan û Sema didemê de girêdana meya di bi deyer û gel re ye derbasbûna pêşiya zoruyan, serkeftinek yê çêbike. Mîna çemekî diherike û (çekici) bêşvan xweya bi çemê din re di bû yek, mîna Sema û Zîlan emê jî destê xwe bidin hev û bimeşin. Ji bo jiyanek bi demoratîk û wekhevî, ji bo jiyanekî aşitiyê berbî rojê aşitiyê bimeşin.

Şahadetên di meha Hezîranê de û şehîdên şoreşa cîhanê de em bîrtînin û li hember bîranina wana bi hurmet wana bîbîrtînin.

**13-Hazîran-2004**

## KÊFXWEŞİYA ZİMANÊ KURDÎ

Ev çend rojên borî bi dilekî coş em li benda zimanê Kurdî bûn. 9. Hezîranê televizyona Tirkan da TRT.3 seat 10/30 de zimanê kurdî despêkir. Coş û heycana zimanê Kurdî bandorekî li ser hemû Kurdan kir. Piştî çend salên bi êş, îro li ser kanalê Tirkî me zimanê Kurdî temaşe kir. Cara duyemîn hemû hevdîtin li ber TV pir bi balkeşî meyzedikirin. Rûyê her hevalekî de xweşikbûna hêvî gelekî diyar bû. Çavên wan mîna stêrkan diberiqand. Atmosferekî gelekî bi hest xwe dida diyarkirin. Di TV de programa bi

navê **ZENGÎNÎYA ÇANDA ME** de nûçe, spor, mûzîk ji Anadoluyê temaşe kir. Herçiqasî kinbe lê disa ji gelekî dewlemend bû.

Ji bona Tirkiyê gavekî gelekî erenî-baş bû. Gerek 45 dedîkan yayîn temaşe bikira lê nîvseat bû bi vî awayî em qedexedikin. Di wan salên dawîde hinek mafên Kurdan de hezar salan zordarî li ser kurdan bandoreke meyînî zimanê kurdî kiriye. Ev jî bûye sedemek ku zimanê kurdî bê xwedî bimîne. Pêşxistina zimanê kurdî dewlemendkirina wî ji hemû hêlên siyasî, zanistî û felsefî parastina vî zimanî bi riya medya ye çêbû. Dikarin bi reya TV di her demê de di hemû xwe bigihînin gel. Gereke derfetên vî encamî pêwîste ne bi seatan bi rojan hîn zêdetir bikin,

Çawa me bi hesreta kî bi kûr temaşe dikir, ez bawerim ku bêguman di her malekî de mîna me TV meyze dikirin. Îro ji bo me gelekî rojekî taybet bû. Ji ber ku mehkema Serokê Gelê kurd Abdullah OCALAN bû û piştî 10 salan Leyla Zana û hevalên wê hatin berdan. Ew mijar hişt ku em ramanên kur jiyan bikin... Vê rojê li ser me bandorekî erênî çêkir. Kêfxweşiya li ser rûye her hevalekî bandoran xwe da jiyanê. Ew roj rojekî dîrokî bû....Ji ber ku gelê kurd û gelên bindest bisalan ji destê dagirkeran zilm û îşkence kişandine. Yê ku bi xwazê rastiyan nasbike.....ji bona wê jî hevqas êş, xwîn, şer hat jiyan kirin. Lê bêlê hîna jî hêzên rantçî xwe didin pêş û astengî çêdikin. Hertim gelê kurd ji bona xwe tiştekî nekiriye û ji bo mirovên cuda cuda hatiye pejirandin. Ango, piştî hewqas êş gereke êdî em xweşî, şahî bibînin. Ma ron-

dik xwîn hêdî ne bese? Em jî hêdî dixwazin rojên bi şahî bibînin û rûmet xweşî li ser axa Kursitanê bijîn.

Li ber Televîzyonê em hemû ketibûn bi xeyalên roja azadiya **Serok APO**. Hesreta zimanê Kurdî di nava dilê me de şîn bûbû. Bi vê hesretê roja meya dîrokî li ser esîmana tije stêrkên bedew xemiland bû. Di wê atmosfere de êdî êdî em ketin xeyalên bi **Serok APO** re.

**Hazîran -18 -2004**

## ZAROK ÇAVKANİYA JİYANÊ NE

Zarok çavkaniya jiyanê ye. Ruhê hemû zarokan paqiş û xwerûye. Zarok pêşeroja me ne û xweşiya jiyanê ye û ji jiyanê hez dikin. Zarok ji hertiştî re biyaniye û ji hertiştire heyecan digire û gelekî meraqliye. Lê dema zarok hêdî hêdî mezin dibe û fêrî jiyanê dibe heyecana wê/wî kêm dibe.

Hinek devera rewşa zarokan gelekî bala mirov dikşîne. Gava ku em wan zarokan dibînin rûyê wan tirş û tehle, bi wan sedeman dilê mirovan diêşe, ji ber ku zarok zarokatiya xwe nikarin jiyan bikin, ji bona wê rewşa wan ya bi vî rengî dihelê ku bandorekî li ser me bide  çêkirin. Gereke zarok herdem kêfxweşbin, li

ser rûyê wan geşbûn, şahî, hêvî hebe. Li ser rûyê zarokan tehl, tirş ji zarokan gelekî dur be. Gereke herdem rûyê wana geş û hêviyekî jiyanê di rûyê wan de hebe û rûkentî kêm nebe.

Hinek zarok hene wî/wê di emrê biçûk de dixin binbarî de. Kar û xebatên giran didinkirin ji bo jiyan kirina malbata xwe karên ji xwe meztir dikin. Dibin baran de gelek zehmetiyên jiyanê dikşînin û naçin dibistanê û naxwînin. Ne xwendina wan heye, ne jî nivîsandian wan heye. Ji bo rizgariya zarokan emê çibikin? Ji bo piştgiriya wan çi ji destê me re gereke em bikin. Ne tenê em gereke hemû civak bikari be alîkarî wan zarokan bikin. Bi vî rengî ji bo perwerde û xwendinkirina zarokan pêwîste parastian û cihekî xweş û germ hebe. Ji ber ku ew sedsala nûde gelek tiştên xirab dibînin. Li hember zarokên tewambar emê çibikin? Ji ber ku hinek mirovên dilên wan xirab zarokan çewt bikratînin. Mîna karên fuhuş, eroyîn, dizî de tên bikaranîn. Zarok dinava mercên çawadene? Bi taybet ji dinava civaka me ya kurd de bi zanabûn, bi polîtîka zarokên kurdan dixin nava leystûkan de. Ji rêya rast durdixin û ji bo berjewendiyê xwe tên şixulandin. Bi vî awayî pêwîste li ser girîngiya zarokan bite seknandin. Bi taybet jî saziyê me....

Zarok ji hemû tiştên xirab û baş re vekirîne. Kî di xwaze ku nêzî zarokan bibe dikarin zû bixapînin, ji bo wê gereke em hemû mafên zarokan biparêzin û xwedî lê derkevin. Zarok hertim muhtacê xoşewîst, zindî........(ilgi) heye. Di vê ku em pirskirêka pîskolojiya zarokan fêm bikin û li gorî wan nêzîk bibin. Tû

çawa nêzîkê zarokan bibî, dema ku mezin bibe jî yê wîsa fêr bibe. Serokatî dibêje; “**Hertiş bi zarokatî dest pêdike.**” Dema di zarokatiyede hinek tişt, yan ji hinek buyer li ser zarok re derbas dibe dema ku ew zarok mezin jî dibe bandorekî xweyê taybet dide çêkirin. Em dîsa dibêjin zarok çavkaniya dilane û xweşiya jiyanê ye. Emcex dema zarok rast were mezin kirin hingê dikarin jiyanekî bi tenduristî bidin afirian din. Bêguman zarok ji bona jiyanekî zindî û şahiyê re amadene, lê belê encex civakî tendurîst were avakirin hingê wê demê zarok bi rast werin mezinkirin.

Bila hertim zarok dev li biken bin û giyan bibin. Ji bo parastinê pêwîste sazî û her wekîdin bikevin nava tevgerê. Bî vî sedemî mezinbûna xwe bidin nîşan dan. Em hêvî dikin ku ji bo zarokan bibe sedema bextewarî û kêfxweşiyê.

**20-Hazîran-2004**

## XWEDAVENDA ZÎLAN SEMBOLA BERXWEDANİYE YÊ

Di kesayeta hevala Zîlan de hezkirina jiyanê gelek li pêş bû. Kêfxweşiya jiyana azad her tim li ser zimane wê bû. Bi rewşenbîriya xwe dihat naskirin. Û di gelek xalên ku jiyanê eleqedar dike de pêşketî bû. Zanabûna hevala Zîlan zanabûneke dîroki bû. Ji ber ku, di dîrokê de guhertinên bingehîn dabû avakirin û xizmeta mirovahiye kiribû. Yê ku jiyana azad nîşan û diyariyê me kiriye hevala Zîlan e.

Êrîşekî xeter li ser xeta Serokê Netewî yê Gelê Kurd Birêz Ebdulah OCALAN hebû. Ev êrîş jî, li ser xeta bîrdozî, siyasî, leşkertî û li ser azadiya jinê bû.

Yê ku vê êrîşa xedar bi bingehîn fêmkir û hîs kir, Xwedavend Zîlan bû. Hêzên emperyalîst ji sala 1995an û 1996 an heya van salên dawiyê jî di pêvajoya ku hatiye jiyankirin de her tim xwestin ku li ser Birêz OCALAN komployekî qirêj pêk bînin. Di demeke wiha de çalakiya Hevala Zîlan dengekî zêrîn veda. Ji ber ku dixwest vê komloya li ser azadiya jinê ku di şexsê Birêz OCALAN dihat pêşxistin vala derxe û ji jinên cîhanê re bibe semboleke berxwedan û têkoşînê. Hevala Zîlan wê rastiyê fêm kir û li hemberî wê komploya paşverû xwe berpirsiyar dît.

Qirêjiya hezar salan a koledariya ku hatibû avakirin, bi azadiya xwe vala derxist. Di çalakiya Xwedavend Zîlan de aliyê bi viyan, bedew û hêz gelek li pêş bû. Lewma jî çalakiya wê bi ser ket. Eger ne wisa bûya nikaribû çalakiya bidestxistina jiyanê pêş bixista. Bi çalakiya xwe leyîstokên xêrnexwazan vala derxsit û mirovan xiste dinava ronahiyê û wekî aveke zelal rastiyê derxist holê.

Memosteya mezin li hemberî paşverûtiyê serkeşiyeke mezin yê berxwedaniyê pêk anî û heya dawiyê têkoşiya, ji bona bîrdoziya xwe ya azadîxwaz têkoşîneke hemdemî afirand. Lewma jî perda şevên reş û tarî ku gelê Kurd diçewisîne, raman û hêviyên wan tune dike çirand û ronahiya Kurdan li hemû deveran belav kir. Gelê Kurd anî ser xeta Birêz OCALAN mafdariya di têkoşîna xwe de bi her awayî nîşanî hemû cîhanê da.

Bi taybet jî jina ku di tarîtiya dîrokê de hatiye windakirin gihişte nasnama xwe. Îro jî li her warî jin

di têkoşîna mirovahiyê de pêşengiyê dike. Di sedsala 21an de rola pêşengiya guhertina civakê jin e û pirsgirêkê mirovahiyê bi îdia û biryardariyeke xurt daye ser milên xwe.

Jinên cîhanê ketine nava lêpirsîn û lêgerînekê. Li gel vê yekê jî pergala kevneperest û dagirker dixwaze ku dengê jinê bide sekinandin. Dengê jinê dengê azadiyê ye.

Pergala desthilatdar a zilam heya roja me jî zordarî û dagirkeriyeke dijvar li ser jinê sepandiye. Bi rengê herî hovane şikence û destdirêjî li jinê hatine kirin. Mînaka hefteya borî êrîş û destdirêjiya hovane ku li ser Birêz Gulbahar GUNDUZ hat, mînaka herî şênber û rojaneyî ye. Mînakên bi vî awayî gelek in. Hema hema gelek jinên ku têkoşîna azadiyê didin rastî van sepandinan hatine. Di rewşeke wiha de kî/ê dikare qala demokrasiyê bike? Divê ev rastiya keçên Kurd werin dîtin. Belkî dijmin dikare tundî û şikenceyan li ser jinê bike, lê belê nikare evîna azadiyê ku di dilê jinê de aj daye biçilmisîne û jinê ji doza azadiyê qut bike. Zordariya li ser Gulbahar GUNDUZ, li ser cewhera hemû jinan hatiye kirin. Yên ku ji xwe re dibêjin “ez mirov im û wijdana min heye”, pêwîste li hemberî van nêzîkatiyan bê deng nemîne.

Dilsoziya Xwedawend Zîlan li ber çavan e. Ji ber ku rasteqîneya Xwedavend Zîlan rastaqîneya cewhera jinên cîhanê ye. Xwedavend Zîlan xwest ku nêzîkatiyên ku dixwestin jinê bikin kole, bi lehengiya xwe vala derxe. Ev pergala ku hatiye avakirin bi zordariya ku li ser jinê hatiye meşandin hatiye avakirin.

Divê em vê pergalê hilweşînin û di dewsa wê de pergalekê demokratîk-sosyalîst ava bikin. Bersiva ku em bibin Xwedavend Zîlan ev e!

**24-Hazîran-2004**

## KEÇE SEROK APO

**Zîlan dilawêr bû**
**Zîlan jir û zana bû**
**Zîlan riya aşitiyê de bû**
**Zîlan ji bo azadiya Gelan cane xwe feda kir.**

30ê Hazîranê 1996 de çalakiya mezîn a jiyanê Rêheval ZÎLAN pêkanî. Ji bona wê ji li hember Rêheval Zîlan em rêz digrin û hezkirina xwe ya bi dil em didin nîşandan.

Zîlan dinava tîrêjên rojê de li ser beybûn, sosin, nergîza ronahi vedide. Bi wê ronahiye li ser dilê hemû mirovan bû evîna gerdûn. Û êw gerdûn ji dinava dilê me bû gerdana ronahiye li ser singa me. Tariyên bênç hezaran, bi nîzîkatiyên xwe ye dilawêr û pak bandor li ser kevneperestiyê qelişandiye. **Rêheval**

**Zîlan xwe kiriyê keçeka Serop APO. Ji ber ku mora xwe li ser dîroka jinê daya nîşandan.** Ji bo armanca azadiyê xwe kir rêwiyê cangorî.

Em di pêvajoyekî krîtîk re derbas dibûn. Dijmin her milê de li ser me êrîş dikir. Bi taybet ji li ser rewşa Serok APO.... dijmin dixwast ku fizîkî Serokê Gelê Kurd Abdullah OCALAN ji holê rabike. Rêheval Zîlan rewşa Serok APO fêmkir bi awayî ket nava ramanên kûr û dur. Pêvajoyekî wîsa da çalakiya Rêheval Zîlan hat pêşxistin û rola xwe milê siyasî, askerî leyst. Ji bo hêzê kevneperest bû alternatîf yekem û plana dijmin wala derxist. Çalakiya bi vî rengî êdî xizmeta hemû mirovên azadixwaz, aşitixwaz dike. Hegêr Rêheval Zîlan ji dil û can wê doza de ne giradayibûya nikariya çalakiyekî bi vî awayi pek banya. Ji dil û can giredana xwe bi çalakiya da da nîşandan. Ji bo keçe Kurd, bû serleşkere hemû keça. Hegêr em li çalakiya Rêheval Zîlan binêrin emê xwe têde bibinin... ji ber ku keça Kurd bixwaze dikare herî tiştên balkeş pêkbine û dikarê serkeftine bixwe destê xwe.

Mirovên bindest, çiqas bêsînor ji insaniyetê dûr ketiyê û jin ji çawa cewherê xwe dûr xistinbin ji lê dîsa ji ticarî hêviya xwe gereke ji kutnake. Jin ji çiqasî ji aliyê vê sistemê hatiye qirêj kirin û ji cewherê xwe dûr xistiye... Dema hêviya mirovan hebe dikarê çalakiya girîng pêkbine, lê ne tenê çalakî, di hertişte dinava jiyanê de. Ji ber ku Rêheval Zîlan tama azadiyê hesiya bû. Çawa mirovêk di çolê de tîhn bibe û li avê bigere ji bo wê Rêheval Zîlan azadî ewqas pêwîst dit. Rêheval Zîlan jinê ku zana, xwendevan û jir bû. Bi

zanabûn, bi hêvî, bi raman, bi dilawêr çalakiya xwe pêkani.

Ji despêke heta niha ji bo mirovatiyê her tim jin bûyê sedema nexweşi, bindestî, taritî û lanetî hatiye ditin. Lê belê piştî derketina Serok APO gelekî tişt hati guhertin û veguhertin. Bi taybet ji li ser jinê, îro jin bûye, pêşgengê azadiyê, demokrasiyê, aşitiyê. Bêguman hinek buyerên bi dil êş hîna xwe dubare dike. Ango; li gorî bere jin hinek gav avetiyê lê hina nebese. Gelek mînakên keçe xwedevanda hene, hinek ji wan Zîlan, Sema, Bêrîtan, Berîvan, Zekiyê, Rewşan, Zelal xwe kirine hevkar û rêwi....û êw keç, li hember koleti nexweşî, bindestî, tarîtî û lanetiya sedsala derketine. Ala sor li hemberi bindestiye rakirine û bûn rêwiye azadiyê. Ji bona wê ji gereke em bi jiyana xwe de bibin persiva RêRêheval Zîlan.

Dilê Zîlan her tim ji bona serkeftinê, azadiyê, aşitiyê le dixist, gerekê dilê me jî ji bo sekeftin, azadiyê, aşitiyê lê bixe.

**26-Hazîran-2004**

## ZİLAN ÇAVKANİYA TÎRÊJÊN ROJÊ YE

Bi dilê xwe yê zêrîn, bi asîmanên şîn, bi hêviyên rojên geş, çalakiya jiyana nû aj da. Ev roja pîroz bi hezkirina evîna jiyaneke azad di 30ê meha Pûşpera 1996an de, bi dildariya jiyaneke mezin dilê xwe kire bombe. Em vê roja girîng ji ber çalakiya Zîlan pîroz dikin. Li vê xwezaya ku mîna bêhna rihanê dilan şa dike, bi rengê sosinan ku dilan xweş dike em tev de bejna xwe ditewînin li pêşiya lehenga Zîlan.

Ew, bi pênûsa dîroka zêrîn, bi rengên keskesora li Mezobotamiya, li bexçê zêrîn hat nivîsandin. Di dergûşa azadiya mirovatiyê de bejin da. Çavkaniya peşarojê renk veda di dergûşa Dêrsimê de. Di vê roja girîng de, li zeryayên rengê xwe şîn pêl bi pêl av zelal bûn.

Nale nala keçên di nava çar dîwaran de, bi êş hatibû fetisandin. Lê belê îro her der bi dengê awaza bilûran xweş dibin û navê Zîlan, Sema û Gulbahar tê bihîstin. Îro jinên di çalakiyê de ne bi awazên wê bilûrê, bi govenda tîrêjên rojê re ronak dibin. Û felsefa Serok APO ji bona çareserkirina pirsgirêkên gelan û civakan wekî ronahiyekî dibînin. Jinên cîhanê bangawaziya li xwedî derketina Gulbahar dikin. Ji ber ku êrîşa li ser Gulbahar li ser jinên cîhanên ye.

Di şahrîstaniya demokratîk de azadiyê ji nû de di dilê xwe de hîs dikin û dixwazin bi ser kevin. Di wê civaka dejenerebûyî de jiyaneke ku her roj bi hezaran caran mirinê dide jiyankirin îro êdî nema dipejirînin.

Lêgerîna hemû jinan ev e: li azadiyê, wekheviyê, aştiyê, demokrasiyê û li cewherê mirovatiyê digerin.

Taybetmendiya herî girîn a li dijî êrîşên hovane, Hevala Zîlan wekî gula berfînê di singa kelha zîlmê de xwe kir bombê. Ji ber ku meha Gulana 1996 an li Şamê ji bona Birêz Ocalan bi arebeyê sûîqastek hatibû li dar xistin û pêwîst dikir ku taktîk nû bibe. Lewra jî ew hevalan Zîlan bi çalakiya xwe li dijî wê êrîşêderket û vê yekê nepejirand. Bi wê zordarî û polîtakayên tunekirin û înkarê gelê Kurd bi mirinê re rû bi rû mabû. Lewma jî êdî pêwîst bû ku çalakiyeke mîna a Zîlan pêk were.

Dil dikel ji bona evîna jina Kurd Zîlan. Ji hêvî û lêgerîna çendî salan nêrgiz bişkivin, ji hêz û girêdana dûwarojê û bi dengê bilûran Zîlan jiyana azad geş kir. Asîmanên te yên şîn û zelal êdî bûn zerya. Ji ber ku tu di dilê Kurdan de hêvî û hesreta tîrêjên rojê bûyî.

Li Qada Abdî Îpekçî ya Enqerê 10 hezar jin bi rengê keskesorê tevlî mitîngê bûn. Bi Kurdî tililiyên dengê azadiyê distirînin û şewq vedidin li Qada Abdî Îpekçî. Bi hezaran jin dilê xwe kirine kulîlka aştiyê. Ev mitînga jinê ji bona îdia, rûmet û hêvî li hemberî tundiya li ser jinê şerekî demokrasiyê bû. Ji bona dengê çekan were sekinandin û dengê xezalan were bihîstin aştî dixwestin. Lewma jî dê di şopa xeta Zîlan de cangoriya hebûnê pêş bixin û şerêkî bi rûmet pêk bînin. Ji ber ku di şûna şer de dê rewşengerî pêş bixin û edaletê bidin avakirin. Bi taybet jî serkeftina jinê dê bibe serkeftina civakê.

Di xeta Zîlan, Sema, Zekiye û Berîtanan de, emê dilê xwe bikin yek û bi dildariyên gulberojkan bi çalakiyên xwe yên demokratîk silav li rojê bikin da ku nûjenî serwer bibe.

**29-Hazîran-2004**

## BİLA ÊDÎ HEVDİTİN WERE ÇEKİRİN

Ev çar hefteya ku hevdîtina Serokê Gelê Kurd Abdulah Ocalan nehatiye çekirin, ji ber dewleta Tirkiye naxwaze Abdulah Ocalan perspetîf bide hêzên gerîlla û bi sedema dûyemin ji çima agirbest ji holê rakirine û şer îlankirin e. Agirbesta hatî rakirin biryara hêzên Parastina Gele. Ji bona wê Tirkiye vêna dike bahane. Lê em bawerin ku Gelê Kurd herkes dîzane ku Kongre Gel rêxistinekî sivil û aşîtîxwaz e.

Ev jî nîşan dide ku dewlet hîn dev jî polîtikaya xwe ya red û înkarê bernadeye. Lê xuyaye ku naxwazê vî barî hilgire li ser milê xwe. Heger Tirkiye wiha nêzîk bibe, bî vî zihniyetê nikare pêşkeftinekê çêbike û yê zerar bide xwe. Hevdîtina Serokê Gelê Kurd Abdulah Ocalan li ser Tirkiye yê ferz dike. Tirkiye dibêje hertiş gereke li gorî me bimeşe û bibe.

Serokê Gele Kurd Abdullah Ocalan ji bo guhertin û vegurhartinên bilana ku dixwaza peşbikeve lê dewlet vêna mecal nade. Herdem  bangavaziya wî dostanî kiribû û herdem aşîtî esas girtiye, lê ji ber ku Tirkiye li gorî xwe meşiya û gav neavetiye ji bona wê ji Kongre Gel biryar daye ku şer îlan bike. Ev dihele ku dinava Tirkiye de bibe sedemên nakokiyan civakî û aborî. Ez bawerim ku tikes naxwaze şer, xwîn û rondikên dayikan birijin. Herçiqasî veguhertinên demokratîk me danî pêş wan, lê gorî xwe nêzîkbûn û bi vî sedemî şer despêkir. Heger Tirkiye bixwaze veguhertinên erênî çêbike hingê Konkra Gel dikare biryarekî şer bi dawî bine. Lê Tirkiye dîsa wekî berê nêzîk pirsgiraka Gelê Kurd û  Serokê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bibe, tabikî şer nasekine.

Gereke despêkê, dawîkirina li tecrîd û îzolasyona rewşa Serokê Gelê Kurd Abdulah Ocalan anîn û sererastkirina mercên jiyana wî were esas girtin. Divê Tirkiye polîtikaya xwe de guhertinên cidî di pirsgireka kurdan de û pirsgireka mercên Serokê Gelê Kurd Abdulah Ocalan de gavên bi cidî werin avêtin.

Bi milyona mirov evîndarê Abdulah Ocalan hene û heta mirinê ji amadene. Bila Tirkiye baş bizanî be ku hemû Gelê Kurd bi Serokê xwe ve girêdayine. Em naxwazin şer çêbibe û kes jî naxwaze rondikên diyakên Tirk û Kurd werin rijandin. Lê heger di polîtikayên li ser Serok APO hîna weke bere be tê wê watayê ku meydane ji şere dixwine. Şer ji bo azadî û mafê mirovan e û ji bo azadiya Serok APO ye.

Gereke jin û ciwan nirxên xwe yên neteweyî xwedî derkevin û divê pêvajoya çalakiyên demokratîk bide despêkirin. Di vê demê de li ser rewşa Serok, polîtikayên qirêj êdî wisa nameşe. Bi taybet ji gereke hevdîtina Serok APO were çekirin.

Bêguman em çareseriya demokratîk esas digirin û divê hemû kes tevlî vê pêvayê bibê. Divê gel xwedî Serok APO derbikeve û divê neyê ji bîrkirin ku Serok APO ronahiya çavê hemû Gelê Kurd e.

**12-Tîrmeh-2004**